K.T.
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTÛYA ZİMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

# DESTANA KELA DIMDIM Û XANÊ LEPZÊRÎN (LÊKOLÎNEKE EDEBÎ Û DÎROKÎ)

TEZA LÎSANSA BILIND

**Şêwirmend**
Yrd. Doç. Dr. Mehmet Metin BARLIK

Yaşar KAPLAN

WAN - 2015

K.T.
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTÛYA ZİMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

# DESTANA KELA DIMDIM Û XANÊ LEPZÊRÎN (LÊKOLÎNEKE EDEBÎ Û DÎROKÎ)

TEZA LÎSANSA BILIND

**Amadekar**
Yaşar KAPLAN

**Şêwirmend**
Yrd. Doç. Dr. Mehmet Metin BARLIK

WAN - 2015

JIBO RÊVEBERIYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ,

Ev xebat ji aliye jûriya me ve, di Şaxa Makezanista **........................................ ..............................** wekî **LÎSANSA BILIND** hatiye qebûlkirin.

İmza

Serok : ...........................................................................................

Endam (Şêwirmend) : ...................................................................

Endam : .........................................................................................

Endam : .........................................................................................

Endam : .........................................................................................

PESENDKİRİN: Ez pesend dikim ku şanavên li jor yên endamên perwerdekarên navborî ne.

.... / .... / 2015 ........................................................

Mudîrê Enstîtûyê

# NAVEROK

**NAVEROK** ........ **I**

**PÊŞGOTIN** ........ **III**

**KURTKIRIN** ........ **V**

**1.DESTPÊK** ........ **1**

1.1.DESTAN ........ 4

1.1.1. Di Edebiyata Kurdî Da Destana Kela Dimdim ........ 5

1.1.2. Xebatên Li Ser Destana Kela Dimdim ........ 6

1.1.3. Jêderên Me ........ 8

1.1.4. Ji Aliyê Ruxsarî ve Destana Kela Dimdim ........ 11

**2. NAVEROKA DESTANA DIMDIM** ........ **13**

2.1. DESTANA DIMDIM YA DÎROKÎ ........ 13

2.1.1. Cih û Dem ........ 13

2.1.2. Emîrxan û Biradostî ........ 13

2.1.3. Bûyer ........ 15

2.1.3.1. Kela Dimdim ........ 17

2.1.3.2. Amadekarıyên Şerî ........ 18

2.1.3.3. Destpêka Şerî ........ 19

2. 2. DESTANA DIMDIM YA ÇÎROKÎ ........ 21

2. 2. 1. Cih û Dem ........ 22

2. 2. 2. Kes û Leheng ........ 22

2. 2. 3. Kurtiya Destanê ........ 24

**3. TEMAYÊN DESTANA KELA DIMDIM** ........ **34**

3. 1. KURDÎNÎ Û WELATPARÊZÎ ........ 34

3. 2. DILSOZÎ Û XIYANET ........ 37

3. 3. DÎN Û BAWERÎ ........ 40

3. 4. JIN ........ 42

3. 5. RAY Û TEDBÎR ........ 46

3. 6. XÎRET Û HEMASET ........ 48

**4. METNÊ DESTANÊ** ........ **51**

4. 1. BEŞA YEKEM ........ 51

4. 2. BEŞA DUYEM ........ 56

4. 3. BEŞA SÊYEM ........ 63

4. 4. BEŞA ÇAREM ........ 80
4. 5. BEŞA PÊNCEM ........ 93
4. 6. BEŞA ŞEŞEM ........ 105
4. 7. BEŞA HEFTEM ........ 123
**5. ENCAM ........ 170**
**JÊDER ........ 172**
**ÖZET ........ 173**
**PÛXTE ........ 174**
**ABSTRACT ........ 175**

## PÊŞGOTIN

Di van dused salên dawiyê da Edebiyata Kurdî di rewşeke awarte û metirsîdar da derbas bûye. Jiber rewşa Kurdan ya siyasî û polîtîk Edebiyata Kurdî wekî edebiyatên gelên din di rewşeke normal da derbas nebûye. Çunkî edebiyatên gelên din bi piştgiriya dewletên xwe yên netewî ve pêşveçûn û berfirehbûna xwe ya asayî bi rê ve birine. Lêbelê Edebiyata Kurdî nebûye xudanê vê imkanê. Vê rewşê herçend karîgeriyên neyînî li ser Ziman û Edebiyata Kurdî kiribe jî Edebiyata Kurdî bi temamî ranewestaye û pêşveçûn bi dest êxistine.

Wekî tête zanîn Edebiyata Kurdî li ser çar hêmanan hatiye avakirin: ziman, edebiyata klasîk, edebiyata nûjen û edebiyata devkî. Ji van hêmanan ya ji hemiyan dewlemendtir edebiyata devkî ye. Edebiyata devkî wekî tête zanîn malê gel e û di nava gel da belav e. Piştî serdema modern parastina edebiyata devkî ya di nava gel da serdest bi metirsiya nemanê ve rûbirû maye. Taybetî gelên bê desthelatdar û bûne armancên bişaftinê zêdetir bi vê metirsiyê ve rûbirû mane. Kurd jî yek ji van netewan in. Heta niha di warê edebiyata devkî da ji aliyê lêkolîner û pisporên biyanî û xuyanî ve herçend xebat hatibin kirin jî jiber rewşa Kurdan û Kurdî gelek kêmasiyên van xebatan çêbûne. Lewra divêt bi çavekî zanistî edebiyata devkî bête tomarkirin û ev materyalên hatî tomarkirin bi çavekî zanistî bêne tûjandin, senifandin û nirxandin. Me jî xwest di vê xebata xwe da yek ji girîngtirîn destana netewî ya Edebiyata Kurdî, Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn ya di nava gel da tomar bikin û binirxînin. Me, ev destan li devera Hekariyan ji devê deh dengbêj û beytbêjan wergirt û nivîsî. Jiber ku ev destane di aliyekî din li ser bûyereke dîrokî hatiye avakirin me xwest, li dû deqên dîrokî gîvilê (sîlûetê) destanê yê dîrokî jî derêxin meydanê. Jibo vê çendê jî me îstîfade ji jêderên destê yekê wergirt.

Di amadekirina vê xebatê da şêwirmendê me birêz Yrd. Doç. Dr. M. Metin BARLIK gelek harîkariya me kir. Em gelek minetdarên wî ne, mal ava. Herwesa serokê beşa Kurdî ya Zanîngeha Yûzîncî Yilê birêz Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ jî di amadekirina vê xebatê da harîkarî da me. Di wergerandina hinek deqên Farisî da

Mamosta Nizar Eyûb GULÎ teqsîrî nekir. Sipasiya herdu mamostayên birêz dikin. Hevalên wekî Ayhan GEVERÎ, Îlyas SİVAĞCI û Reşîd YILDIZ jî di amadekirina vê xebatê da bi xwendin û nirxandinên xwe yên hêja ve harîkarî dane me. Gelek sipasiya wan jî dikim. Hêvîdar im vê xebatê karîbe xizmeta Edebiyata Kurdî bike.

Yaşar KAPLAN

Hakkâri 2015

## KURTKIRIN

| | |
|---|---|
| **B.n.b.** | **:** Berhema Nav Borî |
| **Bnr.** | **:** Binêre |
| **Brh.** | **:** Berhevkar |
| **DİB.** | **:** Diyanet İşleri Başkanliği |
| **dq.** | **:** Deqîqe |
| **Ed.** | **:** Edîtor |
| **Hz.** | **:** Hazretî |
| **m.** | **:** Mirin |
| **r.** | **:** Rûpel |
| **S.x.l.** | **:** Silavên Xudê Lê Bin |
| **Wer.** | **:** Wergêr |
| **Weş.** | **:** Weşanxane |

# 1.DESTPÊK

Destan yek ji kevintirîn cûreya edebiyata devkî ye. Di serdemên gelek kevin da derkeftiye meydanê. Mijarên destanan ji bûyerên dîrokî û civakî yên li ser civakan gelek karîger pêk tên. Destan, gelêrî ne, danêrên wê yên pêşiyê nahêne zanîn. Lewra destan wekî malê gelekî têne hesibandin. Edebiyata Kurdî ya Gelêrî ji aliyê destanan ve dewlemend e. Heta niha gelek xebat ji aliyê lêkolînerên biyanî û xuyanî li ser Edebiyata Gelêrî ya Kurdî hatibin kirin jî jiber rewşa Kurdan û Kurdî ya siyasî, ev xebat ne rêkûpêk in. Lewra ev lêkolîn di asta pêdivî da nînin. Derbarê cûr û numûneyên Edebiyata Gelêrî ya Kurdî da endîşeya wendabûn û jibîrkirinê her daîm li kar bû. Birastî dema mirov lê dinêre ev endişe ji sedî sed ne rast e. Lêbelê kêmbûna lêkolînên zanistî li ser folklora Kurdî wekî metirsiyekê hêj berdewam e.[1] Piştî pîçek başbûna rewşa Kurdan û Kurdî ya sîyasî, bizavên lêkolînê derheqê Edebiyata Kurdî ya Gelêrî da zêdebûn. Ev xebata me jî dixwaze di vî babetî da valahiyeke zanistî tijî bike.

Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn yek ji girîngtirîn destanên Kurdî ye. Ev destan, destaneke netewî ya Kurdî ye û qala mêrxasî û hemaseta Kurdan dike. Her ji piştî bûyera Kela Dimdim hatiye honandin û di nava civaka Kurdî da belav bûye. Çunkî ev destane ji hemî aliyên Kurdnişîn, hatiye vegotin û guhdarîkirin. Belkî kêm destanan hindî vê destanê îmkana belavbûnê dîtibin. Gelek sebebên hezkirin û belavbûna vê destanê di nava gel da hene. Lêbelê wesa diyar e kû sebeba vê çendê ya ji hemiyan mezintir ew e ku ev destan behsê mêrxasî û qehremaniya Kurdan dike. Ev hemaseta netewî jibo hezkirin û belavbûnê rê vekiriye.

Armanca vê lêkolînê ew e ku her wekî me li jorî jî gotî dewlemendkirina lêkolînên li ser Edebiyata Kurdî ya Gelêrî ye. Lewra me xwest em vê destana girîng

---

[1] Pertev, Ramazan, "Danasîn û Rewşa Giştî ya Xebatên li ser Folklor û Edebiyata Kurdî ya Gelêrî", *Edebiyata Kurdî ya Gelerî, Dîrok- Teori- Rêbaz- Lîteratur- Berawirdî- 1,* Weş. Avesta, Stenbol 2015, r. 14, 15.

serejinû bi çavekî zanistî vekolîn. Tomarkirin û tûjandina metaryalên edebiyata devkî karekî gelek giran e. Heke ev xebat li zimanekî wekî Kurdî, rastî êrîşên tûnekirinê hatî be, ev zehmetî hêj zêdetir dibin. Lewra pêdivî ye ku xebatên tomarkirin û tûjandina berhemên edebî yên gelerî li dû sîstemekê û rêbazekê bêne kirin.

Wekî rêbaz me xebata xwe hem ji aliyê mijarê ve hem jî ji aliyê mekanî ve tuxîbdar kir. Xebata me dê li ser waryantên Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn yên li devera Hekariyan da be. Lewra dengbêj û beytbêjên ku ev destane digotin ji vê deverê hatine destnîşankirin. Me, ev destan ji deh dengbêj û beytbêjên li devera Hekariyan tomar kir. Me pêşiyê dengê wan qeyd kir û paşî jî ev qeyde deşifre kir. Jiber ku ev dengbêj û beytbêje hemî yên deverekê bûn di navbera waryantên vê destanê da cudahiyên pir hindik hebûn. Lêbelê em dikarin bibêjin ku van waryantên cûda hemiyan hevdû temam dikirin. Hinek hûrgiliyên li cem waryantekê heyî dibû ku li cem ya din nebe. Cudahiya van waryantan zêdebarî di kurtbûn û dirêjbûna destanê da derdikefte meydanê. Çunkî hinek bûyer û hûrgiliyên waryantekê digot dibû ku di waryanta din da nebû. Lêbelê dema me ev waryantên cûda hemî li ser hev kom dikirin, vê çendê honak û rista bûyeran ya destanê birêkûpêktir dikir. Bi saya wekî yek destan komkirina van waryantan gîvilê (sîlûetê) destanê xweştir xuya dikir. Yanî heke em bi awayekî din bibêjin, ev waryant hinek kêm hinek jî têr û tijîtir bûn. Dema me waryant hemî berawirkirin me dît ku her valahiyeke di waryantekê da bi saya waryantên din tijî dibin. Û bi vî awayî serûberê destanê bi rêkûpêktir derdikefte meydanê. Lewra me her waryant serbixwe lêkolîn nekir, berevajî vê, me ev waryant hemî wekî waryantekê diristkir û paşî lêkolîna xwe li ser kir. Jibo vê çendê du palderên girîng hebûn: destan di heman herêmê hatiye komkirin û hema hema dengbêj û beytbêjan heman bendên wekî hev digotin.

Ev xebata me ji pênc beşan pêk têt. Di beşa yekem da wekî cûreyekî edebî li ser Destanê hate rawestan. Piştî danasîna destanê, qala destanên di edebiyata dinyayê û di Edebiyata Kurdî da û cûrên destanê û merhalêyên avabûna destanan hatine vegotin. Cihê Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn di Xebatên di Edebiyata Kurdî da hate destnîşankirin. Di vî babetî da li ser xebatên li ser vê destanê yên di Edebiyata Klasîk ya Kurdî da hatine nivîsîn, hate rawestan. Xebatên lêkolîner û nivîskarên biyanî û xuyanî yên heta niha li ser vê destanê hatine kirin me di vê beşê da destnîşankirin. Herwesa jêderên ku me ev waryantên mijara vê xebatê dane nasîn.

Di beşa dûyem da li ser naveroka Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn hate rawestan. Jiber kû ev destan li ser bûyereke dîrokî hatiye avakirin me jêderên dîrokî yên qala vê bûyerê dikin nirxandin. Hindî ji me hatî me xwest em perdeya li ser bûyera dîrokî bidin aliyekî û bûyerê raçavî xwendevanan bikin. Jibo vê çendê me jêderên destê yekê bi kar anîn. Lêbelê divêt em ji bîr nekin ku herçend ev destane li ser bûyereke dîrokî ava bibe jî destan û efsaneyek li ser vê bûyerê hatiye avakirin. Lewra me naveroka destanê li dû jêderên devkî jî nirxand. Nirxandina dualî, hem dîrokî hem jî çîrokî, wekhevî û cudahiî di halê xwe da derxistin pêş me. Di van nirxandinan da cih, dem, leheng û honaka destanê derkefte meydanê.

Di beşa sêyem da li ser temayên di destanê da serdest hatin lêkolînkirin. Di nirxandinên me da temayên wekî Kurdînî û welatparêzî, dilsozî û xiyanet, dîn û bawerî, jin, tedbîr û ray, xîret û hemaset derkeftin pêş. Di beşa çarem da metnê destana me li devera Hekariyan li ser deve deh dengbêj û beytbêjên cûda tomarkirî hate nivîsîn. Wekî beşa dawî encamên vê xebatê yên ku hatine bidestêxistin, hatine rêzkirin.

## 1.1.DESTAN

Destan, cûreyekî edebî yê kevin e. Peyva “Dastan an Destan” peyveke Îranî ye. Di Kurdî da hem peyva destan hem jî peyva “Beyt, Qiset” tête bikaranîn. Li hemberî vê peyvê li Rojava “epos” tê bikaranîn. Epos bi ‘eslê xwe Grekî ye û tê me’neya çîrokên menzûm. Epos, ew serboriyên wesifdar û derasayî yên xweda, xwedawend, wekxweda û lehengan e ku bûyerên mezin ên qewimîne û di bîra civakê da bicih bûne[2]. Di destanan da bûyerên dîrokî û civakî yên karîgeriyeke mezin li ser civakê hiştî bi awayekî menzûm têne vegotin. Di jiyana netewan da gelek serhatiyên ku rengvedana wan bi borîna demê ra nehên jibirkirin hene. Ev serhatî dibe ku şerek an qehremaniya şexsekî an jî afeteke li kûrahiya civakê şopa xwe hiştî. Ev serhatî bi rêka destanê ve têne rengînkirin û dewlemendkirin. Jibo ku bi sanahîtir di bîra civakê da bête parastin bi awayê menzûm û rewanbêjî têne vegotin.

Wekî tête zanîn Destan di sê qonaxan derbaz dibin. 1. Derketina Destanê: di vê qonaxê da hinek bûyerên dîrokî û civakî diqewimin û ev bûyer di xeyal û şuûra netewê ya hevpar da teşe digire. Kesên di van bûyeran da cih girtî di xeyala civakê da cihekî girîng digirin. 2. Belavbûn: bi dewlemendkirina bûyer û lehengan ve destan belav dibe û nifş bo nifşî tête veguhastin. 3. Tomarkirin: di vê qonaxê da destan ji aliyê hunermendekî anjî pisporekî tête nivîsîn û tomarkirin.[3]

Destan di nava xwe da wekî destanên xweristî û destanên çêkirî dabeş dibin. Destanên xweristî ji bûyerên kevin yên karîgeriyek mezin li ser bîra civakê hiştî pêk tên. Ev cûre gelêrî ne û danerê wan ne diyar e. Lewra wekî malê gel an netewekê tête hisabkirin. *Gilgamişa* Sûmeriyan, *Kalavelaya* Fîniyan an jî *Memê Alanê* Kurdan numûneyên vê cûrê ne. Destanên çêkirî jî jibo destanên ji aliyê helbestvanekî ve hatine çêkirin tête gotin. *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî û *Bihuşta Wenda* ya Milton em dikarin bo vî cûreyî wekî mînak bidin.

---

[2] Pertev, Ramazan, *b.n.b.*, r. 221, 222.
[3] Yetiş, Kazım, “Destan”, *Tûrkiye Diyanet Vakfi İslam Ansiklopedisi,* İstanbul 1994, r. 9/202.

Destan bi sê awayan hatine honandin. Hinek menzûm (helbestkî), hinek pexşan hinek jî ji menzûm û pexşana tevlîhev hatine honandin. Di edebiyata Kurdî da destan li dû naveroka xwe dibin sê beş: Destanên mêrxasiyê wekî *Destana Kela Dimdim, Şerê Kolana Qumriyê;* destanên evînê wekî *Memê Alan, Ferx û Sitî, Sînemxan;* û destanên ayînî wekî *Hespê Reş, Kekemîr, Avdel Ûmeran, Şêxmend, Zembîlfiroş*.

1.1.1. Di Edebiyata Kurdî Da Destana Kela Dimdim

Di edebiyata Kurdî da destana mêrxasî, qehremanî û welatparêziyê ya ji hemiyan mezintir û belavtir Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn e. Vê destanê jiber naveroka xwe ya têr û tijî û uslûba xwe ya rewanbêj cihekî taybet girtiye. Lewra di nava Kurdan da gelek belav bûye û ji aliyê civaka Kurdî ve gelek hatiye hezkirin. Ev destan hem ji aliyê beytbêjan ve hatiye gotin hem jî ji aliyê hinek edîbên klasik ve hatiye nivîsîn. Mela Mehmûdê Bazîdî di vî babetî da wiha dibêje: " *ev qeziya şerê Kela Dimdim qewî meşhûr û me'rûf e di Kurdistanê da. ...... Ekserê Kurdan wê destanê di meclîsan da dixwînin û jiboyê şehîdêd Kela Dimdimê heyf dixwen û digirîn û duayê dikin*".[4]

Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn ji aliyê çend edîbên Edebiyata Kurdî ya Klasîk ve hatiye nivîsîn. Hindî em dizanîn cara pêşiyê yê ev destane nivîsî Feqiyê Teyran e (m. 1632). Ev destane ji şêst û heft malikan pêk têt. Ev destan û berhemên Feqiyê Teyran ji aliyê M. Xalid Sadînî ve hatine tomarkirin û çapkirin.[5] Ew di berhema xwe da dibêje ku: " *bi gotina Ebdurreqîb Yusuf ev destan ji berhemê Feqiyê Teyran e û wî (E. Y.) ev destane berhev kiriye û çap kiriye*".[6] Wesa diyar e ku ev destana Feqiyê Teyran kêm e û hêj bi temamî negehiştiye destê me. Mela Mehmûdê Bazîdî jî di berhema xwe ya bi navê *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê*

[4] Mela Mehmûdê Bazîdî, *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî,* (Brh: Ziya Avci), Weş. Lîs, Stenbol 2010, r. 117.

[5] M. Xalid Sadînî, *Feqiyê Teyran, Jiyan, Berhem û Helbestên Wî,* Weş. Nûbihar, Stenbol 2010, r. 383-397.

[6] M. Xalid Sadînî, *b.n.b.*, r. 58.

*Kurmancî* da di bin navê Hîkayeta Sîûçaran da kurteya Destana Kela Dimdim nivîsiye. Ew di vê nivîsa xwe da dibêje ku Melayê Bateyî li ser Destana Kela Dimdim qiseyê mewzûn destanek înşa kiriye.[7] Lêbelê îhtîmal e ku ev destan her ya Feqiyê Teyran be.

Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn di Edebiyata Nûjen ya Kurdî da jî wekî mijar hatiye bikaranîn. Mustefa Salih Kerîm di sala 1960 da bi navê *Şehîdanî Qelay Dimdim* romanek nivîsiye ü li Silêmaniye çap kiriye. Herwesa Ereb Şemo di sala 1966an da bi navê *Dimdim* romanek nivîsiye. Jan Dost jî bi navê *Kela Dimdimê* pirtûkeke helbestan nivîsiye. Li sala 1991ê li Bonnê di nava weşanên Rewşen derkeftiye.[8]

1.1.2. Xebatên Li Ser Destana Kela Dimdim

Wekî tête zanîn Destana Dimdim li ser bûyereke dîrokî hatiye çêkirin. Lewra ev bûyera dîrokî di berhemên dîrokî da hatiye vegotin. Yekemîn kes û tekakesê behsê vê bûyerê kirî Îskender Beg Tûrkmanê (1561- 1635) vakanivîsê Şah Ebbasê Sefewî ye (1571- 1629). Ew bi xwe di şerê Dimdimî da amade bûye. Serhatiya şerî di berhema xwe ya bi navê *"Alem Arayî Ebbasî"* da vegotiye. Ji hîngê heta îro gelek kesên biyanî û xuyanî li ser vê bûyer û destanê rawestane. Lewra lîteratûreke berfireh li ser Destana Dimdim çêbûye. Em dikarîn kesên xebat li ser vê destanê kirî wiha rêz bikin.[9]

[7] Mela Mehmûdê Bazîdî, *b.n.b.*, r. 114- 117.
[8] Çalıştıran, Rûken, "Lîteratûrek Li Ser Destanên Kurdî", *Edebiyata Kurdî Ya Gelêrî, Dîrok- Teorî- Rêbaz- Lîteratur- Berawirdî- 1,* (Ed: Ramazan Pertev), Weş. Avesta, Stenbol 2015, r. 241.
[9] Jibo berhevkirina vê lîstê îstîfade ji van jêderan hatiye kirin. Bnr: Zîlan, Reşo, "Lêkolînek Li Ser Destana Kela Dimdimê", *Edebiyata Kurdî ya Gelerî, Dîrok- Teori- Rêbaz- Lîteratur- Berawirdî- 1,* (Ed. Ramazan Pertev), Weş. Avesta, Stenbol 201,5 r. 193- 195; Çalıştıran, Rûken, "Lîteraturek Li Ser Destanên Kurdî", *Edebiyata Kurdî ya Gelerî, Dîrok- Teori- Rêbaz- Lîteratur- Berawirdî- 1,* (Ed. Ramazan Pertev), Weş. Avesta, Stenbol 2015, r. 223- 241.

Feqiyê Teyran: *Kela Dimdim*

Mela Mehmûdê Bazîdî: *Cami'îyê Rîsaleyan û Hîkayetan*

Alexander Jaba: *Recueil de Notîces et Recîts Kourdes*, St. Petersburg, 1860.

Eugen Prym, Albert Socin: *Kurdîsche Sammlungen Erzçlungen und Lieder in den Dialekten des Tur Abdin und von Bohtan,* St. Petersburg, 1887- 1890.

Oskar Mann: *Die Mundart Mukrî- Kurden*, Berlin, 1906- 1909.

M. A. Zekî: *Amîr Xanî Bradost û Qelay Dimdim*, Kovara Gelawêj, 1940.

Heciyê Cindî: *Folklora Kurdî*, Erîvan, 1957.

Mihemed Teefîq Werdî: *Qalay Dimdim*, Bexda, 1961.

Qanatê Kurdo: *Hîkayet û Stranên Qehremaniyê yên Kurdî*, Moskova, 1962.

Casimê Celîl: *Destana Dimdim (Klamê Çiya)*, Erîvan, 1970.

Mohamed Taqî Danespazuh, *Seh Senadê Tarîkî wa Jografia'î-ê Dewran-ê Sefewî,* kovara Wahîd, 1971.

M. Pedram, *Ber Ferazê Dimdim*, Kovara Huner û merdimê, 1975.

Prof. Dr. Ordîxanê Celîl: *Êposa Cimeta Kurda ya Mêrxasiyê- Xanê Çengzêrîn*, teza doktorayê, Moskova 1967; digel Celîlê Celîl di nav Zargotina Kurdî jî belav kirine. Moskova, 1978.

H. Huseynî, *Beytî Dimdim*, 1981.

Cemîl Ehmed Zêro: *Şoreşa Dimdim*, Bexda, 1983.

Ebdulla Merdux: *Rasperînî Dimdim û Qelaçoy Kurdanî Mukrî*, Kovara Hêvî, 1983.

M. M. Hamabor, *Xanê Lepzêrîn û Kelayê Dimdim*, Kovara Roşînbîrî, 1984.

Riza Çolpan, *Destana Dîroka Kurd û Kurdistan*, Sidney 1995.

Reşo Zîlan, *Destanên Kurdî*, Stockholmê, 1996.

Muhsîn Kizilkaya, *Kayıp Dîwan,* Stenbol, 2000.

Sadiq Bahadîn Amêdî, *Ji Folklora Kurdî*, Hewlêr, 2002.

Mihemmed Ebdullah, *Beytên Kurdî*, Dihok, 2002.

Serwer Abdurehman Omer, *Karesata Qelay Dimdim (1608- 1609),* Silêmanî, 2008.

Yasîn Hesen Goran: *Pênc Dastanî Kurdewarî*, Hewlêr, 2011.

Giulia Ferdeghini: *Kelaê Dimdim Descrizione e Analisi di un Poema Epico Della Letteratura Orale Curda a Partire Dalla Documentazione Raccolta Nel Bahdinan e,* teza doktorayê, Roma, 2012.

Amir Hassanpour, *Beyt û Dimdim*, Encyclopaedia Îranica.

1.1.3. Jêderên Me

Destana mijara vê xebatê yanî Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn, li devera Hekariyan ji devê deh dengbêj û beytbêjên cûda hatiye tomarkirin. Ev destan bi rêka dengirê ve hatiye qeydkirin û paşî jî hatiye deşîfrekirin. Ji van deh waryantên cûda da pênc waryant destanê bi temamî vedibêjin. Di pênc waryantan din da jî hinek ta û çiqên destanê hatine vegotin. Kesên me destan jê wergirtî di herêmê da wekî

beytbêj û dengbêj têne nasîn. Em dikarin bi vî rengî ewên destan bi temamî gotî bidin nasîn.

- **Ebdulqadirê Gwîzereşî (Ebdülkadir Kızılkaya):** Xelkê gundê Gwîzereşê (Cevizli) ye ya ser bi navçeya Çelê (Çukurca) ya girêdayî Culemêrgê (Hakkâri). Ji 70 salîyê boriye. Ji bilî Kurdî, Tirkî jî dizane. Xudan bîr û hafizeyeke gelek bi hêz e. Niha li Culemêrdê niştecih e. Wî, ev destan di kaseteke 96 dq’yî da vegotiye.

- **Sadiqê Şetinisî (Sadık Yılmaz):** Xelkê gundê Şetinîsa Jorî (Yukarı Kayacık) a girêdayî Culemêrgê ye. Di vegotina destan û serhatiyan da destekî bilind hebû. Di sala 1994ê di 54 saliya xwe da çûye ber dilovaniya Xudê. Wî, ev destane di kaseteke 92 dq’yî da vegotiye.

- **Ebdulkerîm Zawîteyî (Abdülkerim Akar):** Xelkê gundê Zawîte (Kayalık) ye ya ser bi navçeya Çelê (Çukurca) ya girêdayî Culemêrgê. 53 salî ye. Niha di Mudîrîyeta Çandê ya Culemêrgê da wekî memûr dixebite. Lîse (amadeyî) qedandîye. Wî, ev destan di kaseteke 84 dq’yî da vegotiye.

- **Ehmedê Bayî (Ahmet Coşkun):** Xelkê Gundê Bayê (Bay) ya ser bi Culemêrgê ve ye. Di sala 1997ê da di 65 saliya xwe da çûye ber dilovaniya Xudê. Wî, ev destan di kaseteke 45’yî da vegotiye.

- **Ehmedê Asmînê ( Ahmet Şen):** Xelkê gundê Hirkaşê (Kınıklı) ya ser bi navçeya Çelê ya girêdayî Culemêrgê ye. Ji 90 saliyê boriye. Vê gavê li Çelê niştecih e. Wî, ev destan di kaseteke 30 dq’yî da vegotiye.

Dengbêj û beytbêjên ku hinek çiq û tayên vê destanê jibo me gotî jî eve ne.

**- H. Ebdilayê Keleş ( Abdullah Demir):** Xelkê gundê Marifanê (Kurudere) ye ya ser bi navçeya Çelê ya girêdayî Culemêrgê. 73 salî ye. Lîse qedandiye. Mudîriyeta Perwerdeya Mîllî ya Culemêrgê teqawîd bûye. Niha li Culemêrgê niştecih e. Wî, ev destan di kaseteke 44 dq'yî da vegotiye.

**- Leşker Şîvişkî (Leşker Demir):** Xelkê gundê Şîvişk ( Kavaklı) ye ya ser bi navçeya Çelê ya girêdayî Culemêrgê. Derdora 60 salî ye. Di Mudîriyeta Îtfaiyê ya Belediya Culemêrgê dixebite. Niha li Culemêrgê niştecih e. Wî, ev destan di kaseteke 15 dq'yî da vegotiye.

**- Selîm Peyanisî (Selim ? ):** Xelkê gundê Peyanis (Geçitli) ye ya ser bi Culemêrgê. 68 salî ye. Li gundê xwe niştecih e û bi cotyariyê ve meşxûl e. Wî, ev destan di kaseteke 14 dq'yî da vegotiye.

**- Seyyîd Omer Kelêtanî (Ömer Demir):** Xelkê gundê Kelêtanê ( Taşbaşı) ye ya ser bi Culemêrgê. 77 salî ye. Li gundê xwe niştecih e û bi cotyariyê ve meşxûl e. Wî, ev destan di kaseteke 12 dq'yî da vegotiye.

**- H. Îskenderê Biyadirî (İskender Akar):** Xelkê gundê Biyadir (Narlı) ye ya ser bi navçeya Çelê ya girêdayî Culemêrgê. Nêzîkî 100 salê bûye. Li gundê xwe niştecih e. Wî, ev destan di kaseteke 5 dq'yî da vegotiye.

1.1.4. Ji Aliyê Ruxsarî ve Destana Kela Dimdim

Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn, ya me li devera Hekariyan tomarkirî nêzîkî heftsed bend e. Destan di nava xwe da li dû mijarê dabeşî heft beşan dibe. Bi benda:

*"Xulimîne xulimîne*
*Gelî xelk û alemîne*
*Guh biden dil û yeqîne*
*Qeseta Xanê Lepzerîn e"*

dest pê dike û bi benda:

*"Hey Dimdimo kavl û wêran*
*Meskenê piling û şêran*
*Rovî lê d'ken geşt û gêran*
*Rehmet day û babêd guhdêran"*

ve xelas dibe.

Piraniya bendên vê destanê sêrêzî ne. Lêbelê hinek erdan hejmara ristên bendan zêdetir lê hatine. Di destanê da kêşeya Kurdî ya xwemalî heye. Her ristek ji heşt kîteyan pêk têt.

*Dimdimo berekî pan e : 8 kîte*
*Kirin armanca topane : 8 kîte*
*Egîd her Xanê Kurdan e : 8 kîte*

Lêbelê di hinek ristan da ev kêşe hatiye kurtkirin an jî zêdekirin.

Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn bi temamî menzûm nîne. Di nava beşên destanê da hinek hûrgilî bi axiftinê têne vegotin. Jiber ku serhatiya destanê hemî di bendan da nahêt vegotin hinek hûrgiliyên di bendan de nahatiye gotin wekî pexşan têtе gotin. Lêbelê taybetiya karekterîstîk ya destanê di manzûmbûna destanê da ye. Destan bi du selîqe û meqaman têtе vegotin. Beşên yek, du û sêyê bi seliqe û meqamekî nerm têtе gotin. Beşa çarê wê ve heta dawiyê jiber ku qala şer û pevçûnê dike bi selîqe û meqamê bilind û lez têtе xwendin. Di beşa yeke heta beşa sêyê di navbera bendan da jibo wergirtina nefese û diriskirina selîqa gotinê naqarata: "*Xan bi xezayê meşxûl e*" an "*şêrêd xanan kir dîwan e*" têtе gotin. Di beşa çare û wê ve jî naqarata: "*herê Dimdimo Xan tê da, şer e Dimdimê xanan e*" têtе gotin.

# 2. NAVEROKA DESTANA DIMDIM

Wekî me li jorî jî îfade kirî Destana Dimdim li ser bûyereke dîrokî ava bûye. Lewra Destana Dimdim jiber kû di dîrokê da wekî bûyereke rasteqînî heye di heman demê da jî mijara zanista dîrokê bi xwe ye. Jêderê dîrokî jibo vê serhatiyê Îskender Beg Turkman e (1561- 1635). Ew bi xwe di vî şerî da amade bûye û serhatiya vî şerî di kitêba xwe ya bi navê “*Alem Arayî Ebbasî”* da bi berfirehî nivîsiye. Lêbelê jiber ku ev kese neyarê Xanê Lepzêrîn bû, wî, ev bûyere herçend bi çavê dijminahiyê nivîsibe jî heqê mêrxasiya Xanê Lepzêrîn bi temamî nexwariye. Ev bûyera girîng gelek kartêkirin li ser civaka Kurdî kiriye. Jiber vê karîgeriya wê, destaneke netewî ya mêrxasiyê li ser hatiye avakirin. Di navbera Dimdima dîrokî û çîrokî da hem wekhevî hem jî cudahî hene. Dema em herduyan berawird dikin baştir vê çendê dihesin.

## 2.1. DESTANA DIMDIM YA DÎROKÎ

### 2.1.1. Cih û Dem

Kela Dimdim dikeve başûrê rojavayê bajarê Ûrmiyê nêzîkî perava Derya Ûrmiye. 18 km ji Ûrmiye dûr e. Dikeve di navbera Çemê Barandûz û Geliyê Qasimlo. Nêzîkî gundê Balancê ye. Li ser bilindiya çiyayekî hatiye avakirin ku navê wî zinarî Dimdim e. Hemberî Dimdim zinarek dî heye ku dibêjinê Cimcim. Zinarê Kela Dimdim li ser hatiye avakirin ji aliyê bakûr û başûr ve kevirekî hulî ye û rê nîne. Lêbelê ji aliyê rojhelat û rojava ve pîçek firehtir e û rê heye. Ev kele hêj di berî Îslamê hatiye avakirin. Emîrxanê Biradostî ew kela kevin serejinû ve ava kir. Dema dorpêça Kela Dimdimê di dawiya sala 1608 dest pê kiriye û şerî heta dawiya sala 1609ê dewam kiriye.

### 2.1.2. Emîrxan û Biradostî

Lehengê Destana Dimdim Emîrxanê Biradostî ye. Di destpêka sedsala XVIan da Biradostiyan du mîrgeh ava kiribûn. Vê serdemê da hem Osmanî hem jî Safewî

wekî du dewletên bi hêz derdekevin pêş. Sefewî hemberî Kurdan polîtîkayeke req û neyînî bi kar tînan. Mîrên Kurdan radikirin û li dewsa wan mîrekî Turkmen yê şi'î datînan. Kurd hemberî vê polîtîkayên wan bêzar bûn. Lewra peywendî digel Osmaniyan çêkirin û hemberî Sefewiyan bûne hevkarên Osmaniyan. Li hemberî vê çendê jî Osmaniyan mîrgehên Kurdan bi resmî nas dikir. Biradostiyan jî hem di navbera bajarê Urmiye û Hekarê da hem jî di navbera Şino û Urmiye li devera Mêrgever û Têrgever du mîrgeh ava kiribûn. Emîrxanê Biradostî mîrê Biradostiyên Mêrgever û Têrgever bû.

Li dû agahiyên Şerefxanê Bidlîsî dide mîrên Biradostiyan ji eşîreta Goran in.[10] Lêbelê divêt em Goranên bi zaraveyeke cûda diaxivin û eşîreta Goran tevlîhev nekin. Eşîreta Goran li bajarê Akrê niştecih in û bi kurmanciyeke, soranî tekel diaxivin. Ev çende ji aliyê deqên devkî ve jî tête piştrastkirin ku Emîrxan 'eslê xwe ji eşîreta Goran e. Di dema Şah Îsmaîlê Sefewî da mîrê Biradostiyan Xazî Qiranê kurê Sultan Ehmed bû. Dema mîrên Kurdan pêgiriya xwe bo Şah Îsmaîlî diyar kirî ew bû tabi'ê Şah Îsmaîlî. Dema Yavûz Sultan Selîmê Osmanî hatiye deverê Xazî Qiran bû tabi'ê Osmaniyan. Dema Osmaniyan Azerbaycan girtî Xazî Qiran digel Kanunî Sultan Suleyman tevgeriya. Piştî wî kurê wî Şah Muhemed li şûna wî bû mîr. Di dewra Sultan Selîmê IIyê (1566- 1574) da mir. [11] Lêbelê li dû agahiyên Îskender Beg Munşî dide navê mîrê Biradostiyan Qere Tac bû. Şahî, Têrgever û Mêrgever dabûne destê wî. Dema Osmaniyan devera Azerbaycanê standî Kurdên vê deverê gehiştine Osmaniyan. Piştî mirina Qere Tac kurê wî Şah Muhemmed Beg bû mîr û tabi'ê Osmaniyan bû. Emîrxanê Biradostî ji pismîrên Biradostiyan bû. Wî guhdariya Şah Muhemmedê Biradostî nedikir. Lewra çûbû gehiştibû Mîr Omerê mîrê Soran. Di şerekî digel dijminên Mîr Omerê Soran da destekî wî hate birîn. Lewra wekî

---

[10] Bidlîsî, Şerefxan, *Şerefname Dîroka Kurdistanê*, (Wer: Ziya Avci), Weş. Avesta, Stenbol, 2007, r. 388.

[11] Bidlîsî, Şerefhan, *b.n.b.*, r. 389.

Emîrxanê Çolaq dihate nasîn. Piştî Şah Muhemmed mirî neviyê wî Ewliya Beg bû mîrê Biradostiyan û dema Şerefxanî Şerefname qedandî (1597) ew hêj mîrê Biradostiyan yê li ser tifaqa Osmaniyan bû.

2.1.3. Bûyer

Dema Şah Ebbasê Sefewî (1588- 1629) di sala 1603ê jibo standina Azerbeycanê ji Osmaniyan berê xwe daye vê herêmê, hîngê Emîrxanê Biradostî bû tabi'ê Şah Ebbasî. Şah Ebbas, nasnavê "Xan" da Emîrxan Biradostî û wekî mezinê eşîreta Biradostî nasî. Di heman demê da destekî zêrê sor û ji elmas û gewheran ve xemilandî bo çêkir. Deverên Têrgever, Mêrgever, Şino û Urmiye danê. Emîrxan Biradostî jî hemberî vê çende êrîş birin li ser Osmaniyan û mîrên Kurdan yên li ser tifaqa wan û karî gelek deveran jê bistîne. Dema Cağaloğlu Sinan Paşa li Selmasê li hemberî Sefewiyan şer kirî û têkçûyî Emîrxan beşdarî şerî nebû. Lêbelê Şah Ebbas lê borî.[12]

Emîrxanî jiber wêranbûna Kela Urmiyê gote Şahî. "*ev kele kêrî parastina deverê nahêt. Heke tu izna min bidey hema ez dê çar dîwaran li ser girekî Têrgewerê ava bikim*". Şahî jî izin dayê. Dema izin wergirtî ew çû keleke kevin ya berî Îslamê hebû ku Kurdan digotinê Kela Dimdim serejinû ava kir. Waliyê Tebrêzê yê Sefewiyan Pîr Bûdaq Xan ji hizrên Emîrxanî ditirsiya lewra çû cem Şahî û nekamiya Emîrxanî kir. Li ser vê çendê Şah Ebbas gote Emîrxanî çêkirina kelê rawestîne. Lêbelê Emîrxanî guhdariya wî nekir, berdewamiya çêkirina kelê kir û li ser ra xwarin û çek kêşane kelê. Bi vî awayî hêdî hêdî ji bin hukmê Sefewiyan derkeft. Herwesa birayê mîrê Mukriyan Şêx Heyderê Mukrî, Ebdal Begê ku li hemberî Sefewiyan serî hildabû digel bîst zelaman hate nik Emîrxanî û ewî jî ew hewandin.

---

[12] Îskender Bey Türkmen, *Târih-i Alem Arayi Abbasi*, I, Brh. İrec Afşar, Müessese-i İntişârât-ı Emîr Kebîr, Tahran, 1387, r. 2/792.

Di wê navberê da 20 hezar Celaliyên[13] Osmanî jiber Kuyucu Murad Paşayê Osmanî ji erdê Osmaniyan revîn û qesta Sefewiyan kirin. Şah Ebbasî xwest heşt hezar Celaliyan di nav Biradostiyan da bi cih bike. Wî dixwest bi rêka Celaliyan kontrolê li ser Emîrxanî bike. Şahî cab bo Emîrxanî hinart ku digel Pîr Bûdaqê waliyê Tebrêzê be. Lêbelê Emîrxanî got: "*Pîr Bûdaq dijminê min e lewra ez nikarim digel wî tev bigerim*". Li ser vê çendê Şahî, Pîr Bûdaq guhart û li şûna wî Hesen Xanê Ûstaclû rêkir. Dema Hesen Xan gehiştiye Meraxayê gote Emîrxanî: "*were tevlî min bibe. Heke tu nekarî bêy jî hinek mirovên xwe rêke*". Vê carê jî Emîrxanî hecet girtin û got: "*Celalî kesên baweriyê nînin û ez nikarim beşdarî heft heşt hezar Celaliyan bibim*". Bi vî awayî Hesen Xan û Celalî nêzîkî Kela Dimdim bûn. Dema nêzîkî kelê bûyî Emîrxanî bere bere Kurd dihinartin li ser Celaliyan û zayiat didane wan. Muhemed Paşayê serokê Celaliyan jî bersiv dida Kurdan û şer û lêkdan di navbera wan da diqewimîn. Kar ji deste Hesen Xan derkeft, naçar ma û Şah Ebbas ji vê çendê agehdar kir.[14]

Li ser vê çendê Şah Ebbas wezîrê xwe Î'tîmadu'd- Dewle Hatem Beg şande li ser Kela Dimdim. Ew bi hêzeke mezin ve hat û di ser rêya xwe Pîr Bûdaq jî bi 2000 Celaliyan ve tevlî vê hêzê bû. Û herwesa kesekî bi navê Muhemad Axayê Gisocî yê hevalê Emîrxanî jî anîn da ewî qanih bike. Dema Emîrxanî ev hêza mezin dîtî got: "*Mihemed Paşayê Celalî çav li milkê min heye lew ez nedihatim. Niha zivistan e. Kurekî min digel xwe biben û biharê ez bi xwe dê bême xizmeta Şahî*". Î'tîmadu'd-Dewle ev çende qebûl kir lêbelê gote Emîrxan: "*tu û mirovên xwe hemî ji kele werin dere, bibin mêvanên min û roja paştir jî em dê bêne kelê û bibin mêvanên te*". Lêbelê her çend mane hêviya Emîrxanî, Emîrxan nehat mêvandariyê. Li ser vê çendê Muhemad Axayê Gisocî şandine kelê cem Emîrxanî. Emîrxanî jî gote mêvanê xwe:

---

[13] Ev Celalî ne Eşîra Celalî ya Kurd ya ku vê gavê jî li devera Agirî û Makoyê dijîn. Ev Celalî piraniya wan Turkmenên Anadolê bûn ku ji reveberiya Osmaniyan ne razî bûn û li hemberî wan serî hildabûn.
[14] Îskender Bey Türkmen, *b.n.b.*, r. 2/794.

"*Qizilbaş û Celalî dixwazin milkê min ji min bistînin lew min bawerî pê nahêt kû ez biçim di nav wan da*". Li ser vê çendê hêza Sefewî û Celaliyan 5î Kanûna Biçûk ya sala 1608ê (26 Şe'ban 1017) dest bi muhasereya kela Dimdim kirin.[15] Hejmara leşkerê Sefewiyan nêzîkî 25 hezaran bû. Beranberî vê hejmara Kurdan nêzîkî hezar şervanan bû[16].

#### 2.1.3.1. Kela Dimdim

Kela Dimdim li ser çiyayekî bilind ku hemî kevir bû û li ser parçeyeke dirêj û ne fireh hatibû avakirin. Herdu aliyên wê yên bakûr û başûr geliyekî kûr bû û mirovî dikarî tene bi rêka pêstirkan li wê dere serkeve. Lewra li van herdu aliyan çi şûr û beden nebû. Çunkî pêdivî bi şûr û bedenî nedikir. Li aliyê rojhelatê derwazeyek bilind hebû ku bi çiyayî ve dima û li wê derê şûreke bilind digel çend bircekan hatibûn avakirin. Vî alî tenê dergehek hebû. Aliyê rojavayê ku nêzîkî erdî bû şûreke bilind, asê û mukim lê hatibû avakirin. Li aliyê başûrê vê şûrê dergehekî din hebû. Rêya vî dergehî di nava kevirekî teng da derbas dibû ku tenê siwarek jî gelek zehmet tê da derbas dibû. Rêya standina kelê tenê di aliyê rojhelat û rojava hebû û ew jî jibo hilkolana dîwarên kelê pêdivî bi kolana tûnel û xendekan ve bi kotekî mumkîn dibû. Li aliyê rojhelatê jî bi dûratiya tufengekê (nêzîkî 700- 800 metre.) kevir û helanekî yekparçe bû, lewra kolana xendek û tûnelan jibo wî alî gelek bi zehmet bû. Û li ser vane hemîyan ra Kurdan dîwarên kelê neqeb neqeb kiribûn û bircek li dawiya vî kevirî ava kiribûn ku hindava kelê bû. Ev birce hind mezin bû wekî kelokekê bû û bi kela serekî ve girêdayibû. Heta ev birce nedihate standin kesê nidikarî derbasî kela serekî bibe. Çunkî vê birca mezin nedihêla kes bikare tûnel û xendekan bikole. Bêyî standina vê bircê standina kelê ne mumkîn bû.

---

[15] Îskender Bey Türkmen, *b.n.b.*, r. 2/795,796.

[16] Serwer Ebdurehman Omer, *Karesatî Qelay Dimdim (1608- 1609)*, Entîtûya Kelepûrê Kurdî, Silêmanî 2008, r. 69.

Ava kelê ji birkeke (hawûzeke) mezin ku bi ava baranê ve tijî dibû pêk dihat. Lêbelê di nava geliyê dikeve bakûrê kelê kaniyeke ava wê kêm hebû û Emîrxanî ava wê kaniyê bi rêka solîneyan[17] di bin erdî da înabû kelê. Solînên vê avê bi rengekî baş hatibû veşartin û ev ave dihate kelê û li birkeke di nava kelê kom dibû. Jiber kêmbûna avê êvarî heta sibê bi zor ev birke tijî dikir. Ava vê birkê da kom dibû têra vexwarina rojekê ya xelkê kelê dikir. Li ser vê birka avê gumbetek ava kiribûn û pişta wê bi erdî ve rast kiribûn da ku yên derve vê birkê nebînin. Digotine vê birkê Sûlûq (Sirînc). Dîsa jibo parastina vê birkê bircek li ber dîwarê kelê hatibû avakirin û ev birce bi kela serekî ve girêdayibû. Li aliyê başûrî kunbefirek li tenişta kelê hatibû avakirin da li zivistanê tijî befir û cemed bikin. Di bin vê da jî birkek çêkiribûn ku dema havînê ev befir û cemede diheliya da li vê birkê da kom bibe. Li hindav wê kunbefrê jî kelokek hebû û hinek zêrevan têda bi cih bûbûn. Digotin vê birkê Bûzlûq û Qarlûk û ev dere jî wekî Sûlûqê jibo kesên derve, hatibû veşartin.

Bi rengekî giştî Kela Dimdim ji pênc keleyan pêk dihat: Kela Serekî, keleyek li xwarê, Kela Bûzlûq, Kela Sûlûq û birceke mezin li derveyî derwazeya rojhelatê. Ev her pênc kele wesa asê û mukim bûn mêwiyê nedikarî ber ra biçe.[18] Ji bilî vane Qesra Emîrxanî ku ew jî wekî keleyekê bû, di nava kelê da bû. Dema kele hatî standin ew der cihê dawî yê bergiriyê bû.[19]

2.1.3.2. Amadekariyên Şerî

Dema hêzên Sefewî dest bi muheseraya Kela Dimdim kirî ji bilî ew hêzên amade 500 kes ji tufenkçiyên Mazenderanê bi serokatiya Sefer Alî Yûzbaşî û Genc Elî Xan digel leşkerê xwe ji Tebrêzê hatin gehiştin ordûyê. Hesen Xan Ustaclu digel mîrên digel da çûne aliyê rojhilata kelê. Pîr Bûdaq, tufenkçiyên Xoresanê û Bafiqî

---

[17] Solîne: Boriyên avê yên ji axa sorkirî hatî çêkirin.
[18] Îskender Bey Türkmen, *b.n.b.*, r. 2/796, 797.
[19] Îskender Bey Türkmen, *b.n.b.*, r. 2/809.

çûne aliyê rojava. Murad Xanê Sultan Çînî digel tufenkçiyên Azerbaycanê çûne aliyê başûrê kelê li ber Keloka Bûzlûq. Parastina dergehê wî alî hêlane hêviya Genc Elî ve. Tufenkçiyên Mazendaranê digel qorûciyên Çegnî li hemberî Kela Sûlûq rawestan. Berxûdar Begê Enîs jibo dabînkirina topan hate raspartin. Demildest di Kela Goxercînlîk top hatin şandin û bi rêka keştiyan li ser Gola Urmiye derbas kirin û danane çeperên Ustaclu li hemberî kelê. Sê topên dî jî li ser cihên cûda hatine danan. Celalî jî li ser her çar çeperan belav kirin.[20]

2.1.3.3. Destpêka Şerî

Bi destpêkirina şerî ve Sefewiyan dest bi kolana tûnelan kir ku da bikarin xwe bigehînin dîwarên kelê. Dema gehiştine kevirê binîşê kelê êdî nekarîn axê bikolin. Lewra êdî ji kevir û teqnê, kolanên sergirtî çêkirin û bi vî awayî xwe nêzîkî kelê kirin. Ji van kolan û tûnelên ku li ser erdî çêkirî da bi satilan ve ax û kevirên kolayî derdixistin. Kurd jî destvala ranewedistan û wekî baranê gûlle lê dibarandin. Hinek caran jî dergehên kelê vedikirin û êrîş tînan li ser hêzên Sefewî, gelek jê dikuştin, ew kolan û tûnel xirab dikirin û dîsa vedigerîn kelê. Hinek caran jî bi dizîka dihatin nava wan tûnelan da leşkerê Sefewî dikuştin. Heta hind dikuştin rêka tunelê ji kelexan mişt dibû. Bi vî awayî mehên Remezan, Şevval û Zîlqe’de derbas bûn. Jiber ku wê salê hişkesalî bû ava kelê kêm bûbû. Ya heyî jî genî bûbû.[21] Jiber zêdebûna têhniyatiyê hero bi dehan kes ji jin, zarok û zelaman ji kelê derdikeftin û dema derdikeftin jî ji têhnan da serûser xwe li avê werdikirin. Ji aliyê din Qizilbaş her karêz dikolan da ku serekaniya kelê peyda bikin. Lêbelê peyda nedikirin. Lewra ferman hate dan ku topa balyemez, birka Sûlûq wekî hedef bigire da ku Kurd nekarin avê jê bikêşin. 21 rojan bi şev û roj top barandin.[22] Bi vî awayî Qizilbaşan kolan û tûnelên xwe gehandin Sûlûqê û Kurdan jî hemî hêza xwe bi kar îna da ku rêkê li ber

[20] Îskender Bey Türkmen, *b.n.b.*, r. 2/797.
[21] Îskender Bey Türkmen, *b.n.b.*, r. 2/798.
[22] Îskender Bey Türkmen, *b.n.b.*, r. 2/799.

wan bigirin. Jiber vê çendê dijwartirîn şer li vî çeperi hate kirin. Û dawiyê Qizilbaş karîn bigehine Sûlûqê. Piştî hîngê zanîn kanê serekaniya avê ji kî derê tête kelê. Av ji derve dihate kelê. Di 18yî Zîlhîcce (25 Adar 1609) Sûlûq hate standin. Piştî vê rûdanê Emîrxan û hevalên xwe di kelê da bê av man. Tenê Bûzlûq û birkên ji ava genî mabûn. Tam di vî wextî da ji qudreta Xudê baranek xurt barî û heta heyîvekê esmanî venekir û baranê dewam kir. Ava kelê têra şeş heyvên dî çêbû.[23] Di vî demê da Mihemd Paşayê Celalî mir.[24]

Hesen Xan Ustaclu biryara standina birca mezin ya derveyî kelê da. Çunkî bêyî standina wê standina kelê ne mumkîn bû. Qizilbaşan piştî kuştareke zor dayî karîn xwe bigehînin bircê. Agir berdane garîte û xetîreyên binê bircê. Dema ji kolana bircê derkeftî, da bêhna xwe vedin ji nişka ve birc herifte xwarê. Gelek kes di bin bircê da man. Qizilbaş bi destekî sivik çûne li ser bircê û yên sax mayî hemî kuştin. Yekî di nav kuştiyan da xwarzayê Emîrxan bû ku lawekî ciwan û berketî bû.[25] Dema ev birce ji holê rabûy rê li ber şûra kelê vebû û top bi sanahîtir birine ber dîwarên kelê. Topan dest bi topbaranê kir. Qizilbaş di wê hêviyê bûn ku heta du sê roj dî kele dê bête standin. Di wê navberê da serokê hêzên Sefewî Î'tîmadu'd- Dewle mir. Jiber vê çendê keftina kelê vema. Mihemed Beg Beydîlî Şamlû wekî serokê hêzên Sefewî hate tayînkirin. Şerî dîsa det pê kir. Vê carê birca binê kelê ewa kurê Emîrxanî yê mezin têda ji aliyê Pîr Bûdaq ve hate standin. Zêrevanên vê bircê karîn bigehin kelê.[26] Zêrevanên Bûzlûqê jî mecbûr man cihê xwe biterikînin. Êdî derfetên berxwedana kelê kêm bûn. Bi hemî milan ve top û tiveng li kelê hatin reşandin. Dîwarên kelê hemî hilweşiyan tenê qesra Emîrxan ewa digotinê Narîn Qela ma.

Dema Emîrxan û hevalên xwe gelek tengav bûyî mecbûr man qasidekî rêkin cem Mihemed Beg û daxwaza danûstandinê bikin. Di encama peywendiyan herdu alî

[23] Îskender Bey Türkmen, *b.n.b.,* r. 2/800.
[24] Îskender Bey Türkmen, *b.n.b.,* r. 2/802.
[25] Îskender Bey Türkmen, *b.n.b.,* r. 2/808.
[26] Îskender Bey Türkmen, *b.n.b.,* r. 2/809.

wesa pêk hatin ku kes xwe têkelî Emîrxanî nake heta ku Emîrxan bi xwe diçe cem Şah Ebbasî. Bi vî awayî Kurdan xwe teslîmî Sefewiyan kir. Berê Ebdal Begê Mukrî ji kelê derkeft û digel mirovên xwe çû bin xîveta Îlyas Xelîfe Karadaxlî. Paşî Emîrxan digel kûre xwe û nêzîkî sed zelaman bi çek û rext ve ji kelê derkeft. Nêzîkî 200 zelam jî mane di kelê da. Emîrxan çû cem Mihemed Beg Şamlû. Sefewiyan hinek leşker rêkirin di kelê da. Emîrxan û zelamên xwe di bin konekî mezin da hatine mêvankirin. Qizilbaşan kerbeke zêde ji Emîrxanî vedibûn. Lewra dixwestin bi hecetekê wî bikujin. Hatin gotin Mihemed Beg Şamlu: "*tu çawan van Kurdan hemiyan li cem xwe dihêlî. Emîrxan û kurekî wî û çend mirovên wî bihêle yên din li nav xîvetên leşkeri belav bike*". Mihemd Beg Şamlû jî gote Emîrxanî: "*cih berteng e hinek mirovên xwe bihêle cem xwe yên din em dê belav bikin*". Pêşiyê Emîrxanî eve qebûl kir lêbelê zelamên wî, ev çende qebûl nekirin. Di vê navberê da dengek bilind bû ku Ebdal Begê Mukrî, Îlyas Xelîfe kuştiye. Îlyas Xelîfe wekî mûrîd û nûnerê binemala Sefewiyan dihate zanîn û di nav Qizilbaşan da qedrekî mezin hebû. Dema Ebdal Begê Mukri di bin xîveta wî da, wan xwestibûn çek û rextên wan jê veken. Wan jî webûl nekiribû û êrîşî Îlyas Xelîfe û xulamên wî kiribûn û ew hemî kuştibûn. Leşkerê Sefewiyan jî êriş bire ser wan û Ebdal Beg û mirovên wî kuştin. Dema ev rûdane eşkera bûyî Emîrxan û leşkerê xwe jî êrîş birin li ser Sefewiyan. Ji hemî aliyan ve Qizilbaşan êrîşî Emîrxanî û hevalên wî kirin. Piştî şerekî dilsoj Emîrxan û hevalên wî hemî hatin kuştin. Lêbelê Qizilbaşan jî kuştareke zor dan. Paşî Qizilbaşan êrîşî kelê kirin û ewên di kelê da hetta ewên şeş meh berî hîngê teslîm bûyî jî kuştin[27].

### 2. 2. DESTANA DIMDIM YA ÇÎROKÎ

Destana Dimdim li ser bûyereke dîrokî hatiye avakirin. Piştî ku ev bûyer wekî destan û serhatiyeke menzûm ketî li ser zimanê dengbêj û beytbêjan, bi awayekî rewanbêj û bi hûneren edebî ve xemilandî hatiye vegotin. Herwesa di bûyeran da jî

---

[27] Îskender Bey Türkmen, *b.n.b.*, r. 2/811.

hinek zêdekirin an jî kêmkirin çêbûne. Gelek tiştên bi rêka dîrokê negehiştî roja me bi saya destana devkî em li ser hûrgiliyên wê agahdar dibin.

2. 2. 1. Cih û Dem

Di waryantên destanê da erdê kela Dimdim lê hatiye avakirin “*Deşta Hozanê*” ye. Ev deşte wekî zozaneke bilind tête danasîn. Li vê deştê da ew girê ku Xanê lepzêrîn xezîne û gencîne lê dîtî wekî “*Girê Gencê*” tête binavkirin. Kela Dimdim jî li ser vî girî hatiye avakirin. Di destanê da behsê Şahê Îranê Şah Ebbas tête kirin ku serokê hindî Îran û ‘Ecematê bû. Şah Ebbas di navbera salên 1588 û 1629ê şehînşahiya Sefewiyan kiriye. Lewra ji destanê dema bûyerê jî eşkera dibît. Di destanê da Xanê Lepzêrîn, heft salan gavanî, xulamî û hevaliya Şahî kiriye. Heft salan Kela Dimdim ava kiriye û heft salan jî şerê Sefewiyan kiriye. Bi vî awayî behsê serhatiya Xanî ya bîst û yek salan dike.

2. 2. 2. Kes û Leheng

Bûyera dîrokî ya Dimdim ji aliyê kesekî (Îskender Beg Turkman) dijminê Xanê Lepzêrîn ve hatibû nivîsîn. Lewra kesên di vegotina dîrokî da derbas dibin ji Kurdan bêhtir Sefewî ne. Di destana devkî da jî berevajî vê çendê navên Kurdan zêdetir derbas dibe. Di destanê da navê gelek kesan derbas dibe. Di waryantên cûda da navê Xanê Lepzêrîn bi gelek rengan hatiye gotin. Wekî Xanê Lepzêrîn, Xanê Zêrîndest, Xanê Çengzêrîn, Xanê Kurda, Xanê Sor, Mîrxan û Xanemîr derbas dibît. Gelek caran bi kurtî wekî Xano û Xan jî hatiye gotin. Di destanê da Xanê Lepzêrîn eslê xwe ji eşîreta Goran e. Ji Deşta Hizarcotê jiber xwîndariyê derkeftiye û hatiye cem Şah Ebbas. Wekî me jorî gotî Şerefxan jî vê çendê piştrast dike. Lêbelê Eşîreta Goran ne Goranên bi zarava Goranî diaxivin in. Deşta Hizarcotê ber bajarê Akrê da ye û Akrê navçeyeke Dihokê ye li Başûrê Kurdistanê. Ev Eşîreta Goran niha jî wê derê dijîn û kurmanciyeke tevlî soranî diaxivin. Wesa diyar e binemala mîrên

Biradostî bi eslê xwe ji Eşîreta Goran in, demekî gelek kevin da hatine nav Biradostiyan.

Lehengê dûyê destebirayê Xanê Lepzêrîn, Ebdal Begê Mukrî ye. Ew jî hinek caran wekî Mukurî an jî Xanê Sor derbas dibe. Navê Şah Ebbas di destanê da derbas dibe. Lêbelê jibo Şah Ebbas gelek caran bi kurtî Şah, Şahî an jî Şayî hatiye gotin. Di destanê da lehengê xirabiyê Xelîfe ye. Xelîfe wekî wezîrê Şah Ebbasî xuya dike. Xelîfe berdewam Şah Ebbasî derheqê Xanê Lepzêrîn da sor dike û nekamiya Xanî cem Şahî dike. Heke em destana çîrokî digel bûyera dîrokî bidin ber hev hîngê em dê bibinin kû ji Xelîfe meqsed Pîr Bûdaqê walîyê Tebrêzê ye. Çunkî ew gelek dijminê Kurdan bû û bi dewamî Şah li hemberî Xanî sor dikir. Xelîfe Îlyasê di bûyera dîrokî da derbas dibe roleke ber bi çav nîne. Malbata şahên Sefewî jiber ku neviyên Şêx Sefiyeddînê Erdebîlî bûn di nava Qizilbaşan da wekî maleke teberûk û pîroz dihatin qebûlkirin. Mala şahî hinek mirov wekî Xelîfe rêdikirin li nav tagir û alîgirên xwe, da ku mezhebê xwe belav bikin. Xelîfe Îlyas jî yek ji wan bû.

Ji bilî kesên jorî navên wan derbasbûyî navên jinên malbata Xanî derbas dibin û hemî wekî sitî (xanim) têne binavkirin. Navê dayika Xanî Le’lîxan e. Navê bûka wî jî Xan Perî ye. Keça Şah Ebbas e û jina kurê Xanê Lepzêrîn yê mezin Ebdal Begê ye. Mehmudkê Alekanî (hinek waryantan da Kakanî) sembola xaînî û bêbextiyê ye ku serekaniya kelê nîşa Sefewiyan daye û bûye egera keftina Kela Dimdim. Lê Mehmûd bi eslê xwe Biradostî ye û ji ocaxa Lîtanî ye. Di destanê da heft kurên Xanî hene lêbelê tenê navê Ebdal Begê û Teterxanî derbas dibe. Ji bilî vane navên hinek serheng û mêrçakên Xanê lepzêrîn wekî Qeroyê Bêdkarî û Kanînî derbas dibin.

2. 2. 3. Kurtiya Destanê

Navê Xanê Lepzêrîn yê rastîn Ûmer e. Ew xelkê Hizarcotê ye. Babê wî hêj ew biçûk miribû, lewra semyanê wî dayika wî Le'lîxan bû. Rojekê xewnekê dibîne ku roj û heyv pêkve têne mala wî da. Ew gelek dimîne li bin te'sîra xewna xwe da. Diçe cem melayekî û te'bîra xewna xwe jê dipirse. Mela jê ra dibêje: " *tu dê gencxaneyeke gelek mezin bibînî. Tu dê bikarî bi saya wê gencxanê heft salan şerê dewletê bikey. Mişext, mêrkuj û mêrxas dê li dora te kom bibin. Navûdengê te dê gelek belav bibe. Tu dê bimirî lêbelê navûdengê te dê li dinyayê belav bibe*". Paşî Xanê Lepzêrîn li welatê xwe Hizarcotê xwîndar dibe. Lewra terka welatê xwe dike û tête cem Şahê Ecem. Şahê Ecem di demekî kurt da bi mêrxasî, camêrî, aqildarî û dilsoziya Xanê Lepzêrîn dihese. Lewra ew û Şah dibin dost û hevalên hevdû. Lê ev çende di gavekê da pêk nahêt. Berê çend salekan gavaniya Şahî dike. Paşî hêdî hêdî dostaniya wan pêşve diçe. Şah jiber camêrî û aqildariya wî gelek jê hez dike.

Rojekê Xanê Lepzêrîn destûra xwe ji Şahî dixwaze û diçe rav û nêçîrê. Di nêçîrê da baran û gijlok dibare. Ji nava gijlokê da hesinekî qudretî dikeve ber wî. Ew vî hesinî tîne û diçe cem ciqsiyekî. Ji ciqsî ra dibêje ku: "*tu dê şûrekî ji vî hesinî bijenî. Lêbelê berê tu jibo min li pêş çavên min sinceqekê bijene da ku tu hesinê min neguherî. Paşî ez dê heqdestê te bi dilê te bidim*". Ciqsî jî li pêş çavên Xanî, sinceqekê çêdike. Ev sinceq çawan pol darî qul bike wesa her hesinekî qul dike. Yanî cewherekî wesa mukim bû. Paşî ciqsî şûrekî jibo Xanî dijene û Xan jî kavlanekî bêserûber li ser şûrê xwe da dibe da ku kes pê nehese.

Rojek din Xanê Lepzêrîn û Şah bi hevra diçin nêçîrê. Di nêçîra xwe da rastî bîşeke qamîşî tên ku têda şêr dijîn. Dema şêr pê dihese ku hinek kes nêzîkî bîşî dibin niriyekê ber dide. Dema ewan dengê şêrî bihîstin tirsiyan. Şah dixwaze Xanî biceribîne kanê mêrxasiya wî çawan e. Dibêje Xanê Lepzêrîn: "*here wî şêrî bigire û bo min bîne*". Xan jî hinek lewenan dibire, dasbir dike, serê wan tûj dike û li ser

zendika xwe dialîne. Şûr û xencerê xwe jî digire û diçe şêrî. Kurê wî Ebdal Beg ku hîngê hêj zarok bû dide pey babê xwe. Dema Xan diçe nav bîşiyê, şêr êrîşî Xanî dike. Xan jî destê xwe yê bi levenan ve pêçayî dide ber devê şêrî û destê din ve jî şêrî digire. Lêbele şêr destê bi levenan ve hatî pêçan leq dide û zendika Xanî dikirîne. Xan her wekî tiştek nebûyî kurê xwe Ebdal Begê li pişta şêrî siwar dike û tîne huzura Şahî. Şah ji cesareta Xanî şaş dibe û hezkirina wî jibo Xanî zêdetir dibe. Şah, emir dide Xanî ku şêrî bikuje. Xan jî şêrî dikuje. Paşî çavê Şahî destê Xanî yê pêçayî dikeve. Jê dipirse: "*destê te çi lê hatiye*"? Xan dibêje "*Şahê xweş bît. Çi nîne. Pîçek birîn bûye*". Lêbelê yên derdorê dibêjin Şahî: "*nexêr şêrî destê wî ji zendikê ra qet kiriye*". Hîngê Şah emir dide ku destekî zêr bû Xanî bête çêkirin. Xudê Teala jî ruh da destê wî yê zêrîn. Ji berê baştir çêbûye. Û ji hîngê wê ve wekî Xanê Lepzêrîn bi nav û bang dibe.

Piştî hîngê Şah, Xanê Lepzêrîn dike şêwirmendê xwe û bêyî wî çi biryaran nade. Xan jî wekî mirovekî têgehiştî û aqildar rêkê nîşa Şahî dide. Şah gelek ji Xanî hez dike û qedrekî mezin didetê. Rojekê Şah û Xan herdu pêkve diçine Deşta Hozanê rav û seyranê. Wê derê rastî şivanekî tên û li cem wî bêhna xwe didin. Şivan jî şîrê miheke reş didoşe, dike kodekê û datîne li ber mêvanên xwe. Paşî jî diçe ber pezê xwe. Wan jî şîrê xwe vexwar. Şah dibêje "*Xano bo min bêhnekê bilûrê lêde da ez ber dengê bilûrê ra binivim*". Xan jî bilûrê lêdixe û Şah dinive. Dema Şah nivist Xan, bilûra xwe didane li ser koda tijî şîr. Di wê navberê de mêşek ji kepê (pozê) Şahî derkeft di nava bilûra li ser koda şîrî da derbas bû û çû li nav keleka keviran da li ser kevirekî rawesta. Paşî dîsa li ser wî kevirî rabû li nava bilûrê derbas bû û çû kepê Şahî da. Şah bêhnişî û ji xewê hijyar bû. Xan şaş û heybetî ma. Şahî got "*Xano min xewnek ecêb dît*". Xanî got "*Şahê xweş bît te çi xewin dît*". Şahî got "*min xewna xwe da didît ez li ser behreke spî di pireke kun (qul) da derbas bûm û çûme di nava gencîneyekê (xezîneyekê) da ku gelek gelek zêr û zînet têda hebûn*". Dema Şahî eve

got Xanî di dilê xwe da got “*ewa te xewnê da dîtî min bi çavên xwe dît*”. Xanî hez kir li ber Şahî berze bike û got “*Şahê xweş bît hindî hun mirovên mezin û maqûl in her hizrên malê xwe dikin. Lewra xewnên we jî li ser mal û xezînên dinyayê ne. Eve xewnerojke çi te’bîr bo nîne*”. Şah tênegehişt. Paşî herdu ji wê derê zivirîn da bêne mala xwe. Di rêkê da Xanî hecetek girt û got “*Şahê xweş bît min gustîra xwe bîr kir ew erdê me şîr lê vexwarî. Heke izna te hebît ez dê biçim bînim û bêm*”. Zivirî hate erdê şîr lê vexwarî û çû ew kevirê mêş li ser rawestayî veda û hinek kaxezên ku malîyeta wê gencînê tê da bû derxist, kire paxila xwe da, ew der jî nişan kir û hat gehişte Şahî.

Xan çû mala xwe ma çaverê mêvanekî xwenda da ku ew kaxezên dîtî bo bixwîne. Rojekê melayek dibe mêvanê Xanî. Xan jî ji mela dixwaze ku wan kaxezan bo wî bixwîne. Dema mela li kaxezan dinêre meselê têdigehe û dibêje “ *gencîne ye te dîtî, lêbelê li min û te bi nîvî ye. Nexwe dê bibêjime Şahî*”. Xan jî tirsiya ku ev melayê çavbirçî vê meselê hemiyê jibo Şahî eşkera bike. Lewra hêdîka xwe nêzî mela kir û paşî mela kuşt. Xan gencîneyeke mezin dîtiye lêbelê nizane kanê dê bi wê gencînê ve çi bike. Şevekê Xewsê Bexdayê (Şêx Ebdulqadirê Geylanî) tête xewna Xanî û ji Xanî ra dibêje “*ez qasidê Xudê me. Xudê ev gencîne da te, da ku tu pê şerê Eceman bikey*”. Xan şaş dibe û nizane kanê dê çi bike. Behsê gencînê û xewnê bo dayika xwe û malbata xwe dike. Ew jî dibêjin madem Xudê xezaya digel Eceman dixwaze divêt em jî teqsîriyê nekin û berheviyên şerî bikin. Xan jî wê gencînê jibo mesrefa şerê digel Eceman vediqetîne. Biryar didin ku berê dê keleke qaîm ava bikin û paşî dê li nav Kurdistanê bigerin û çend kesên merxas û egîd hebin dê di kelê da kom bikin. Zad û zexîre, çek û sîlahê bo şerî pêdivî jî dê kom bikin. Paşî jî dê şerê Ecemî bikin.

Dayika Xanî got “*kurê min here cem Şahî û hindî çermê gayî erdî ji dera hun çûye rav û seyranê jê bixwaze*”. Xan jî çû dîwana Şahî û erdeki hindî çermê gayî jê xwest. Şah çi me’nayê nade daxwaza Xanî. Her çend Xelîfe ji vê gotina Xanî kefte

şikê û gote Şahî "*ev Xane dê me bixapîne*" jî dîsa şah qanih bû û got "*Xano ew erdê me rav û seyran lê kirî hindî çermê gayî, min erd da te û here wê derê bo xwe xaniyekî ava bike*". Keyfa Xanî xweş bû û bi lez çû Girê Gencê gayek ser jê kir û çermê gayî heft rojan hêla avê da. Dema çerm baş nimiya, roja heştê qereçek anî çermê avê da nimyayî divêl divêl rakir û li kuna derziyê ra derbas kir û kire gulolkeke benî. Ew gulolka benî çend erdî digire hemî pîva û wekî cihê kelê diyar kir. Paşî Xan çû cem Şahî û bo çêkirina kelê hinek hosta û berhosta jê xwestin. Şah jî panzde pale bo rêkirin. Xan gelek aciz bû. Hate nik Şahî û got: "*Şahê xweş bît ma ez yê duhî û evroke me te panzde pale bo min şandî. Min hewceyî gelek palan heye*". Şah jî pênsed pale bo çêkirina kelê jibo Xanî rêkirin. Xan jî bi van pênsed palan ve xîmê kelê kola, binîşê kelê çêkir, ji serekaniyeke ji derveyî kelê bi rêka solînan av kêşa kelê. Dema kele nîvî kirin û cihê avê dirist kirin û bin axê da veşartin da ku ev pale cihê avê eşkera nekin serê hemiyan birî û kuştin. Tenê Mehmûdkê Alekanî sax hêla. Paşî dîsa çû cem Şahî û got "*ew palên te bo min şandî karê min nivîşkan hiştin û hemî revîn çûn. Min pênsed paleyên dî lazim in*". Şah dîsa pênsed palan dide Xanî ku kela xwe pê xilas bike. Xan jî bi wan pênsed palan ve kela xwe temam dike. Xan jibo qayîm çêkirina kele, xwe ji çi mesrefê nade paş. Zêr û pereyan li palan belav dike da kelê qaîm çêkin. Di çêkirina kelê da risas, mifriq, zêriç û pola têne bikaranîn da ku kele xwe li ber topbaranê bigire.

Piştî ku Xanî Kela Dimdim temam kir jibo ceribandina saxlemiya kelê destekî topan anî û top berdan dîwarên kelê. Sê şev û sê rojan berdewam topbaran kir lêbelê çi kêmasî li kelê peyda nebûn. Xan êdî ji saxlemiya kela xwe piştrast dibe. Xan izna xwe ji Şahî dixwaze û mala xwe tîne Kela Dimdim. Paşî Şah û Xelîfe jî têne pêş Kela Dimdim. Dema vê kela hinde bi heybet û asê dibinin Xelîfe dîsa nekamiya Xanî dike û dibêje şahî "*ev Xane dê me bixapîne*". Xan ji kelê derdikeve û pêşwaziya wan dike û dibe kelê. Şah jî wekî diyariya avakirina kelê keça xwe Xan Perîyê dide kurê Xanî Ebdal Begê. Xan jî bi keyf û şahî daweta kurê xwe dike.

Dema Kela Dimdim temam bûyî û daweta kurê xwe kirî; Xanê Lepzêrîn li nav gund û bajêrên Kurdan digere û kî derê mirovekî zîrek û mêrxas hebe tîne kelê. Di heman demê da qut û xwarina heft salan jî li kelê amade dike. Nav û dengê Xanî li nav Kurdan belav dibe. Xan Ebdalê Mukrî jî mirovekî feqîr bû. Dema bihîstî Xanê Kurdan daweta kurê xwe kiriye, ew jî mendalekê (dergûşekê) çêdike û qesta Kela Dimdimî dike da ku diyarî bide Xanî û da Xan jî şabaşekê bidete wî. Xanê Lepzêrîn jî tebdîlî qiyafet kir û ji kelê derkeft. Berê xwe didetê ku zelamek ji wê ve têt û mendalek li milî ve ye. Xanê Lepzêrîn gotê "*te xêr e zelam*". Xanê Mukrî jî got " *min mendalek çêkiriye dê bo Xanê Kurdan bibem. Belkî şabaşekê bidete min. Ez jî zarokên xwe pê xweyî bikim*". Xanê Lepzêrîn dibêje "*Xanê Kurdan mirovekî mûn e. Hewceyî bi mendala te ya darîn nîne*". Xanê Mukrî dibêje "*heke şabaş da baş e. Heke neda jî ji k..ê kerê min ve. Min çi minet pê nîne*". Xanê Lepzêrîn got "*tu dê biwêrî li cem wî jî wiha bibêjî*". Xanê Mukrî got "*dê cem wî jî wesa bibêjim. Ma dê jê bitirsim*". Dema Xanê Lepzêrîn eve bihîst zivirî hate kelê û kincên xwe guhorîn. Xulam hatin gotin "*Xano yek dixwaze te bibine*". Wî jî got "*bila bêt*". Xanê Mukrî hate jûr û got "*ezbenî ev e mendaleke darîn e min diyarî bo te anî da tu şabaşekê bideye min*". Xanî got " *malxirab ez dê çi bi mendala te bikem. Here bibe min nevêt û çi şabaşan jî nadem te*". Mukrî got " *heke şabaşê bidey baş e heke nedey jî mineta te k..ê kerê min ve*". Xanê Lepzêrîn têgehişt ku eve mirovekî çê û mêrxas e. Ji kursiya xwe hate xwarê û Xanê Mukrî hembêz kir û got "*tu mirovekî baş î. Were ez û tu bibine destebira. Here mala xwe jî bîne û werin di kelê bi cih bibin*". Herdu bûne destebirayên hevdû.

Piştî ku Xanê Lepzêrîn hemî amadekariyên xwe qedandin dest bi şelandina karwanên Şahî kir. Xelîfe bi lez çû cem Şahî û giliya Xanê Lepzêrîn kir û got "*Şahê xweş bît, ew Xanê Kurdan ewê te gelek mezin kirî bû dijminê me û çavê wî li doşeka te ye. Bazirganên te şelandin*". Şahî got "*nexêr Xan mirovekî emîn e. Vê digel min naket*". Xelîfe got "*Şahim eger tu ji min bawer nekey tancê xwe rêke bo Xanî û bibêjê*

*bila wî tancî ramûsîne û deyne li ser serê xwe*". Şahî jî qebûl kir. Tancê Şahî bo Xanê Lepzêrîn rêkirin û gotinê Şahî gotiye bila ramûse û deyne ser serê xwe. Xanî eve qebûl nekir û ser ra tancê wî şkand. Dema Şahî eve zanî, gotina Xelîfe qebûl kir û emir da Xelîfe ku ordiyekê bibe û Kela Dimdim xirab bike û Xanê Lepzêrîn jî dîl bigire û bîne. Xelîfe ordiyeke mezin amade kir û hat Kela Dimdimî dorpêç kir. Çend top berdane kelê jî çi kêmasî nebirin kelê. Her şevekê Kurd ji kelê derkeftin û êrîş înane ser ordiya Xelife. Ji bilî Xelîfe kesek ji wê ordiyê nehêla. Xelîfe jî revî û çû cem Şahî. Got "*ji bilî min kesek ji ordiya min nema*".

Şahî gote Xelîfe "*ordiyekê rake here Kela Dimdim dîsa dorpêç bike û rezekî jî bo min dane. Heke heta berê rezê min nehatî tu kele bistînî baş e. Heke rezê min berê xwe da û te hêj kele nestandî hîngê ez dê ordiyeke gelek mezin ve bême wê derê*". Xelîfe jî ordiya xwe rakir û Kela Dimdim dorpêç kir. Rezek jî dana. Sê salan bê navber Kela Dimdim topbaran kirin lêbelê nekarîn kelê bistînin. Sala sêyê rezê Şahî berê xwe da. Şahî got "*madem sê sal derbas bûn û rezê min jî berê xwe da û hêj Kela Dimdim nehatiye standin cabê bo hemî ecematê û Îranê rêkin bila hemî Xanên Îranê leşkerê xwe kom bikin û bên*". Kaxez û name bo hemî aliyên Îranê hatin belavkirin û Xanên Eceman bi leşkerên xwe ve hatin harî Şahî. Şah bi ordiya xwe ve hat û Kela Dimdim dorpêç kir. Demildest dest bi topbarandineke xurt kirin. Paşê tancê xwe rêkir bo Xanê Kurdan ku vî tancî qebûl bike û ramûse. Lêbelê Xanê Kurdan got "*ez Kurdîniyê be nav û bê namûs nakim, lewra tancê te qebûl nakim*".

Bi vî awayî dorpêça li ser Kela Dimdim çar salên din bi dijwarî dewam dike. Di vê navnerê da xwarin û erzaqê kelê jî hêdî hêdî kêm dibe. Dema ku xwarin û erzaq kêm bûn Xanê Kurdan xwest Eceman bixapîne. Dêlek li ber kelê dizê. Xanê Kurdan bi şîrê dêlê maste firiyê çêdike û dide destê Qeroyê Bêdkarî, jibo Şahî rêdike. Dema Şah firiyê taze dibîne dibêje. "*eve heft sal e me Kela Dimdim dorpêç kirî lêbelê Xanê Kurdan ji aliyê xwarin û vexwarinê ve bê minet e û jibo min firiyê terr*

*rêdike*". Hêdî hêdî li ser rakirina dorpêça kelê difikire. Paşî ji qasidê Xanê Kurdan Qeroyê Bêdkarî pirsî kanê serekaniya ava Kela Dimdim kî derê ye. Qeroyê Bêdkarî bê tirs gote Şahî "*heke hun bixwazin dikarin min bikujin lêbelê ez serekaniyê nîşa we nadem, xiyanetê li Xanê xwe nakim*". Şah jî jiber dilsoziya wî, wî xelat dike û rêdike.

Di vê navberê da Mehmûdkê Alekanî hizra xaîniyê dike û şevekê xwe ji Kela Dimdim ber dide xwarê û tê li cem Şahê Ecem û dibêje "*Şahim, Xanê Kurdan we dixapîne. Di kelê da şîva şevê nemaye. Ew firiyê ter ji şîrê dêlê çêkiribûn. Ez dixwazim serekaniya ava kelê nîşa we bidim*". Şah gelek pê memnûn dibe. Bi vî awayî Mehmûdkê Alekanî serekaniya ava tête Kela Dimdim nîşa Eceman dide. Şahî gote Medmûdkî "*hemberî vê qenciyê tu çi ji me dixwazî*". Medmûd got "*Şahê xweş bît min bûka Xanê Lepzêrîn, jina Ebdal Begê Xan Perî divê*". Jiber ku Xan Parî keça Şahî bû, Şah gelek aciz bû û emir da ku Mehmûdkê Alekanî serûser bikin devê topê da û berdin bircên kelê. Wan jî qet teqsîrî nekirin û bi vî awayî Mehmûd gehişte heqê xwe. Ecem rabûn se û hêştir li ser serekaniyê serjêkirin û paşî jî ava kelê birîn. Sirîcxaneyên kelê tijî xwîn bûn û av jê hate birîn.

Xanê Kurdan sibê jibo nimêjê rabû çû sirîcan da destnimêjê wergire mêze kir ku sirîcxane hemî bûye xwîn û av jî lê hatiye birîn. Dema ehlê kelê hemî rabûy ev çende zanî halê wan gelek nexweş bû. Êdî bêhnmirar kefte kelê û zar û zêçan ji têhnan da kirin nalenal. Hemî ji xaîniya Mehmûdkê Akekanî gelek aciz bûn. Xanê Kurdan ji naçarî destên xwe ber esmanî vekirin û dua ji Xudê xwest da ku baranekê bibarîne. Xudê Teala ji banê bilind dil bi wan sot û her çend demê baranan jî nebû lêbelê baraneke xurt rêkir. Piştî barîna baranê şahyane kefte nav ehlê kelê. Moral û motîvasyona şervanên Kurd bilind bû. Hîngê Xanê Lepzêrîn hizir kir ku nameyan bo mîrên Kurdan rêke da ku hewara Kela Dimdim bên. Jibo her mîrekî Kurdan name nivîsîn û rêkirin ku bêne hewara Xanê Kurdan. Piştî demek çûyî çi cewab ji mîrên Kurdan nehatin û kes hewara Kela Dimdim nehat. Dema hewar jibo Xanê Kurdan

nehatî dayka wî gotê: "*hewara te îlla batinî û minasibên Xudê ne. Duayê bike da ew bêne hewara te*". Xanê Kurdan jî dua ji Xudê xwest kû ewliya û batinî bêne hewara wî. Xudê duaya wî qebiland û komeke batiniyan di sûretê teyran da dadan li ser bircên Kela Dimdim û hatin harî Xanê Kurdan.

Piştî ku ava baranê jî hêdî hêdî kêm bûy derfetên berxwedana kelê jî kêm bû. Hîngê dayka Xanê Kurdan hate cem kûre xwe û gotê "*kurê min destê xwe bide şûrê xwe û tu û leşkerê xwe dakevin meydanê. Bi mêranî şerê xwe bike da nav û dengê mêraniya te li dinyayê belav bibe*". Xanê Kurdan jî leşkerê xwe bo êrîşa dawiyê amade kir. Paşî got: "*eybeke me heye*". Ehlê kelê got: "*Xano eyba me çi ye*"? Wî got "*eyba me sitî ne (xanim in). Piştî ku em bêne kuştin ew dê bo kê bin*". Sitiyan hemiyan pêkve gotin "*piştî we me maldarî heram bît*". Hinek jinên kelê jibo ku bi saxî nekevin di destê Eceman jehr vexwarin û xwe kuştin. Hinekan jî mendal û dergûşên xwe bi xwe ve girêdan û xwe ji bircên kelê berdane xwarê. Ev fîdakariya jinan cerg û dilê Xanê Kurdan sot. Lêbelê bûka Xanî, Xan Periyê xwe nekuşt û got "hemlê min hemlê kuran e. Kurê min dê heyfa babê xwe hilîne. Lew ez xwe nakujim". Xanê Kurdan jî ew destûr da ku piştî şerî biçe mala babê xwe. Di vê navberê da Xanê Mukrî jina xwe û kurê xwe li ser pişta hespî siwar kir û anî eywana kelê. Dema çavê Xanê Lepzêrîn vê çendê keftî gote Xanê Mukrî "*we diyar e dema bû şer tu dê birevî*". Mukrî gelek aciz bû û jina xwe û kurê xwe demildest kuştin.

Paşî Xanê Kurdan emir da ku çend zêr û zînetê kelê bihelînin û bikin şûr û alatên şerî. Û her wesa herkes şûrên xwe seqa bidin û karê xwe bikin. Leşkerê xwe hemî ber dergehê kelê kom kir û pilana xwe jê ra got. Got "*em dê bi rengê teslîmbûnê derkevin. Paşî dê li nav xîvetên Eceman belav bîn. Ez dê biçim bin xîveta Şahî, Xanê Mukrî jî dê biçît li bin xîveta Xelîfe. Dema min şer helêxist hun jî dest bi şerî bikin. Heta dengê şûrê min nehêt kes dest bi şerî neke*". Bi vî awayî ji kelê derkeftin. Dema Eceman dît ku Kurd ji kelê derkeftin gotin hevdû bes topan bavêjin

kelê. Kurdan şêrê me pêçênabe vaye teslîm dibin. Xanê Lepzêrîn qesta xîveta Şahî û Xanê Mukrî qesta xîveta Xelîfe kir. Berê Xanê Mukrî gehişte xîveta Xelîfe.

Dema Mukrî çû xîveta Xelîfe, Xelîfe xêrhatin lê kir û cihê rûniştinê nîşê da. Mukrî jî rûnişt û gote Xelîfe "*min bihîstiye ku te şûrekî gelek baş heye*". Xelîfe jî got her çawan be bi xwe Xanê Mukrî esîrê min hisab e. Lewra çû ew şûrê xwe yê gelek baş anî da destê Xanê Mukrî. Xanê Mukrî jî ji vê xişîmiya Xelîfe gelek memnûn bû û Xelîfe û yên di wê xîvetê da hemî kuştin. Dema Xelîfe hatiye kuştin şerî dest pê kir. Xanê Lepzêrîn ji vê çendê gelek aciz bû. Gote Xanê Mukrî "*te bo çi bêyî ku ez şerî dest pê bikim şer kir. Sê xîvet mabûn ez da bigehime xîveta Şahî*". Xanê Mukrî jî got "*xwe ez golikê babê te nînim. Eve heft sale te ez Kela Dimdimî vebestî. Min nekarî xwe û min şer dest pê kir*". Kurdan û Eceman dest bi şerekî dijwar kirin. Lêbelê leşkerê Eceman gelek zêde bû. Kurdan şerekî gelek bi mêranî kirin û zora Eceman birin.

Di vê oxilma şerî da Ebdal Begê kurê Xanê Lepzêrîn ji bîr kiribû ku şûrê xwe ji kavlanî derxe. Hema bi kavlan ve şûrê xwe dadiweşande Eceman û ber ra jî digot "*ne'let babê hostayî şûrê min baş seqa nedaye. Lew hesp û zîn û xudanî nabire*". Dema Xanê Lepzêrîn ev çende dîtî gote kurê xwe "*kurê min şûrê xwe ji kavlanî derxe hîngê dê hesp û zîn û xudanî bibire*". Paşî Ebdal Beg bi halê xwe hesiya û şûrê xwe ji kavlanî derxist. Herdû alî li nav hev keftin û xwîn wekî lehiyê herikî. Eceman tîrek Ebdal Begê kurê Xanê Lepzêrîn dan û ew kuştin. Kuştina kurê wî cerg û dilê Xanê Kurdan sot. Wî û Xanê Mukrî milên xwe dane hev û li nav Eceman keftin. Batinî û ewliya jî hatin harî Kurdan. Ecem gelek tirsiyan çunkî serên wan bi aliyê kesên ne diyar ve (batinî û ewliyan ve) dihate jêkirin. Rev kefte nav leşkerê Eceman. Dema Şahê Ecem jî ev çende dîtî reviya. Di rêka revê da rastî hinek topçiyan hat. Gote topçiyan "*têz û barûtê li deştê reşînin û biteqînin. Nexwe batinî dê me bibirînin*". Topçiyan têz û barût li deştê werkirin û agir berdanê. Meydana şerî bi

carekê wekî topeke agirî lê hat û terr û hişk hemî têkda qeliyan. Bi vî awayî leşkerê li meydanê Kurd û Ecem hemî mirin.

Piştî toz û dûmana li ser deştê vebûy leşkerê Eceman yên sax mayî kom bûn. Hez kirin biçin li nava Kela Dimdim bigerin da bizanin kanê eve keleyek çawan bû hinde salan xwe li ber êrîşan girtî. Dayka Xanê Lepzêrîn dema dît ku şer xelas bû, Kurd hemî hatine kuştin, çû hindav birca tijî têz û barûta kelê tê da. Dema leşkerê Eceman hemî hatin kelê da poleke agirî berda di wê bircê da. Têz û barûd hemî teqiya û Kela Dimdim hemî li ser serê Ecemên hatî kelê da wer bû û hemî mirin.

# 3. TEMAYÊN DESTANA KELA DIMDIM

Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn destaneke netewî ye û qala mêrxasî û qehremaniyê dike. Di vê destanê da serpêhatiya Kurdên Biradostî yên berevaniya serxwebûna mîrgeha xwe û berevaniya xaka xwe li hemberî Dewleta Sefewî dikirin tête kirin. Di vê bizava berevaniya hebûna xwe ya netewî da em rastî gelek hêmanên netewperweriya Kurdî û hemasetê tên. Lewra di destanê da temaya serekî hest û hîsên netewî ne. Tiştê ku Kurdan ji yên din cûda dike yên wekî netew û ayîn (mezheb) di destanê da derdikevin pêş. Kurd di bin serkêşiya Xanê Lepzêrîn de xwe jibo şerekî dijwar amade dikin. Jibo vê çendê jî keleyeke gelek asê û saxlem ava dikin û her pêdiviyeke jibo şerekî domdirêj wekî çek û teqemenî, xwarin û vexwarin, şervan û leşker kom dikin. Di dema amadekariyan da hindî ji wan têt dijminên xwe bi vê çendê nahesînin. Piştî qedandina amadekariyan dest bi şerekî dijwar û domdirêj dikin. Dema şerî da her cûre cesaret, fedakarî û mêrxasiyê nişan didin. Jinên Kurd jibo kû bi saxî nekevin di destê dijminan da xwe dikujin. Serpêhatiya têkoşîn û bizava Kurdên berxwedêr û têkçûna bizava wan karîgeriyeke gelek mezin li ser civaka Kurd hêlaye. Lewra ev bûyer wekî destaneke netewî ji aliyê hozan û dengbêjên Kurd ve wekî destaneke menzûm hatiye çêkirin. Temaya destanê ya giştî qehremaniya berxwedana Kurdên Biradostî ya li hemberî Dewleta Sefewiyan e. Lêbelê em dikarin gelek temayên cûda cûda ji vê destanê derxin.

## 3. 1. KURDÎNÎ Û WELATPARÊZÎ

Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn girîngtirîn destana netewî ya Kurdan e. Kurdînî û welatparêzî di destanê da cihekî girîng digirin. Di destanê da Xanê Lepzêrîn wekî "*Xanê Kurdan, Mîrê Kurmanciyê û Kurdistanê*" tête binavkirin. Di destpêka destanê da wesa tête ragehandin ku "*Xan dê bît Mîrê Kurmanciyê*". Hemî tevger û bizavên Xanê Lepzêrîn li vê çarçovê dizivirin. Jibo pêkhatina vê daxwazê gencîneya hatî dîtin tête serf kirin. Hêj di dema avakirina Kela Dimdimî da armanca

avakirinê tête diyarkirin. Di bendên avakirina kelê da mebesta avakirina kelê wiha tête gotin:

*“Pênsed mirc in pênsed tevir*
*Toz ber esmanan bû ‘evir*
*Dê têkel bin Kurd û gewir*

*Pênsed mirc in pênsed lihaz*
*Ser Dimdimî bû gazegaz*
*Dê têkel bin Kurd û beraz*

*Pênsed mirc in pênsed mahol*
*Ser Dimdimî bû golegol*
*Dê têkel bin Kurd û Moxol*

*Pênsed mirc in pênsed bêrik*
*Ser Dimdimî bû nirkenirk*
*Dê têkel bin Kurmanc û Tirk*

*Pênsed mirc in pênsed kuling*
*Ser Dimdimî bû ringering*
*Dê têkel bin şêr û piling”*

Herwekî ji van bendan diyar dibe Kurd dê digel kesên ku wekî gewir (gawir), Moxol û Tirk têne nasandin şerekî bikin. Em têdigehin ku hêj di serî da Xanê Lepzêrîn berheviya şerekî giran dike. Wekî tête zanîn her çend Dewleta Sefewî wekî dewletek e Îranî bête zanîn jî Sefewî dewleteke Tirk bû. Hêzên Kela Dimdim dorpêç kirî hemî ji ‘eşîret û hozên Tirkan yên Qizilbaş pêk dihat.

Bi avabûna Kela Dimdimî ve Kurd şa bûne lêbelê rêveberên Dewleta Sefewî bi vê çendê gelek aciz bûne. Di destanê da ev çende wiha têtê gotin:

*"Gava Dimdim xilas bûye*
*Xwelî serê Şahê Ûrmiyê*
*Heft salan sere xwe girêdet poşya nîhariyê*
*Xanek rabû j'Kirmanciyê"*

Herwekî ji vê bendê xuya dibe avakirina bingehekî xurt jibo berevanî û êrîşan xof û tirs êxistiye dilê Sefewiyan. Jiber vê çendê Xelîfe diçe cem Şahî xeteriya Kurdan û Xanê Lepzêrîn jibo dewletê vedibêje. Xelîfe di van vegotininên xwe da gazinan ji Şahî dike û dibêje: "*çi Xan e te li Kurdistanê rakirî. De'wa wî doşeka te (textê te) ye. Dijminê dînê me ye*". Mirov têdigehe ku serdestiya Xanê Lepzêrîn wekî metirsiyek mezin e. Çunkî Xanê Kurdan doza textê Şahî dike û dijminahiya dînê (mezhebê) wan dike. Di vê derê da aîdiyeta etnîkî û dînî wekî du jêderên cudaker derdikevin pêşiya me. Jiber van aîdiyetan Kurdan doza serxwebûna xwe dikirin.

Dema Xelîfe, Kela Dimdimî dorpêç dike dibêje Xanê Lepzêrîn: "*Xanê re'yetê (bê desthelatdar û jêrdest), tancê dewletê (desthelatdariya dewletê) qebûl bike*". Sefewî dixwazin desthelatdariya Xanê Kurdan ji meydanê rakin û wan bikin bindestên xwe. Xanê Lepzêrîn jibo bênavnekirina Kurmanciyê (Kurdîniyê) evî tancî qebûl nake. Tanc sembola şehînşahî û desthelatdariyê ye. Qebûlnekirina tancî ve Xan, desthelatdariya Sefewiyan red dike.

Dema Şahê Îranê hêzên xwe amade dike hemî xanên 'Ecematê (Îranê) gazî dike. Di destanê da navên gelek ji van xanan derbas dibe. Dema ev xane hemî tên jî her yek di berê xwe ve dijminiya xwe li hemberî Kurdan û Xanê Lepzêrîn diyar dike. Li hemberî vê çendê Xanê Lepzêrîn gazî û hewara xwe jibo mîrên Kurdan wekî mîrê Bahdînan, Hekarê, Serhedê, Botan û hwd. dibe. Ji bilî Kurdan harîkariyê ji Paşayê

Romê (Osmaniyan) dixwaze. Lêbelê çi harîkarî jibo Xanê Kurdan nahêt. Ji vê çendê diyar dibe ku Xanê Kurdan tifaqiya Kurdan dixwaze û jibo pêkhatina vê çendê jî nameyan jê ra dişine. Jibo xuyakirina aliyan eve tiştekî girîng e. Dema ku nehatina harîkariya mîrên Kurdan diyar dibe Xanê Lepzêrîn gelek aciz dibe û dibêje: "*çima nahên şerê Kurdistanê*".

Dema dorpêç li ser Xanê Lepzêrîn stûr bûyî û çi hewar jibo nehatî, ew tenezzulî teslîmbûn û serşoriyê nake. Dayîka wî jê ra dibêje:

*"Herê Xano berxê dayê*
*Dest bide şîrî here xezayê*
*Bike tarîx li dinyayê"*

Li ser van gotinan Xanê Lepzêrîn heta dawiyê biryara berxwedanê dide. Ji van gotinan xuya dibe ku Xanê Lepzêrîn naxwaze Kurdan û Kurdîniyê lekedar bike. Jibo ku têkoşîn û bizava wî di dîrokê da jibo Kurdan nav û namûseke mezin çêke dixebite. Em dikarîn vê helwestê wekî helwesteke netewî binirxînin.

3. 2. DILSOZÎ Û XIYANET

Di hemî destanên mêrxasî û qehremaniyê da du alî hene. Aliyek qenciyê û aliyek jî xirabiyê temsil dike. Lehengên qenc û baş berdewamî li ser esasên exlaqî û camêriyê bizavê dikin. Li hemberî wan, kesên ne girêdayî pîvanên exlaqê hene. Ev herdu tîpolojî şerê hevdû dikin. Di Destana Kela Dimdim da jî ev herdu alî hene û bi xwe destan qala hevrikiya wan dike.

Xanê Lepzêrîn hemberî hevalên xwe gelek dilsoz e. Vê dilsoziyê em di malbat û hevalên Xanê Lepzêrîn da jî dibinin. Dema Sefewiyan dorpêça li ser Kela Dimdimî stûr kirî Ebdal begê kurê Xanê Lepzêrîn dibêje babê xwe: "*ma tu mêr î, xelk her jin in. Pênsed xîvet xema min in*". Di vê gotinê da kurê Xanî dilsoziya xwe

jibo babê xwe diyar dike. Dîsa dema Xanê Lepzêrîn, Qeroyê Bêdkarî wekî qasid jibo Şahî şandî; Şah dixwaze ku Qero serekaniya avê jibo wan bibêje. Lêbelê Qero wiha bersiva Şahî dide:

*“Hun çi nihe min d’kujin*
*An min d’kujin danê evarî*
*Min kerker b’ken ber xizarî*
*Min bavêjne ber mişarî*
*Nabim qatilê çend hizarî"*

Wekî ji bersiva Qero diyar dibe ew gelek dilsoz û girêdayî milletê xwe ye. Ji teklîfa xiyanetê jî aciz dibe û dibêje heke hun min bikujin an jî îşkence bikin dîsa ez bêbextî û xiyanetê kesên li kelê nakim. Li hemberî vê helwesta Qeroyê Bêdkarî, Mehmûdkê Alekanî xiyanetê li Kurdên kelê dike. Mehmûd di destanê da sembola xiyanetê ye. Kela Dimdim jiber xiyaneta wî dikeve destê Sefewiyan. Lewra ku ew cihê serekaniya kelê nîşa Sefewiyan dide û Sefewî jî avê li ser kelê dibirin. Kurdên kelê jiber bêaviyê gelek tengav dibin. Mehmûd cezayê xiyaneta xwe di destanê da werdigire. Çunkî doza bûka Xanî, keça Şahî dike û Şah jî ji vê çendê aciz dibe. Şah dibêje Mehmûd: “*ew weca (feydê) te ji Xanê Kurdan girtî dê ji min jî bigirî*”. Yanî tu kêrî Xanê xwe nehatî dê çawan kêrî min bêy. Mehmûdî serûser dikin devê topê da û berdidin bircên kelê. Li hemberî bêbextiya Mehmûd, hevalên Xanê Lepzêrîn gelek şaş dibin û dibêjin: “*Xano, me rû nema li cîhanê. Çawan xulam baxwoyê xwe jiber xwe bidet kuştinê*”.

Xanê Lepzêrîn gelek girêdayî hevalên xwe bû. Dema jibo şerê dawiyê dixwazin ji kelê derkevin Xanê Lepzêrîn dibêje çend qursên zêr û zînetan li kelê hebin hemiyan bînin bihelînin û bikin şûr û aletên herbê. Vî karî wekî “*kerimandina lawikan*” bi nav dike. Mela û feqeyên di Kela Dimdimî da amade, xwe ji şerê man û

nemanê nadin paş, dilsoziya xwe li hemberî ehlê kelê xuya dikin û dibêjin: “ *ser gorî Xanê Kurdan e. Nê evro roja mêran e*”.

Di destanê da numûneya dilsoziyê ya herî mezin dilsoziya jinên (sitiyên) kelê ye. Wextê têkçûna Kurdan êdî xuya dibe ew teslîmbûna bi Sefewiyan red dikin. Dewsa teslîmbûnê ew biryara xwekuştinê didin. Di destanê da tabloyên herî dilsoj û diltezîng di dema taswîrkirina helwesta sitiyan da derdikeve pêş. Sitî dibêjin: “*paş xanan maldarî nabît*”. Hinek bi vexwarina jahrê hinek jî mendalên (dergûşên) xwe bi xwe ve girêdidin û xwe ji birc û dîwarên kelê da berdidin xwarê.

Di navbera Xanê Lepzêrîn û Xanê Mukrî da dilsoziyeke gelek balkêş heye. Herdu di heman demê da destebirayên hevdu ne. Ji hevdu ra ehd û Peyman didin ku piştî hevdu dinyadariyê nekin. Dema jinên kelê xwe dikujin Xanê Mukrî jina xwe û kurê xwe yê biçûk li hespekî siwar dike tîne eywana kela Dimdim. Dema Xanê Lepzêrîn vê çendê dibine jê ra dibêje: “*wesa diyar e dema bibe şer tu dê birevî*”. Xanê Mukrî li hemberî van gotinan aciz dibe, şûrê xwe dikêşe jina xwe û kurê xwe dikuje û dibêje: “*min heram bin mal û jin e. Dê xwe digel te bidim kuştinê*”.

Dema koma leşkerê Dimdim ji kelê têne xwarê Xanê Lepzêrîn dike gazî û dibêje: “*her kî nexwaze tevlî şerî bibe bila ji kelê dernekeve*”. Li hemberî vê gotinê leşkerê Xanê Kurdan pêkve dikin qêrî û dibêjin: “*Xano ma em golikên babê te bûn? Eve heft sal e em benda vê rojê ne. Çawan tu vê teklîfê li me dikey*”? Bi vî awayî dilsoziya xwe jibo Xanê xwe eşkera dikin. Di gelek cihên destanê da dilsoziya leşkerê Xanî xuya dibe. Wextê ji kelê derdikevin Xan dibêje leşkerê xwe: “*li nav xîvetên Sefewiyan belav bibin. Serê sibê bi dengê min rabin û jibo xezayê canfîda bin*”. Di dema şerî da jî Xanê Lepzêrîn dilsoziya xwe jibo leşkerê xwe xuya dike. Dema şivanek di şerî da gelek bi mêrxasî şer dike Xan jê ra dibêje:

*“Hey şivane hey şivane*

*Ez bim qurbana destane*

*Nizanim carek dî ez nebim xane*

*Dê te Ûrmiyê keme sultane*

*Deme te dewr û meaşane"*

Bi vî awayî şivanê mêrxas taltîf dike. Numûneyeke herî balkêş jibo dilsoziyê, dayika Xanê Lepzêrîn Le'lîxan e. Dema Xanê Lepzêrîn tête kuştin û Kela Dimdim dikeve di destê Sefewiyan da wiha dibêje: " *hey Dimdim! Bila xwelî li serê te be. Piştî Xanan bo kesê nebe*". Paşî pola agirî berdide li nava têz û barûtê û Kelê heldiweşîne, nahêle piştî Xanan kele bo Sefewiyan bimîne.

## 3. 3. DÎN Û BAWERÎ

Di Destana kela Dimdim da du diyardeyên serekî hene: Kurd û Kurdînî; dîn û mezheb. Ev herdu diyarde du hêmanên serekî ne yên aîdiyeta Kurdan nîşa me didin. Dema em li destanê dinêrin serdestiya van herdu diyardeyan baş dibînin. Di destanê da Xanê Lepzêrîn wekî ewliyayekî tête nasandin. Dema destê wî tête birîn, Şah destekî zêrîn çêdike. Xanê Lepzêrîn duayê dike û ruh dikeve destê wî yê zêrîn. Destê wî ji berê çêtir dibe. Di taswîrên geryana Xanî û Şahî dema diçin cem şivanekî rûdinin û Şah di xewnê da, Xan jî bi hişyarî gencînê dibine gelek temayên dînî têne bikaranîn. Ji aliyê hêzeke îlahî ve cihê gencînê jibo Xanê Lepzêrîn tête diyarkirin. Piştî Xanê Lepzêrîn gencînê derdixe nizane kanê dê wê gencînê çawan serf bike. Dîsa ji aliyê hêza îlahî ve çawan karanîna gencînê jibo Xanî tête gotin. Xan di xewna xwe da Şêx Ebdulqadirê Geylanî dibine û Geylanî jê ra dibêje: "*tancê 'Eceman (desthelatdariya Sefewiyan) kêrî te nayê. Divêt tu karê xwe bikey û li hemberî wan xezayê bikey*". Dema Xan ji xewê radibe vê xewnê wekî îşareteke îlahî dihesibîne û biryara şerî dide.

Di destanê da şerê Kurdan yê li hemberî Sefewiyan wekî “*Xeza*” tête binavkirin. Di gelek bendan da jibo Sefewiyan “*gewir, kafir, kûffar*” tête bikaranîn. Birastî Sefewî Musliman bûn û mezhebê wan Şi’î bû. Lêbelê cudahiya mezhebi wekî diyardeyekî pêknekirina Kurd û ‘Eceman derdikeve pêş. Ev cudahî hinek caran hind xurt dibe ku di beytê da ‘Ecem wekî “*dijminê dînê Pêximberî*” têne nasandin. Dema Xanê Mukrî diçe di bin xîveta Xelîfe, teklîfa şehdeanînê jê ra dike. Wesa xuya dike ku Xelîfe wekî Musliman nabîne. Herwesa Xelîfe jî dema nekamiya Xanê Lepzêrîn li cem Şahî dike, Xanî wekî dijminê dînê Şahî gunehbar dike. Dema ji Xanî tête xwestin ku tancê Şahî qebûl bike Xan dibêje:

*“Wey kafiro bê usûl e*
*Xweş nahêt Xudê w Resûle*
*Tancê te nakem qebûle”*

Di vê derê da Xanê Lepzêrîn bi egerên dînî ve serdestî û desthelatdariya Sefewî red dike. Di destanê da dema derkeftina Xanê Kurdan û leşkerê wî ji kelê wiha tête taswîrkirin: “*cewşenek zêrîn li ber e û hezar hezar selawatan didin ruha Hz. Muhemmed (s.x.l*)”.

Di destanê da mirov têdigehe ku Kurdên di kelê da wekî dîndar xuya dikin. Çunkî mela û feqî di kelê da hene û karên ayînî pêk tînin. Dema Xan dibêje “*hemî şolên me bi kitêb in*” meqsed jê ew e ku di revebirin û karûbarên navxweyî da pêgirî bi pîvanên Îslamê tête kirin. Xanê Lepzêrîn dema dixwaze destnivêja nivêja sibê bigire pêdihese ku av li ser kelê hatiye birîn. Em têdigehin ku Xan û leşkerê xwe nivêjker û dîndar bûn. Wê demê gelek tengav dibin û dest bi duayan dikin. Di duayên jibo barîna baranê têne kirin da, aliyê Xanê Lepzêrîn yê ku wekî ewliyayekî tête taswîrkirin derdikeve pêş. Piştî duaya Xanî, her çend demsala baranan nebejî ku di destanê da di navbera Tîrmeh û Tebaxê da ev bûyere diqewime, daxwaza Xanî ji

aliyê Xudê ve hatiye qebûlkirin û baranek xurt hatiye. Di bendên qala vê çendê dikin da dema Xan lavahiya Xudê dike jibo baranê taswîrên gelek xurt hene.

Wekî me li jorê behskirî di destanê da Xanê Lepzêrîn wekî ewliyayekî û kesekê pîroz tête nişandan. Gelek keramet li ser destê wî eşkera dibin. Dema dixwaze nameyan jibo mîrên Kurdan bişîne, nameyan diavêje li ber bayê rehmê û ew ba van nameyan digehîne mîran. Dîsa dema hêza Kurdan gelek kêm dibe dayika wî jê ra dibêje. “*kes hewara te nahêt îlla “batinî (ewliya)” bêne hewara te*”. Ew jî duayê dike û ewliya û batinîyên Kurdistanê bi rengê kotiran (kevokan) difirin, tên, xwe didanin li ser bircên kelê. Xanê Lepzêrîn bi hatina batiniyan ve gelek keyfxweş dibe. Ev batinî wekî hêzeke xurt morala Kurdan bilind dikin. Di dema şerî da Sefewî van batiniyan nabînin. Lêbelê pêdihesin ku hêzên nediyar hatine harîkariya Xanê Lepzêrîn. Lewra batiniyan serê Sefewiyan difirand û wan kes nedidît. Ev çende destanê da wiha tête gotin:

*“Binêrin koma xanane*
*Dengê selawatan esmane*
*Şerê xazî batinyan e*
*Ser d’firin qalib cih mane”*

Xof û tirs kefte dilê Sefewiyan. Dema Şahê ‘Ecem vê çendê dihese emir dide topçiyan ku barûtê li deştê werînin û biteqînin. Çunkî bi ya Şahî batinî hatine harîkariya Kurdan û hemberên batiniyan li nav Sefewiyan nînin.

3. 4. JIN

Di destanê de bi giştî jinê û taybetî jî dayika Xanê Lepzêrîn Le’lîxanê roleke berbiçav heye. Dayika Xanî wesa diyar e ku jineke gelek aqil û têgehiştî ye. Her gaveke Xan tengav dibe û nizane kanê çi biryarê bide, pena xwe dibe ber dayika

xwe, pirsa xwe ji dayika xwe dike û bi dayika xwe dişêwire. Dayika wî wekî rêber û murşîdekî rê nîşa kurê xwe dide. Ev çende di gelek bendên destanê da ber çavên me dikeve. Cara pêşiyê dayika wî ji kurê xwe ra dibêje: "*me xulamî nevêt. Here cem Şahî û hindî çermê gayî erdî jê bixwaze*". Xanê Lepzêrîn jî li ser vê gotina dayika xwe diçe cem Şahî û hindî çermê gayî erdî jê dixwaze. Di her tengaviyê da Xanê Lepzêrîn xwe diavêje hembêza dayika xwe. Dema ava kelê tête birin û Kurd bê çare dimînin Xan têt cem dayika xwe û êş û xema dilê xwe jê ra dibêje. Dixwaze ku dayika wî ray û tedbîrekê nîşa kurê xwe bide. Dîsa dema Xan hewarê ji mîrên Kurdan dixwaze û çi hewar jibo nahêt, xwe dispêre hembêza dayika xwe û dibêje: "*dayê! teybîr û rayekê li me bike. Kes bi hewara me nahêt*". Hîngê dayika wî jê ra dibêje:

*"Herê dawo kaxez şîn in*
*Çi gir û nîşan tê nînin*
*Hewara te batinî nin"*

Wekî diyar dayika wî ji kurê xwe ra dibêje êdî hewara te Xudê ye. Xan jî duayê dike ewliya têne hewara Xanê Lepzêrîn. Di dijwariya şerî û dorpêça kelê da dema Xanê Lepzêrîn tengav dibe û hêdî hêdî hêviya xwe wenda dike dayika wî moralê dide kurê û hêviya wî xurt dike. Dema çi rê jî neminin mêrxasî û qehremaniyê salixî kurê xwe dike. Wextê Xanê Lepzêrîn jibo şerê man û nemanê karê xwe dike û dixwaze ji kelê derkeve dayika wî jê ra dibêje:

*"Xano kurê dêleşêrê*
*Dest b'de şîrî here gêrê*
*Xudê berxê nêr da bo kêrê"*

Xanê Lepzêrîn hemberî vê gotinê dibêje:

*“Nehavêje hişketane*

*Dê dest avêjim çekane*

*Tine dê b’çime meydane”*

Dayika Xanê Lepzêrîn dîsa kurê xwe şîret dike û jê ra dibêje:

*“Hey Xano kurê Momê*

*Bes bikêşe evê domê*

*Dest b’de şîrî here komê*

*Heke newêrî ez wê çûmê*

*Da nav biçît Erzerome*

*Hey Xano sere hîviyê*

*Tu nekêşe rezîliyê*

*Dest b’de şîrî here zeviyê*

*Heke newêrî b’de sitiyê*

*Da nav biçît Kurmanciyê*

*Hey Xano sere dewletê*

*Tu nekêşe rezalete*

*Dest b’de şîrî here dawetê*

*Heke newêrî bide metê*

*Da nav biçît nav hukmetê*

*Tu Xanî Xanê Kurdan î*

*Melevanê bin behran î*

*Delîletêd şolan d’zanî*

*Herê Xano berxê dayê*

*Dest b'de şîrî here xezayê*

*Bike tarîx li dinyayê"*

Bi vî awayî em têdigehin ku dayika Xanê Lepzêrîn jineke gelek zana û aqilmend e. Çunkî ew dizane ku berxwedana kurê wê dê bikeve li ser zar û zimanê milletekî û ev mêrxasî heta heta dê bête vegotin. Lewra giringiya bûyerê li kurê xwe dihesîne û jê dixweze ku bê tirs bila şerê xwe û berevaniya xwe bike. Ev gotinên Le'lîxanê motîvasyona Xanê Lepzêrîn gelek bilind dike.

Ev helwesta Le'lîxanê ya xweragir em li jinên din jî dibinin. Dema êdî diyar dibe ku kele dê bikeve Xanê Lepzêrîn jinan hemiyan kom dike û ji wan ra dibêje: "*min hun hemî destûr dane. Hun êdî dikarin teslîm bibin*". Lê hemberî vê çendê jin di serkêşiya jina Xanî da kom dibin û biryarê distînin ku bi çi awayî ew xwe teslîmî Sefewiyan nakin. Ji bilî bûka Xanê Lepzêrîn, Xan Perî hemî xwe dikujin. Bûka Xanî ducanî ye û dibêje: "*hemlê min yê kuran e. Kur dê heyfa baban hilînin*". Lewra Xan jî ruxsetê didê ku biçe mala babê xwe. Di destanê da xwekuştina jin û zarokên sava wekî trajediyeke gelek dijwar hatiye taswîrkirin.

*"Wan, mendal xwe ve şidandin*

*Xwe hewalan da firandin*

*Cergê van Xanan kirandin"*

Wekî di vê bendê da diyar dibe xwekuştina jinan bûyereke gelek dilsoj û dilşewat e.

Dayika Xanê Lepzêrîn di dawiya destanê da jî roleke berbiçav heye. Dema Kurd hemî têne kuştin dilê wê pê qayîl nabe ku Kela Dimdim jibo Sefewiyan bimîne.

Lewra dema leşkerê ‘Ecem hemî têne kelê da pola agirî ber dide li nav cebilxanê û kelê diruxîne.

## 3. 5. RAY Û TEDBÎR

Xanê Lepzêrîn mîrekî Kurd e. Xudan mîrgeh, rêveberî, kele- bajar û leşkerî ye. Bi kurtî deverek di destê wî da ye û ew bi xwe jî rêveberê wê deverê ye. Berxwedana Xanê Lepzêrîn armancek heye û ev armanc di destanê da hatiye destnîşankirin:

*“Xan d’bêjît pênsed palane*
*Ez bim qurbana destane*
*Qahîm danin van koçkane*
*Da xwe bigrin ber topane*
*Dê bim cîhangîrê cîhane*
*Dê bim dijminê şahane”*

Herwekî di vê bendê da xuya dike Xan, dixwaze bibe cîhangîrê cîhanê û jibo pêkhatina vê çendê jî divêt şerê Şahê Îranê bike. Jibo pêkhatina vê armancê Xanê Lepzêrîn di seranserê destanê da gelek bi ray û tedbir tevdigere. Her biryarekê baş dikêşe, dipîve paşî dide. Karê xwe nahêle hêviya şansî, li dû pilan û bernameyekê hereket dike. Em di destanê da rastî pêngav pêngav bicihanîna vê bernamê tên.

Her ji dema Xanê Lepzêrîn û Şahê Îranê bûye nasyarên hev, Xan wesa tevgeriyaye ku bawerî û piştrastiya Şahî bi dest biêxe. Bi cesaret û dilsoziya xwe ve dostîniya Şahî bi dest êxistiye heta ku Şahî destekî zêrîn jibo çêkiriye û ruxset dayê ku jibo xwe keleyekê ava bike. Bi feraseteke mezin cihê gencînê ji Şahî veşartiye û kariye vê define biparêze. Dema melayek dixwaze bi pêhesandina Şahî ve Xanî bitirsîne û pilanên Xanî têk bibe, Xan bi awayekî hişyar karî wî melayî berteref bike. Gencîneya peyda kirî jibo mesrefa şerekî domdirêj wekî bingehê aborî bi kar tîne.

Diçe cem Şahî û bi uslûbeke nerm erdî jê dixwaze. Bi vî awayî Şahî razî dike. Hindî çermê gayî erdî jê dixwaze. Lêbelê vî çermî dike ben û bi qasî ev bene erdî digire kela xwe li ser ava dike. Di vê navberê da jestan bi Şahî dike da ku wî ji pilana xwe pê nehesîne.

Di dema avakirina kelê da ew bi xwe wekî hostayekî li ser pale û hosteyan radiweste. Pilana kelê didane. Jibo ku kele gelek asê û mukim were çêkirin xwe ji çi mesrefê nade paş. Bertîl û şabaşan li ser pale û hostayên xwe belav dike, dilê wan xweş dike. Dema ku ava kelê bi rêya solînan tîne kelê û vedişêre û paşî xîm û binyadê kelê diqedîne û vedişêre pale û hostayên xwe ji bilî Mehmûdî hemiyan dikuje da ku sibê van erdan nîşa Şahî nedin. Kuştina van kesan bi hostayî vedişêre û hinek hostayên din tîne û kelê pê temam dike. Piştî qedandina kelê diçe hinek topan tîne û saxlemiya kela xwe diceribîne. Piştî ceribandinê dibine ku kela wî gelek qahîm çêbûye. Piştî hîngê bi kela xwe qayîl dibe û dilê wî rahet dibe.

Bi vê çendê ve ranaweste. Jibo şerekî giran leşker, çek, erzaq pêdivî ye. Xan, jibo dabînkirina van pêdiviyan tevdigere û li nava Kurdan kesên mêrxas kom dike, ambarên kelê bi xwarin û erzaqî ve pir dike û ciqsî û sindanan tîne û çek û teqemeniyan amade dike. Heta ku van amadekariyên xwe hemiyan neqedîne, peywendiyên xwe digel Sefewiyan xerab nake. Bi vî awayî ji nekamiyên Xelîfe dikare xwe biparêze û dostîniya xwe û Şahî didomîne. Piştî şer dest pê dike Şah van amadekariyên Xanî ji nû pê dihese. Dema pêş Kela Dimdim dikeve wiha dibêje:

*"Deşta Hozanê serkeftiye*
*Şah pêş kelatê keftiye*
*Wê kenî û girnîjiye*

*Wey le Xanê nanbiryayî*

*Xweş amar e te deynayî*

*Pîroz bît xudan jê mayî”*

Xanê Lepzêrîn bi ray û tedbîrbûna xwe di dema şerî da jî didomîne. Moral û motivasyona leşkerê xwe bilind dike. Dema hêzên Sefewî dora kelê girtî û xîvet û çadirên xwe vedayî, sam dikeve dilê kurê wî Ebdal Begê. Xanê Lepzêrîn kurê xwe teselli dike û dile dilê wî dide, dibêje: “*netirse! Ev ‘Eceme gelek hîleker in. Çadir û xîvetan vala digirin da ku em bitirsin*”. Dema şer dest pê dike bi fend û fêlan ve dixwaze motivasyona dijminî bişkêne. Bo numûne wextê xwarina kelê kêm dibe ew, ji şîrê dêlê mastî çêdike û jibo Şahî dihinêre. Ew dixwaze dijminî pê bihesîne ku standina kelê ne mumkîn e. Çunkî kele ji aliyê xwarin û vexwarinê ve têr û tijî ye.

Di heman demê da Xanê Lepzêrîn jibo xurtkirina hêza berevaniya leşkerê xwe her daîm tevdigere û morala wan bilind dike. Leşkerê xwe bi tertîba nîzamî rêkûpêk dike. Berî xurûca ji kelê leşkerê xwe kom dike û bernama xwe ya leşkeri jibo wan eşkera dike. Ji leşkerê xwe dixwaze ku herkes li dû vê pilanê bizavê bike.

### 3. 6. XÎRET Û HEMASET

Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn ji serî heta binî destana xîreta Kurdîniyê û hemasetê ye. Qala mêrxasî, egîdî, fedakarî û cesaretê dike. Hêj di destpêka destanê da dide xuyakirin ku di vê serhatî û destanê da dê behsê xîreta Xanê Lepzêrîn bête kirin:

*“Qeseta Xanê zerîndest e*

*Kemera xîretê beste*

*Xelkê xweşmêr dane deste*

*Xelkê xweşmêr dane vê ra*

*Wê d'bestin kemerên zêra*

*Navûdeng dinyayê gêra”*

Ji van gotinan em têdigehin ku Xanê Lepzêrîn kemera xîret û namûsê girêdaye û kesên mêrxas jî li dora wî kom bûne. Dema Mela Mehmûdê Bazîdî jî behsê vê destanê dike dibeje ku ekserê Kurdan jibo Xanê Kurdan heyfê dixwin, digirîn û duayan dikin. Dema mirov guhdariya destanê dike hîsên mirovî yên netewî radibin li ser piyan. Ji taswîrên şerî yên zindî perê (baskê) dilê mirovî direqise. Gelek caran Kurdan berî şerkirinê jibo ku manewiyata xwe bilind bikin ev destane jibo leşkerê xwe didan xwendin. Kesên guhdariya vê destanê dikirin ji tirs û xofê vala dibûn.

Di destanê da em gelek erdan rastî numûneyên xîretê tên. Dema Şah tanê diavêje Xanê Kurdan û wî han dide ku biçe şerê şêrî bike dibêje: “*xweşmêrê Kurdan Xano! Kanê mêraniya te çawan e?*” Ev gotina Şahî pê li xîreta Xanî dike. Lewra Xan diçe şerê şêrî û şêrî dîl digire û jibo Şahî tîne. Em vê derê rastî hemasetê jî tên. Dema Xan, şêrî tîne navyanan li xwe dide û pesnê xwe dide. Herwesa dayika Xanî di xîretkêşiyê da rêberiya kurê xwe dike. Cara pêşiyê ew dibêje. “*me ev xulamî nevêt*” û kurê xwe han dide ku êdî serxwebûna xwe ragehîne. Dîsa dema Şah tancê xwe dişîne cem Xanî jibo qebûlkirinê, xîreta Xanî ya netewî û dînî vê çendê qebûl nake û dibêje: “ *ji Xudê û Resûl (s.xl.) xweş nahêt lewra ez tancê te qebûl nakim*”.

Berxwedana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn di destanê da bi taswîrên zindî û hemaseteke bi rewanbêjî û hunerên edebî ve hatî xemilandin, tête vegotin. Dema mirov guhdariya destanê dike, mirov wesa hîs dike ku di nava şerî da ye. Taswîr û vegotin ew çend zindî û bi coş in, guhdar tameke gelek xweş ji guhdariyê distîne. Hindî destan ber bi dawiyê ve diçe tabloyên dilsoj û hestvejîn zêde dibin. Wesa lê têt

ku êdî guhdar hîrêna hespan, girêna topan, sîrêna şîran, xîsêna xenceran û heytheyta mêrxasan dibihîze. Em dikarin vê bendê wekî numûne jibo vê çendê bidin:

*“Topêd mezin giregir e*
*Bircêd belek xirexir e*
*Rewda şêran nirenir e*
*Rondkêd sitiyan guregur e*
*Fermana ser bab û kur e*
*Xan mîr e, Ebdal Beg kur e*

*Ordiyan bûye girrêne*
*Misriyan bûye sîrêne*
*Wan lawan keft qirîpêne*
*Wan hespan bûye hîrêne*
*Her sed ji wan bi yekê ne”*

# 4. METNÊ DESTANÊ

## 4. 1. BEŞA YEKEM

Xulimîne xulimîne
Gelî xelk û alemîne
Guh biden dil û yeqîne
Qeseta Xanê Lepzerîn e

Qeseta Xanê zerîndest e
Kemera xîretê beste
Xelkê xweşmêr dane deste

Xelkê xweşmêr dane vê ra
Wê d'bestin kemerêd zêra
Navûdeng dinyayê gêra

Xanek rabû Hizarcotî
Kirt û malê xwe firotî
Xwe d'gel Şahê Ecem gotî

Xanek Hizarcotê rabû
Heft salan dinê geryabû
Wê l'nik Şahî vehewyabû

Xan, ebdal e li beriyê
D'gerît nanê xulamiyê
Dê bît mîrê Kurmanciyê

Wêy le Xanê çend û mendan
D’gerît malêd dewlemendan
Ka qîmeta nanî b'çendan

Wêy le Xanê nanbiryayî
Wê l'çend welatan geryayî
Heft sal bû xulamê Şayî

Heft salan bûye gavane
Sala heştê danişt male
Bin xîvet û çadirane
Anferim Xanê Kurdane

---

Rojêke ji van rojan e
Xan û Şahê Îsfehan e
Herdukan kire dîwane
B’çîne rav u nêçîrane

Xan û Şahî wê d'çûyîne
Nav deştê da xwarkeftîne
Rav û nêçîran gerîne
Qedereke zor çûyîne
Ev kafir cema bûyîne
Got: “şêrek keftî bîşane”

Şahî got:

“Hay xweşmêrê Kurdan Xan e

Ka mêranya te çawan e”

Xanî dabû sifke tane

Kerbêd Xanî zor vebûne

Kerbêd Xanî zor vebûye

Qesta bîşî wê meşiye

Ebdal Begê dabû dû ye

Şêrek bin bîşî niriye

Nirên ji şêrî hatiye

Xanê Sor çû şerê wî ye

Binê bîşî sekiniye

Şêrê mezin derkeftiye

Xan li wî şêrî xuriye

Şahê Ecem zor tirsiye

Şêr ser Xanî da hatiye

Deste rastê da deviye

Şêrî destê wî xwariye

Destê çepê şêr girtiye

Ebdal Beg lê siwar kiriye

Bo Şahî îna diyariye

Gazî diketin Şahiye
“Were pêş Xan û şêriye”
Şahî girtin ‘ecêbiye

Şahê Ecem tê d’fukurît
Heybet û ecêba d’girît
Ev çi Xan e şêra d’xurît

Şahî got: “Xano lez ke bilezîne
Zikê şêrî bidirîne
Dilê şêrî bo min bîne”

Şîrek li şêrî dayiye
Sere şêrî jê biriye
Zikê şêrî kelaştiye
Dilê şerî wê xwariye

“Erê Şaho kurê makê
Min dil xwar bo te mêlakê
Tu xwe pê nebe hîlakê”

Şah dibêjît:
“Lez biken bilezînin
Qursêd zêran vecemînin
Ser sindanan b’herişînin
Ber çekûçan tireqînin
Destêk zêr bo Xanî bînin”

Wê lez kir û wê lezando
Qursêd zêran wê helando
Ser sindanan herişando
Ber çekûçan tireqando
Destêk zêr bo Xanî înando

Destek bo Xanî jeniye
Xudê ruh ber da biriye
Cara berê çêtir bûye

---

4. 2. BEŞA DUYEM

Rojek ji nava rojan e
Şahî got: “ hey Xane Xane
Bêhnek b’çîn rav û seyrane
Rav berdeyn Deşta Hozane”

Rojêk ji rojên Xudê ye
Xan û Şah herdû çûyîne
Nava deştê da meşîne
Ser kerek pezî helbûne
Nik şivanî rûniştîne

Şivanî wê lezandiye
Miheke reş bo dotiye
Tijî kodê şîr kiriye
Deyna ber Xan û Şahiye

Bilûrbêj e tembûrvan e
Kîs hejandî ber tilyane
Tembûr êxist ber milane
Bilûr êxist ber lêvane
Anferim Xanê Kurdane

Xewa Şahî wê hatiye
Xanî bilûr bo gotiye
Şahî di ber ra xew çûye
Xanî bilûr betal kirî

Deynabû ser kodê şîrî
Wêkî pirekê çêkirî

Şahî xewna xwe dîtiye
Xanî b' çavêd xwe dîtiye
Tişabetek ‘ecêbiye
Mêşek kepê Şahî derkeftiye
Textena kodê kiriye
Hindava koda şîriye
Nav bilûrê ra çûyiye
Li ser berekî rûniştiye

Mêş ji ser berî rabûye
Ji bilûrê derbaz bûye
Textena Şahî kiriye
Çûye ser lêva Şahiye
Nav difna wî ra çûyiye

Xan dimînît tê d’fukurît
‘Ecêbiyan jê werd’girît
Aql û sewda bo namînît

Şah kenî û girnijiye
Cihê xwe helciniqiye
Xewa şirîn hişyar bûye

Şah ji xewê ciniqiye
Got: “Xano min xewnek diye
Xewin nîne ‘ecêbi ye

Ser behreke spî ra çûme
Pira kun ra derbaz bûme
Ser gencxanekê helbûme

Min dîtî behreke spiye
Pira darîn ser bestiye
Ez xwe ser ra derbaz bûme

Min dît xizînêd zêrîne
Derêd wan qafle kirîne
Senede zor pê birîne
Berê reş da nivîsîne
Rast e derew qet tê nîne

Xane Xane herê Xane
Min xewnek dîtî çavane
Bo min bêje te’bîrane”

Xanî got:
“Xewin nîne ew xeyal e
Xeyala xizîne w mal e
Xewnerojka pûç û betal e

Hindî xewnêd di rojê ne
Şirîn in ji keyfe têne
Lew çi te’bîr bo nehêne

Şahî bêjim te’bîr çi ye?
Xewinrojke te dîtiye
Xewnêd rojê te’bîr niye
Ber Şahî berze kiriye”

Xan û Şahî wê rabûne
Ji zozanê zivirîne
Qesta mala xwe kirîne

Qedereke zor çûyiye
Xan wê paş da ziviriye
Hecetek bo xwe girtiye
"Min gustîra xwe bîr kiriye"

Şahê Ecem d’bêjite Xanî
“Were neçe nezivire
D’deme te gustîrek çêtir e
Her daîm d’gel xwe hilgire”

Xan dibêtê “Şahî xweş bît
Nê hindî gustîra min e
Ser heye navê babê min e
Heta mirnê digel min e”

Xan di rêkê ziviriye

Dol û milkan serkeftiye

Textena mukrê kiriye

Girkê gencê kolayiye

Berek j'kelekê rakiriye

Kulozek jê derkeftiye

Derê kulozê vekiriye

Kaxezek tê da dîtiye

Kaxez ser êk nivîsiye

Xanî kaxez helgirtiye

Paxla çepê heşandiye

Lot ber lotê bişkiftiye

Hat û gehişte Şahiye

Hemî j'Şahî veşartiye

—————————

Xanê Kurdan wê rabûye

Qesta mala xwe kiriye

Melayek mêvanê wî ye

"Hey melayê 'ilimxwîne

Evê kaxezê bixwîne

Ya tê da min tê bigehîne"

Kaxeza xwe înayiye

Destê Mela ra kiriye

Melayî kaxez xwendiye

Ber xwendinê ra keniye
“Gençxanêye te dîtiye
Belê min û te b' nîvî ye”

Mela dibête Xaniye:
“Gençxane li me nîvî ye
Heke dê bêjim Şahiye”

Wallah heq e billah heq e
Çi melayekî ser req e
Bo kuştinê misteheq e
Da xeberêd wî neden şebeqe

Xanê Kurdan wê rabûye
Bi nermî d’gel axiftiye
Heta mela ra gehiştiye
Şîrek serê wî dayiye
Serê mela firandiye

Kendalek wê kolayiye
Mela, nav da veşartiye
Heqê wî da dilê wî ye
Mela heqê xwe razî ye

Çi sibe ye hêşta zû ye
“Eyalê Xanî rabûye
Ka mêvanê şeva dî ye”

“Mêvan mêvanê biyanî

Sibê zû derkeft ji xanî

Nizanim çû kîj mekanî”

---

Şevekê

Hate xewnê Xewsê Bexdayê

“Tancê ‘Ecem kêr te nayê

Rabe dê lê vekeyn xezayê”

4. 3. BEŞA SÊYEM

Dayka Xanê Kurdan d'bête:
"Heke şerm e heke kirêt e
Me ev xulamiye nevête
Dûmahî dê bîn fihête"

Rojêke ji yêd Xudê dayî
Dayka Xanî d'bête Xanî
"Tu rabe here dîwana Şayî
Erdî jê bixwaze hindî çermê gayî"

Rojeke Xudê dayiye
Xan çû dîwana Şahiye
"Xano bêje te j'min çi ye?"

Xanî got:
"Herê Şayî herê Şayî
Bide min erdî temed çermê gayî
Erdê me seyran ser vedayî
Da bikem nijyar û avayî
Da nemînim bê dûmayî

"Herê Xano tu we neke
Çi nijyaran ava neke
Çi qerxeşan tu rast neke
Dilê min û xwe jêk neke"

“Xan nîne mêrkê derwêş e
Dê ava ket kolkê mêşe
Şahê Ecem bête pêşe
Bê qerxeşe û bê arêşe

Xan nîne mêrkê zerbav e
Bide min cihkê pênc gava
Dê kolkekî lê bikem ava”

“Tu Xan nînî tu bira yî
Min da te temet erdê çermê gayî
Cihê me seyran ser vedayî

Min da te erd temet çermê gamêşe
Bo xwe bike kolkê mêşe
Bê qerqeşe û bê arêşe

Çêbû Xano malî ava
Min da te cihkê pênc gava
Înşaallah Şah û Xelîfe bêne silava

Xano hemî şolan destûrdayî
Min da te erd temet çermê gayî
Cihê me seyran ser vedayî
Bike nijyar û avayî
Bê qerqeşe û bê dûmahî

Hindî dinya xweş ava bît

Hindî rih vî qalibî mabît

Dilê min û te jêk nabît”

---

Xanî lotek li xwe dayî

Bezî zevya bin çiyayî

Gamêşek girt erdî dayî

Xano rabû çû zozane

Gayek girtî nav garane

Pê erdî şax li esman e

Ga vekuşt û erdî dayî

Çermê gayî di avê nayî

Heft şev û rojan nenimyayî

Roja heştê wê nimyayî

Qereçek ji beryê înayî

Kêr û gwîzan di nav nayî

Divêl divêl helînayî

Kun derzîkê rakêşayî

Bihust û çerx yê lê dayî

Kir gulolk û berda çiyayî

Girê gencê werînayî

Binyatê Dimdimî lê pîvayî

Gulolkek hinde ji ber mayî
Bizmarek li ser qutayî
Eve jî bo xatra dilê Şayî

Herê Xanê fend û fêl e
Çermê gayî kir divêle
Pê girtin deşt û dol û rêle
Heft kûr û donzde nihêle

Çermê gayî kir niqare
Girtinê teng û hefsare
Pê girtin beroj û nizare

Nêrin Xanî nêrin fêla
Liba zozanê nehêla
Binyatê Dimdimî kola

---

Çi sibe ye çi beyan e
Xan diçîte pêş şahane
Jê d'xwazît destek hostane

Şahî lez kir û lezandî
Panzde hosta vecemandî
Bo Xanê Kurdan wê şandî

Dema Xanî eve dîtiye
Kerbêd wî gelek vebûye
Kîsk û qelûn helgirtiye
Qesta nik Şahî kiriye
Qet silav lê nekiriye
Cihê pêlavan rûniştiye
Çavê Şahî vêkeftiye
“Xêr e Xano ma çi bûye?”

“Şaho ma ez yê duhî û evroke me
Ma çend caran silav keme
Ma kela min ya hindê ye
Panzde pale ava kene”

Şahî got: “Zû biken û bilezînin
Li Ûrmiyê hun gêrînin
Pênsed palan vecemînin
Bila xîmê kelê bo derînin”

Zû kirin û zû lezandin
Pênsed pale vecemandin
Li ser Dimdimî pengandin

Xan dibêjîte hostane:
“B’kolin xîmê heft gavane
Çil gez kûr û heft gez pan e”
Egîd her Xanê Kurdan e

Dimdim îna ber kolanê
Pale û fêris berdanê
Çêdiken cihkê meydanê

Dimdim îna ber bestinê
Pale û fêris verestinê
Çêdiken cihkê mirinê

Dimdim îna ber pêkolê
Pênsed pale lê diken şolê
Çê diken cihkê xeretolê

Dimdim îna ber xwericê
Pênsed pale rojê diçîtê
Çêdiken cihkê sirîcê

Pênsed mirc in pênsed tevir
Toz ber esmanan bû ‘evir
Dê têkel bin Kurd û gewir

Pênsed mirc in pênsed lihaz
Ser Dimdimî bû gazegaz
Dê têkel bin Kurd û beraz

Pênsed mirc in pênsed bêrik
Ser Dimdimî bû nirkenirk
Dê tekel bin Kurmanc û Tirk

Pênsed mirc in pênsed mahol
Ser Dimdimî bû golegol
Dê têkel bin Kurd û Moxol

Pênsed mirc in pênsed mere
Ser Dimdimî toz û ger e
Dê tekel bin Kurd û Tetere

Pênsed mirc in pênsed kuling
Ser Dimdimî bû ringering
Dê têkel bin şêr û piling

Xan d’bêjît pênsed palane:
“Ez bim qurbana destane
Qahîm danin van koçkane
Da xwe bigrin ber topane
Dê bim cîhangîrê cîhane
Dê bim dijminê şahane”

Xan d’bête Hosta Ûmer e:
“Beran bibire bi tebere
Bidem te ber û zêre zer e”

Navê serhosta Ûmer e
Ber birî risas kir sere
Da topêd Şahî neket dere

Xan d'bête Hosta Eliye:
"Ez bim qurbana destiye
Beran bibire bi tevşiye
Bidem te ber û zêrê spiye"

Navê serhosta Eli ye
Ber simt û risas kiriye
Hizra topêd Şahî kiriye

Navê serhosta Ûsman e
Mirce wî li ser milan e
Çi mirce d'danît berane
Yê d'bîte toz û dûmane
Pirtî d'çine ber esmane

Xan d'bête Hosta Ûsman e:
"Tu gera Dimimî dane
Çil gez kûr û heft gez pan e
Da xwe bigrît ber topane
Dê bidem te xelatane"

Çi bere ewî danayî
Ber simt û risas nav nayî
Govendek ser girêdayî

Xan d'bête Hosta Ebas e:
"Beran bibire bi elmase
Dê zêran dem te bi tase"

Navê serhosta Ebas e
Ber birîbû bi elmase
Ber ker kir, tê kir risase

Xan d'bête Hosta Şekire:
"Tu hêsilêd pan bibire
Da xwe ber topan bigire"

Hosta Şekirî çi kire
Wî heçî berê kun kire
Tijî navê risas kire
Ser risasî mifriq kire
Ser mifriqî zêriç kire
Ser zêriçî pîla gire
Da xwe ber topan bigire

Navê serhosta Pirmîs e
Çekûçê wî xîsexîs e
Dê zêran dem te namîs e

Navê serhosta Haşim e
Berî bibire w bisime
Pîla, mifliq, zêrîç, risas xema min e

Serpale Xanê palewan e
Pê xweştir şol d'ken j'destane
Egîd her Xanê Kurdan e

Xanê Kurdan wê çêd'kirin
Ber simtin risas tê d'kirin
Da xwe ber topan bigirin

Çend heyamek wê pê çûne
Berêd palan xilas bûne
Rabe Xano tu nerûne

Xanê Kurdan wê rabûye
Mertal tijî zêr kiriye
Ser palan da reşandiye

Pale çûn serêd çiyane
Birîbûn hêsîlêd pane
Înan bo kela xanane

Pale meşîne geliye
Hêsîlêd pan rakiriye
Qesta Dimdimî kiriye

Roja Dimdim nîvî kirî
Solîne w kanî berze kirî
Serê pênsed hostan birî
Tinê deng Mehmûdkî nekirî

Roja Dimdim nîv bû ava
Xan, çerxekê ser gerya ve
Serêd palan birî gera Dimdimî na ve
Tinê Mehmûd tê hêla ve

Çi sibe ye çi beyan e
Xan diçît pêşa Şahane
Dest danane ser destane
Jê d'xwazît destek hostane
Jê d'xwazît destek palane

Gotê Şahê xweş bît
"Palêd te hemî revîne
Nav Îranê belav bûne
Şolê min ma nivîşkane"

Şahî got:
"Zû biken, zû bilezînin
Pênsed palan bo min bînin
Pênsed hostan bo min bînin
Pêş min ketkete westînin"

Wê lez kirî wê lezandî
Pênsed pale vecemandî
Înan pêş Şahî westandî
Navêd hemyan nivîsandî
Dor Dimdimî werînandî
Xanî bo xwe xebitandî

Taqê kelê çendî pan e
Ber ‘erebe ser gêrane
Ca xwe bigrît ber topane

Heçî rêza wan xilas kir
Kola û tijî risas kir
Dimdim wê derê xilas kir

Gava Dimdime deynayî
Heft gav bin dergehî hêlayî
Qender halê çermê gayî
Ew jî bo xatra dilê Şayî

Gava Dimdim xilas bûye
Xwelî serê Şahê Ûrmiyê
Heft salan serê xwe girêdet poşya nîhariyê
Xanek rabû j’Kurmanciyê
Asê bû pilingê beriyê

Dema Dimdim temam kirin

Hosta û pale xelat kirin

Ew ser malêd xwe da d’zivirin

---

Dayka Xanî bi texmîn e

“Xano rabe dest helîne

Tu destekî topan bîne

Kela xwe pê ceribîne”

Çi sibe ye sibe zû ye

Xan çûye pêşî şahiye

Dest danandin ser destiye

“Xano bêje te ji min çi ye”

“Min ji te divêt destek topane

Dê berdem birc û kelane

Kanê kela min çawan e”

Şahî got:

“Zû biken û bilezînin

Destekî topan helînin

Topan ber kelê daînin

Şêlkeke topan reşînin

Kela Xanê Kurdan ceribînin”

Çi sibe ye çi beyan e

Wê înan destek topane

Ber kelatê wê danane

Berdanê şêlkek topane

Toz rad'bîte ber 'evrane

Destekî topan înandî

Barite tê da heşandî

Bircêd kele ve peqandî

Dimdimo berê kolayî

Şêlkeke topan berdayî

Ber ser berî nehejyayî

Dimdimo berekî gewr e

Wê lêdan kuling û tevre

Toz li esmanan bû 'evre

Dimdimo beroy beranî

Jê tavên soline w kanî

Şola Xanî kes nizanî

Dimdimo berekî pan e

Kirin armanca topane

Egîd her Xanê Kurdan e

Dimdimo berekî şîn e
Çel û çiya xebarî ne
Egîd Xanê Lepzêrîn e

Dimdimo berekî qop e
Daretnê tifeng û tope
Wekî baran û dilop e

Dimdim berekî quloz e
Daretin top û çeqeloze
Gurî j'esmanan kir toze

Dimdimo beroy xweristî
Pencsed top lêdan diristî
Ber ser berî neguhustî

Dimdimo beroy di rê da
Pênsed top wê pêkve lêda
Ber ser berî neçû tê da

Nê sê şev û sê rojane
Qirpênek kefte topane
Avêtin bircêd xanane

Roja sêyê top rawestandî
Bayê rehmê toz û dukêl helandî
Xanî çi 'eyb Dimdimî nedî

Xan wê kelê difikurît
Remz û halan jê digirît
“Baş e eve dê wecê bigirît”

Çi sibe ye sibe zû ye
Xanî topêd Şahî biriye
Teslîmî destê wî kiriye
İzna mala xwe jê xwestiye
Mala xwe îna nav kelê daniye

---

Gava Dimdim ava kirî
Birc û hewale çêkirî
Xanî qereç û mitirb gazî kirî
Daweta kure xwe Evdal Bege tê da kirî

Hatî Kanîna biçûke
Befrê wê girtin gedûke
Xanî ava kir qesr û qusor û birc û sûke
Bo kure xwe îna bûke

Hatî Kanîna Mezine
Befrê girtin terazine
Xanî ava kir qesr û qusor û ser û bine
Bo kure xwe îna jine

Çi sibe ye roje tav e

Govendek şêran gêra ve

Xan Perî bûk e Ebdal Beg zava

4. 4. BEŞA ÇAREM

Payîz e çi xweş payîz e
Vê berfokê gîzegîz e
Xan xulame j'baxwê ezîz e

Payîz e befrê kêrî alandin
Xwîsarê kanî pengandin
Xanî bazirganêd Şahî şelandin

Payîz e befrê kêrî spî kirin
Xwîsarê kanî tîr kirin
Xanî bazirganêd Şahî rwîs kirin

Payîz e befrê kêrî w mil miştin
Xwîsarê kanî helmiştin
Xanî bazirganêd Şahî kuştin

"Xan Ebdal Bego babgorî
Zû bike zû bilezîne
Komêd mêrçakan helîne
Revda şêran bixuşîne
Li dinyayê vebijîne
Rê û rêbaran bigire
Xelk û alemê bişelîne
Terş û talanan bo babê xwe bîne"

Xan Ebdal Begê zû kir zû lezandî
Komêd mêrçakan helandî
Revda şêran wê xuşandî
Wê li dinyayê bijandî
Xelik û ‘alem şelandî
Terş û talan wê cemandî
Bo Kela Dimdim înandî

Çi payîz e zivistan e
Xelîfe cab da Şahê Îsfehane
“Qibhet kirin Xanê Kurdane
Wî şelandin bazirgane
Êcar min û wî lêkdane”

Rojêke ji yêd Xudê dayî
Xelîfe rabû çû nik Şayî
“Serê te ye û babê te ye
Heçî ya d'bêjim her we ye
Xanî şelandin bazirganêd te ye
Xan dujminê dînê me ye”

“Çi xan e te rakirî Kurdistanê
Serav berdane Îranê
Xirab kir heta alyê Wanê

Çi xane te rakirî Dimdimeye
Xirab kirî cihkê me ye
Bû dijminê dînê me ye
De'wa wî doşeka te ye
Naborîtin serê me ye"

Şahî got: "Xelîfeo qet we nîn e
Xan, xulamekî emîn e
Min destê wî kir zêrîne
Min divet dil û yeqîne
Çi car li min nabît xaîne

Xan xulamek emîn kirî
Min destê wî zêrîn kirî
Kiça xwe kurê wî mar kirî
Nabît hecetan min bigirî"

Xelîfe got: "Serê te ye û babê te ye
Heçî ya d'bêjim her we ye
Xan dujminê dînê me ye
De'wa wî doşeka te ye"

Xelîfe got: "Şahim heke we ye
Ew tancê we sor û spî ye
Bide destê çar xulam û cindiye
Rêke bo Xanê Kurdiye
Bila sê caran ramîsît danît ser seriye

Ew tancê we sor û zer e
Bide destê çar xulamêd tetere
Rêke bo Xanê Beglere
Bila sê caran ramîsît danît ser sere”

Ew tancê we sor û spi ye
Dane destê çar xulamêd cindiye
Rêkir bo Xanê Kurdiye
Gotê: “Şahî silav rêkiriye
Bila sê caran ramîsît danît ser seriye”

Ew tancê we sor û zer e
Dane destê çar tetere
Rêkir bo Xanê Beglere
Bila sê caran ramîsît danît ser sere

Çar teter wê hatin der da
Sibexêrek dabûn ser da
Xanê Begler digel xeber da

Ew tancê we sor û zer e
Danan ber Xanê Beglere
“Xanê xweş bît Şahî silav li te kirin
Gotê bila sê caran ramîsît danît ser sere”

Xanî got:
“Hey kafiro bê usûl e
Xweş nahêt Xudê w Resûle
Tancê te nakem qebûle”

Hey kafiro bê mefer e
Ew tancê we sor û zere
Lêda û kire şeş kere

Şah derkefte li baniye
Wê dûrbînê lê nêriye
Teter qasid wê hatiye

Qasidan got:
“Ew tancê we sor û zer e
Me dana ber xanê beglere
Şahî got bila ramîsît û danît ser sere
Belê Xanî lêda kire şeş kere

Gotê wey kafiro bê usûle
Xweş nahêt Xudê w Resûle
Tancê te nakem qebûle”

Şahî got: Xelîfe
Madem we bît heke we bît
Şîrê min ber bejna te bît
Bila ev şere xema te bît

Serê min û serê te ye
Şîrê min ser destê te ye
Ev sefere xema te ye”

---

Şahî got:
“Xelîfe lez bike bilezîne
Tu kaxezan vebijîne
Ordû eskerî bicemîne
Destekî topan helîne
Li ber kelatê daîne
Wê kelokê herifîne
Xanê Kurdan dîl bigire bo min bîne
Me şer e çi sulhe nîne”

Xelife d’bêt: “Şahî xweş bît
Newêrim b’çime bi komê
Tirsim min bikêşît domê
Hanek bo bêtin ji kinarê Romê”

“Xelîfe bes bêje xeberêd tifalî
Heft salan Romê geriyam bi evdalî
Min ji Romê nedîtin çi talî

Xelîfe bes xeberan bide ber xeberan
Eskerî d’deme te ji dar û beran
Here wê keloke ji wêrê rake bi leşkeran”

Xelîfe rabû bê dome
Der û dinya dû bûn kome
Dê biçin şerê Xanê destkurome

Xelife ji Îsfehanê rabû
Der û dinya dû xişyabû
Rexê Dimdimî deynabû
Pênsed top pêkve lê dabû
Ber ser berî nehejyabû

Xelîfe lez kir û lezande
Bo xwe leşker vecemande
Wê l'bin Dimdimî pengande

Destekî topan înandî
Li ber kelatê danandî
Xîvet û çadir danandî
Şêlkeke topan reşandî
Ber ser berî nehejandî

Hindî xîzê ber van çeman e
Hindî belgêd dar û beran e
Hindî stêrêd esmanane
Hind xîvet û çadir înane
Li ber Kela Dimdimî danane

Xelîfe got:

“Herê Xano, Xanê re’yetê

Qebûl ke tancê dewletê

Heke dê li te rakeyn qiyametê

Herê Xano li mixarê

Pilingo ketî hîsarê

Tu kerem ke were xwarê”

Avêtê topa mezine

Berkê wê bêm hindî mine

Dimdim çi ye leqînim ji bine

Hişyar nebûn zava û jine

Avêtê topa biçûke

Bi xirxal û sindirûke

Derman kirê elbê sûke

Hişyar nebûn zava û bûke

Avêtê topa dev zirave

Berik û derman kirin nave

Bircêd kelê deng veda ve

Avêtê topa dev zêre

Berik û derman alyê têre

Nehejandin birc û şkêre

Avêtê topa Îranê
Dev wekî derê qazanê
Avête bircêd eywanê

Avêtê topa enzelê
Dev wekî derê mencelê
Avêtine bircêd kelê

Avêtê topa sehrane
Derman kirê mencelane
Avête bircêd xanane

Nê sê şev û sê rojane
Qirpênek kefte topane
Avêtin bircêd xanane

Dimdimo berê kolayî
Pênsed top pêkve lêdayî
Ber ser berî ne hejyayî

Dimdimo bereke gewr e
Wê lêdan kuling û tevre
Toz li esmanan bû ‘evre

Dimdimo beroy beranî
Jê tavên solîne û kanî
Şola Xanî kes nîzanî

Dimdimo bereke pan e

Armancê top û tifengan e

Egîd her Xanê Kurdan e

Dimdimo bereke şîn e

Çel û çiya xebarî ne

Egîd Xanê Lepzêrîn e

Dimdimo bereke qop e

Daretinê pênsed tope

Herwekî baran û dîlope

Dimdimo bereke quloz e

Lêdan top û çeqeloze

Gurî j'esmanan kir toze

Dimdimo beroy xweristî

Pencsed top lêdan diristî

Ber ser berî neguhustî

Dimdimo beroy di rê da

Pênsed top carekê lêda

Ber ser berî neçû tê da

Nê sê şev û sê rojane

Qirpênek kefte topane

Avêtin bircêd xanane

Xelîfe li kelê difukurî

Remz û halan jê werd’girî

Walla eve xweş asêtî ye

Xanê Kurdan ber pê min çêkirî

---

Şeveke ji yêd tarîsan e

Xwarkeftê Xanê Kurdane

Digel bireke lawyane

Sêsed xîvet kir talane

Şeveke heyveşevî ye

Xwarkeftî Xanê Mukriye

Digel bireke lawiye

Sêsed xîvet b'şîr biriye

Şeveke j’yêd tarî tava

Xarkeftê Evdal Beg zava

Ket bo ketê jê vêkdave

Ordiya Xelîfe çi nehêla ve

Xelîfe tinê jê ma ve

Teterxan Begê rewal e

Helbestin şîr û mertale

Hefsed xîvet kirin vale

Kesê nezanî çi hale çi hewal e

Ji Xelîfe wê ve kes nehêla

Sibe ye sibe sihar e
Xelîfe eskerê xwe hejmare
Leşkerê wî nebû hizare
Ew bû rûreş û şermezare

Çi sibe ye sibe zû ye
Xelîfe ji xewê rabiye
Eskerê xwe fukuriye
Ji xeyrî wî kes nemayiye
Bi herdû piyan reviye

Xelife revî û dibête
“Koma'l gel min wê perête
Xan piling e, asê bû l’kelête”

Xelîfe l’ser girkekê rawestayî
Koded xwelyê dane bayî
Koma giran ew jê mayî
Xan d’bejît: “dê herê Xelîfe
Min tu daye xatra dilê Şayî
Da cabê bibey bo Şayî”

Xelîfe rabû wê dibête
“Heke şerm e heke fihête
Bila Şah bi xwe bihête
Piling asê bû kelête
Çi ji destê min nahête

Heke şerm heke şerm nîne
Divêt Şah ordyê vecemîne
Asê bû Xanê destzêrîne

Dimdim nîne tatê şîn e
Hemî solîne w kanî ne
Nav da Xanê destzêrîn e”

Dimdimo ber e sehrayê
Lê dabû bakê dinyayê
Şîrhingêvan xwe kêşayê

Xelîfe zivirî digel bayî
Koma d’gel min kes nemayî
Nê ew Xanê nanbiryayî
Asê bû pilingê çiyayî

---

4. 5. BEŞA PÊNCEM

Şahî got:

“Xelîfe zû ke, bilezîne

Rezekî bo min biçîne”

Heta berê rezê xwe nebîne

Ordiyê ser Xanê Kurdan nahelîne

Xelîfe lez kir lezandî

Xox û zerdelî înandî

Rezek bo şahî danandî

Rez û bax danandîne

Berê wan pê ve hatîne

Çi çare pê nebirîne

Sê sal çûye temamiye

Dara zerdelî girtiye

Şahî berê rezê xwe xwariye

Gote Xelîfe:

“Qewl û qerar temam bûye

Min berê rezê xwe xwariye

Min Xanê Lepzêrîn negirtiye”

---

Zû biken zû bilezînin

Kenefêd xîvetan qetînin

Ordiya mezin ser Xanê Kurdan helînin

Şah dibêjît:

“Lez biken û bilezînin
Destî b'qeleman b’şidînîn
Ser kaxezan bireşînîn
Gund û welatan bijînîn
Ecematî vecemînin
Koma mezin bo min bînin”

Wan lez kir wan lezandî
Dest li qeleman şidandî
Wê ser kaxezan reşandî
Gund û welatan bijandî
Ecematê vecemandî

Zivistan çû hat bihare
Hun leşkeran biken kare
Xanê Kurdan d’gel me xwar e

Bihar çû hatî havîne
Dê leşkeran vecemîne
Xanê Kurdan d’gel me xaîn e

Havîn çû hatî payîze
Dê leşkeran bitewîze
Me w Xanê Kurdan xwînrîz e

Payîz çû hat zivistane
Raken leşkerê girane
Me w Xanê Kurdan lêkdan e

Xanek hatî ji Erdehane
Fêrise ser dewre zeman e
Wî got "Dimdim çi ye?
Dê xirab kem bi awirêd çavane"

Xanek hatî ji Tebrêze
Eskere wî bûye rêze
"Şûna Dimdimey dê keme parêze"

Xanek hatî ji Tehranê
Esker kêşa heta Wanê
"Çi Xan e rabûy Kurdistanê"

Xanek hatî ji avê wê ve
Gel xwe îna tovê sêve
"Hîngê dê çim bihên pê ve"

Xanek hatî ji Berê Koxê
Gel xwe îna tovê xoxê
"Hînge dê çim bixwem xoxê"

Xanek hatî j'Gaza Berî
Çi Ecemê tanc li serî
Dujminê dînê pêximberî

Xanek hatî ji Hoderî
Di paxilê da tovê tirî
"Hîngê bihêm ew bigirî"

Xanek hatî ji Henc û Mance
Ne Felle ye, ne Cuhî ye, ne Kurmanc e
Wê'l serê Ecemî tance
"Dimdimey ber topan keme armance"

Xanek hatî ji Berê Birî
Eskere wî tîpê l'ser tîpê d'zîvîrî
Hemî hatne babê û kurî

Xanek hat ji Behra Girî
Teyran tavêt, bazya d'girî
Oxilmeke topan kirî
Heft rojan hetav ved'birî

Xanek hatî ji Erdebêle
Simbêl wekî dûvê çêle
"Dê Dimdimey xirab kem bi simbêle"

Xanek hatî hûke hûke
Leşkere wî bêlûk bêlûk e
“Dê Dimdimey xirab kem bi neynûke”

Xanek hatî Şino w Seblaxe
Leşkerê wî girt erd û axe
“Dê Dimdimey xirab kem bi van şaxe”

Xanek hatî ji Dîlêmane
Leşkere wî boş e, giran e
“Xano dê li te bim mêvane”

Xanek hatî ji Selemaste
Leşkere wî tîp li ser tîpê rawesta
Got “Gelî Xanan methan neken, min bi xwe
Xanê Kurdan dîtiye şêrekî rast e”

Xanek têtin ji Xoyêo
Evroke heft meh e têtin rêo
Ya Rebbî tu nedeyê ewlehiyêo
“Dê çim xirab kem Xanê Kurmanciyêo”

Xanek hatî ji Ûrmiyê
Ya rebbî nedeyê ewlehiyê
Dê çît xirab ket Xanê Kurmanciyê

Xanek hat Çîn û Maçîne
Zexîrê heft salan îna
Hefsed bedlek berahî ne
Hefsed bedlek dûmahî ne
Hefsed bedlek koderî ne
Hefsed bedlek dawetî ne
Xir û xîzan hisab nîne
Got: “min çi eskerê xêrê nîne
Bo dîtina Şahî hatime”

Xanek hatî ji Hebeşe
Eskerê wî sê hezar û şeş e
“Şaho rûyê min ber te reş e
Eskerê min nîvek tawî nîvek nexweş e”

Xanek hatî rojhelatê
Şev û roj diket xebatê
“Dimdimî dê bistînim gav û satê”

Xanek hatî ji rojava
Şêlkeke topan berda ve
Heft rojan nedîtin tave
Roje heştê bircêd belek şebeq da ve
Xanêd Ecem vecemandin
Alayêd herbê helandin
Ser Xanê Kurdan pengandin

Xan hemî wê cema bûne
Çil hizar wê temam bûne
Ber Dimdimî peya bûne

Şah rabû ji Îsfehanê
Der û dinya dan haydanê
Sefera Xanê Deşta Hozanê

Şah ji Îsfehanê hate
Eskere wî girtibûn
Duwanzde deşt û duwanzde welate
Berdanê topêd zulmate
Ecêb Xan ji ber nehelate

Şahî ji Îsfehanê rabû
Hindî Ecem dû rijyabû
Rexê Dimdimey deynabû
Pênsed top pêkve lê dabû
Ber ser berî ne hejyabû

Deşta Hozanê serkeftiye
Şah pêş kelatê keftiye
Wê kenî û girnijiye
"Wey le Xanê nanbiryayî
Xweş amar e te deynayî
Pîroz bît xudan jê mayî"

Veresandin topêd enzelê
Barite d’kenê mencelê
Têk hejandin bircêd kelê

Veresand topêd mirarî
Barîtê d’kenê tirarî
Têk hejandin bircêd tarî

Veresand topêd devzêre
Barît kirinê alyê têre
Têk hejandin bircêd şkêre

Veresand topêd derbirî
Barîtê d’kenê cuhorî
Têk hejandin bircêd kevirî

Veresandin topêd Îranê
Barîtê d’kenê qazanê
Têk hejandin bircêd Xanê

Topêd mezin veresandin
Hewalêd bircan firandin
Sitiyan rondik werandin
“Herê Xano tu Kurmanc î
Tu qebûl bike vî tancî
Heke ber topêd me armanc î”

“Ez wî tancî qebûl nakem
Xwe j’Xudê û Resûl nakem
Kurmanciyê bê nav nakem”

Topêd mezin giregir e
Bircêd belek xirexir e
Rewda şêran nirenir e
Rondkêd sitiyan guregur e
Fermana ser bab û kur e
Xan mîr e, Ebdal Beg kur e

Veresand topêd mezine
Şidandin toq û bazine
Têk hejandin wê ji bine
Hişyar kirin zava û jine

Veresandin topêd biçûke
Şidandin toq û neynûke
Têk hejandin birc û sûke
Hişyar kirin zava û bûke

Qebaxek topan berda ve
Pênsed top pêkve lêda ve
Heft rojan nedîtin tave
Roja heftê şefeq da ve
Ber ser berî ne hejya ve

Xan e, Xanê Lepzêrîn e
Kela wî hemî berîn e
Çi çare pê nebirîne

Şah li Dimdimî fukurî
Ber ser berî neguhurî
“Pîroz bît xudan nemirî
Asê bû pilingê kevirî”

Şahî pêş Dimdim rawestayî
Ber ser berî nehejyayî
“Pîroz bît xudan nav mayî
Asê bû pilingê çiyayî”

---

Ebdal Beg diçît ser banî
Hîkmetê d’girît giranî
Leşker boş e bin me danî

Ebdal Beg diçît hewalane
Fikra digirît girane
Hindî xîzê dev çeman e
Hindî belgêd van daran e
Hindî xurya van berxan e
Hindî stêrêd esmanan e
Hind xîvet bin me danane
Hewar e ev çi zeman e

“Çi Ecem e dor me d’girin
Ji xîzêd çeman pitir in
Ji belgêd daran boştir in”

Xanê Sor d’bête kure xwe
“Evdal Beg babo netirse
Ew Ecem in, pir hinêr in
Xîvetan xalî ved’girin
Hind semer in, hind hêştir in

Hind şivan in hind gavan in
Hind xerbendêd dewaran in
Hemî têra babê te nabin

Esker nîne bazirgan e
Têt ji welatê Sorane
Babê te pilingê çiyan e
Babê te Xanê Kurdan e
Xewazê bine behran e
Sibeyî dê çim nav wane
Xerc û xeracê min ser wane
Heke neden, min û wan lêkdane
Keteкê nahêlim ji wane”

Ebdal Beg d’bête babê xwe
“Xeberêd te bi tîvil in
Cerg û hinavêd min digirin
Ma tu mêr î xelk her jin in
Pênsed xîvet xema min in”

“Ebdal Bego xeber xurto
Min bo xwe ji davan girto
Eve çi xebere te bo xwe girto”

Xanî got “jihêd kevanan bînin
Dest û pê Ebdal Begê alînin
Ber periyê ra b’heşînin”

4. 6. BEŞA ŞEŞEM

Xanê Kurdan dibêt:

“Dilê mino diket girî

Teyrek ber esmanan d’firî

Eve heft sal e rez deynan jê xwarin tirî

Sala heftê temam bûye

Dêlek ber kele zayiye

Firî jê çêkir, rêkir bo Şahiye

Rojek ji yêd Xudê dayî

Dêlek wê l’bin kele zayî

Firî jê çêkir, destê Lawê Betkarî nayî

Rêkir bo ordiya Şayî

“Hey Lawo Lawê Bêdkarî

Mêro ji meran bijarî

Çi ye Xanî bo me hinarî”

“Nê eve firyê mihan e

Xanî rêkir bo Şahane

Da hun pê biken şîlane”

Şahî got: “eve sala heftêo

Mast peyda nabît çi erdêo

Xwarin bo me têt ji kelêo”

“Wey Dimdimo berê ger e

Heft sal e min ser te şer e
Sala heftê Xanê Kurdan
Bo min rêd’ket firyê tere

Wey Dimdimo berê pan e
Heft sal e min dor lê pêçane
Sala heftê Xanê Kurdan
Bo min rêd’ket firyê mihane

Miha xanan ji nû za bît
Û eve firyê miha bît
Be halê me dê çawa bît”

Şahî got:
“Lez biken û bilezînin
Tengêd dewaran b’şidînin
Ev xane dê me birînin”

Heke derew heke rast e
Ordî l’ber ordyê guhaste
Pêşahîk çû Selemaste

Şahê Ecem wê çi kire
Pisyar ji Lawê Bêdkarî kire
“Ka hewe solîne kî ve bire”

Xweşmêro lawê Bêtkarî
Hey mêro j'mêran bijarî
Helal bît nanê te xwarî

Got: "Hun çi nihe min d'kujin
An min d'kujin danê evarî
Min kerker b'ken ber xîzarî
Min bavêjne ber mişarî
Nabim qatilê çend hizarî"

---

Nê Mehmûdkê Alekanî
Kulkek bêt serê ezmanî
Bû xerîmê mala Xanî
Halê xanan kir beyanî

Ew Mehmûdkê bab nemayî
Kaxezek tîrê pêçayî
Avête xîveta Şayî

"Şîva şevê l'nav nemayî
Ew dêl bû li kele zayî
Ew firyê ter ji ber mayî"

Ji wê rista hûr bizmar e
Mehmûdkî xwe berda xware
Şahê Ecem jê kir pisyare

Ew Mehmûdkê bab nemayî
“Serekanî bin çiyayî
Nîşan e berê badayî”

Ew Mehmûdkê bab lê mirî
“Serekanî bin kevirî
Nişan berê risaskirî”

Xan pisyar d'ket: “Mehmûd kanê”
“Xano, me rû nema cîhanê
Xano cab nahêne danê

Xeber nahêne gotinê
Kê guhlêbûye ser dinê
Xulam baxwoy ber xwe bidet kuştinê”

---

Şahê Ecem wê dibête
“Mehmûdko te çi divête”
Got: “heke şerm, heke fihête
Min bûka Xanî divête

Ew Xan Periya baban e
Memik fexfûr û fincane
Ew seqa dilê lawan e”

Şahî got: “dê bînin û dê bînin

Topa mezin hun xişînin

Mehmûdkî tê biheşînin

Bircêd kelê ve peqînin

Da çi car xulam li serê

Baxwoyê xwe vê neînin”

Topa mezin wê înandî

Mehmûdkê Alekanî tê heşandî

Bircêd kelê ve peqandî

Nê ew Mehmûdkê Alekanî

Kirin topê berê wî dan esmanî

Got “dê wê wecê ji min girî,

Ew weca te girtî ji Xanî”

---

Çi sibe ye tîretav e

Van Eceman geşt û rav e

Ji Xanan birkirin ave

Şahê Ecem wê kû d'kete

Çil hêştiran serjê d'kete

Sirîcan tijî xwîn d'kete

Şahê Ecem çû ser solîne

Serê se û dêlan birîne

Sirîc pengandin ji xwîne

Solîn û av xirab kirin
Kopek tê da mirar kirin
Sirîc ji xwînê sor kirin

Hindî ga ne hind hêştir in
Ser solînan ser jê kirin
Sirînce tijî xwîn kirin

Ecem çûne bin çiyayî
Av j'solînan wergêrayî
Kevlê gamêşan pê dadayî

"Hey Mehmûdkê Alekanî
Seo kurê nehsed san î
Min hene pênsed xulamêd biyanî
Roj heye belkî negehîte yekî kerek nanî
Tu bo çi bûy sabîna mala xanî"

Çi sibe ye roj eyîne
Xanan helgirtin mesîne
Qesta nivêjê kirîne
Sirîcxane tijî xwîne
Xanê Kurdan çi hal nîne
Rûniştin bo xwe girîne

Çi sibeye sibe sor e
Xanan hilavêtin jore
Ava solînan têt sore
Van Xanan bû lorelore

Çi sibe ye sibe sar e
Feqiyan dest dan tirare
Sirîçxane jehremar e

Ev Xanê me çi bêgav e
Li ser sirîcan gerya ve
Hind ava zelal nedît ku
Pê bişotin dest û çave

Xan wê lez d'ket û wê d’lezînît
Avê li nav xwînê d’helînît
“Înşallah kes halê min nebînît”

Xan wê sirîcan d’fikurît
Avê nav xwînê vedgirît
“Înşallah kes halê min nebînît”

Xanê Sor rabû rindirî
D’fukurît mendala kurî
Hinavan radibît gurî

Xwînê nav avê kef da ve
Havîn e bêhnmirar kefte nave
Min heyfa mendalêd sava

Van xanan lêbû nihar e
Bestin fot û dadan çare
Meferê me yê Cebbar e

---

Xanî got:
“Herê dayê herê dayê
Ji koçkê were serayê
Me bike teybîr û rayê
Eceman sotim ser dinyayê”

Daykê gotê: “herê Xano
Teybîr ew e ya te kirî
Roja Dimdim xilaskirî
Serê pênsed palan birî
Deng li Mehmûdkî nekirî”

Xanî got:
“Ne’let tuxmî ‘esil jin e
Ewilî jî dayka min e
Çawa sotî zikê mine”

Xanê Lepzêrîn rabûye
Derecêd kelê serkeftiye
Ber qiblê rawestiyaye
Dua ji Xudê xwestiye

Xanê Sor çûye ser banî
Qîryê d'hêlît ber esmanî
"Hîvya me Rebbê Rehmanî"

"Ya ker evrê ser meydanê
Tu bide tebek baranê
Av tijî bît sirîçxanê
Da vexweyn, biçîn seyranê

Ker evrê ser meydanêwo
Tu bide tebek nixtêwo
Av pengît sirîçxanêwo
Da vexweyn, biçîn geştêwo

Ker evrê reş û dirêj e
Tebek baranê darêje
Da pê bikeyn nivêje
Çavêd me girtin qirêje

Ya ker evrê reş û tarî
Di danê nîvro êvarî
Tebek baranê bibarî

Ya ker evrê reş û şîn e
Tebek baranê barîne
Eskerê Xanan çi hal nîne"

Ne Nîsan e ne Gulan e
Beyna Tîrmeh Tebaxan e
Qirpênek kefte evrane

Yallah xêr bêtin barane
Av pengand sirîçxanane
Nava kelê bû şahyane

Nirênek kevte şêrane
Qebeqeba ribadan e
Van xweşmêran nav xwe dane

Şuştî xwîna di hewşêo
Av tijî kir sirîcêo
Xelkê kelê pê kir nivêja sibêo

Av çû sirîcêd xanane
Sofyan dest da mesînane
Evro dê keyn nivêjane

---

Mela Teyîbo bilezîne
Kaxezan binivîsîne
Nav Îslamê bigêrîne
Ecemî dor me girtîne
Me şer e çi sulhe nîne

“Hun lez ken û bilezînin
Mela katibêd min bînin
Hubrî kaxezan reşînin
Nav mîrekan vebijînin
Bo min eskerî ceminin”

Kaxezo belgê biyokê
Mela nivîsî ser çokê
Rêkir bo mîrê Dihokê

Kaxezo belgê gêlanê
Mela nivîsî eywanê
Rêkir bo Paşayê Wanê

Kaxezo belgê gulêo
Mela nivîsî sibêo
Rêkir bo mîrê Mûşêo

Kaxezo ji belgê tarî
Mela nivîsî êvarî
Rêkir bo mîrê Hekarî

Kaxezo belgê hejîrê

Mela nivîsî nik bîrê

Rêkir bo mîrê Cizîrê

Kaxezo belgê hêroyê

Mela nivîsî nîvroyê

Rêkir bo mîrê Zaxoyê

Kaxezo ji belgê gulê

Mela nivisî li milê

Rêkir bo mîrê Mûsilê

Kaxezo belge hinarê

Rêkir bo mîrkê Zêbarê

Bo xanan bêye hewarê

Mela kaxez nivîsandî

Avêt ber bayê rehmê wê şeqandî

Ji xudanan ra gehandî

Kaxez tên û qewî şîn in

Xeberêd xweş tê da nînin

Yeqîn paşa li mal nînin

Kaxez tên û qewî reş in

Xeberêd tê da nexweş in

Yeqîn ew paşa nexweş in

Kaxez reş in rengê morê
Çi mela lê naden domê
Yeqîn nexweş e Paşayê Romê

Kaxez reş in ji nezamê
Çi mela lê naden xeberdanê
Nexweş e Sultanê İslamê

Kaxezêd xwe cemandîne
Ber û pişt yêd neqşandîne
Çi xeberêd xweş tê nîne

"Ev mire hemî nexweş bin
Kolanêd wan term û leş bin
Ew ji xezayê bê beş bin"

"Cabê biden Mîrê Serhede
Ber xwe biket kirasê şemede
Nehêt zehmetê l'xwe nede

Cabê biden Mîrê Bahdîne
Çi Cuhi ye neynik şîn e
Nehêt min minet jê nîne

Cabê bidene Mîrê Wanê
Çi Cuhi ye li ber dukanê
Nehêt şere Kurdistanê

Cabê bidene Mîrê Botan

Birûnît digel day û dotan

Nehêt şere melkemotan”

Ne Badînan ne Şemzîna

Ne nav kockêd Mîr Sêvdîna

Kesê hewar bo xanan neîna

---

“Herê dayê herê dayê

Hey kurtikê leblebayê

Me bike teybîr û rayê

Kes îmdada xanan nayê”

“Çi teybîre li xwe kirî

Çi ray e te li xwe kirî

Xwe Dimdimî asê kirî

Şahê Ecem bin xwe peya kirî”

“Dimdim nebûm kirme Dimdim

Ez mîr nebûm kirme hakim

Biradostan kirme dijmin

Şahê Ecem deyna bin min”

Hay Dimdim e hay Dimdim e

Topan ser me gurmegurm e

Şahê Ecem deyna bin me

Dayka Xanî kir texmîn e
“Hewara te batinî ne
Çi meferêd dî me nîne

Herê dawo kaxez şîn in
Çi gir û nîşan tê nînin
Hewara te batinî nin”

Hewara min Xudê Xewsê Bexdayê
Kes hewara xanan nayê
Digel Xanan bêy xezayê

Hewara min Xudê Şêx Ehmedê Badî
Tu ‘ilmê Xudê ribad î
Hewara Xanan da hatî

Hewara min Xudê Şêx Zêlatê
Şevê û rojê d'key xebatê
D’gel Xanan têy aresatê

Hewara min Xudê Şêx Pirmîs e
Di destî da şîrê rwîse
Bo xanan bike namîse

Hewara min Xudê Şêxê Navkuran
Tu xudanê ‘ilm û siran
Hanek bêt bo bab û kuran

Hewara min Xudê Marîmê Satêo

Pilingo keftî latêo

Hanek bêtin bo Xanêo

Hewara min Xudê minasibê Pîreloke

Çar şehîdêd deştîloke

Bên hewara xanan nûke

Hewara min Xudê Mela Ehmedê Kemekî

Tu ebayê reşbelekî

Tu nav batinyan gelekî

Hewara min Xudê Minasibê Şûşêo

'İlmê Xudê di koşêo

Tu bêy hewara Xanêo

Hewara min Xudê Şêx Ehmedê Bişêşî

Daim 'ilmê Xudê d'bêjî

Tu sencaqa xanan b'kêşî

Hewara min Xudê Şêx Simahîlê Biyadirî

Şîr û mertalan hilgirî

Beye xezaya kafirî

Hewara min Xudê Şêx Eliyê Dizêo
D'gel Şêx Mûsayê Nîşêo
D'gel Şêx Nazirê qiblêo
Tivengan dagirin têzêo
D'gel xanan werne rêzêo

Çi spêde ye dinya zer bû
Refek ferxêd kotiran der bûn
Rexêd birca kelê wêrbûn
Ji Xanê Kurdan ra esker bûn

Çi spêde ye dinya zer e
Refek kotiran hatne dere
Rexêd bircêd kelê were
Ji bo Xanê Kurdan leşkere

Çi êvar e direngî ye
Bireke teyran firiye
Ser bircêd kelê daniye

Çend xîzê di van çeman e
Çend belgêd dar û beran e
Çend stêrêd esmanane
Ser bircêd kela xanane
Hind batiniyan danane

Minasib hemî cemyane

Dest li ser qevdêd şîran e

Hîvya emre xanan mane

## 4. 7. BEŞA HEFTEM

Xan dibêt:

“Herê daye herê dayê
Tu bike teybîrê û rayê
Hewar çûn qolê Bexdayê
Bê hîvî me îmdat nayê”

Dayka Xanî dibêt Xanî:

“Xano kurê dêhle şêrê
Dest b’de şîrî here gêrê
Xudê berxê nêr da bo kêrê”

Xanî got:

“Nehavêje hişketane
Dê dest avêjim çekane
Tine dê b’çime meydane”

“Hey Xano kurê Momê
Bes bikêşe evê domê
Dest b’de şîrî here komê
Heke newêrî ez wê çûmê
Da nav biçît Erzerome

Hey Xano sere hîviyê

Tu nekêşe rezîliyê

Dest b'de şîrî here zeviyê

Heke newêrî b'de sitiyê

Da nav biçît Kurmanciyê

Hey Xano sere dewletê

Tu nekêşe rezaletê

Dest b'de şîrî here dawetê

Heke newêrî bide metê

Da nav biçît nav hukmetê

Tu Xanî Xanê Kurdan î

Melevanê bin behranî

Delîletêd şolan d'zanî

Herê Xano berxê dayê

Dest b'de şîrî here xezayê

Bike tarîx li dinyayê"

Xan dibêt:

"Herê dayê herê daye

Ez Xan im Xanê boxe me

Pîremêrekî kone me

Têra gereka dî heme

Ne xasme ku kurê te me

Herê dayê herê daye
Sibeyî were bêlayê
Em çend mêr dê çîn xezayê”

“Hey sitiyê hey sitiyê
Hey kurtikê zendik spiyê
Sibê dê xwarkevîn zeviyê
Da nav bigerît Kurmanciyê”

Xan dibêt jina mezine:
“Hey kurtiyê dest bazin e
Sibehî roja mirin e
Em çend mêr têne kuştine”

Xan dibête jina berê:
“Hey kurtiyê bazin zerê
Sibeyî were pencerê
Em çend mêr dê çîn seferê
Nêr mêrê xwe, nêr xencerê”

“Hey sitiyan hey sitiyan
Bînin rextêd koderiyan
B’şidînin piştêd lawiyan
Lawî şor bûn ser deriyan
Wêxte Xan dê çin zeviyan

Hey Sitiyê, hey Sitiyê
Zava rake pişt periyê
Ew e mêrê bab hîviye

Hay zerî zerî zerî
Zava rake li pişt perî
Da d'gel Xanan bête şerî"

Rabû rabû rabû rabû
Ebdal Begê babê rabû
Bejna şirîn têk hejyabû
Sîleh li milan du ta bû
Birek lawan li dû xişyabû
Xizmeta babê wêstabû

---

Sibe ye Xanan dîwan e
Mesqel b'den qevdêd şîrane
Me sibê 'emel seyran e

Sibe ye Xanan teybîr e
Mesqel b'den xencer û şîre
Sibeyî 'emel nêçîr e

Ebdal Begê gote Babê xwe
"Me ray gotin, ray perêtin
Hedûdan cuhor avêtin
Destek şîran me divetin"

“Yallah deskokan lezînin
Hosta û ciqsiyan bînin
Qursêd zêran bihelînin
Deskêd şîran tê helînin
Paş me dê bo kê bimînin
Law biçûk in b’kerimînin”

Qursêd zêran herişandin
Baçoqêd şîran şidandin
Hecetêd lawan birandin

Xanê Sor dibêt ciqsiyan
“Mesqel b’den şîr û misriyan
Şil neken milêd lawiyan

Qursêd zêran b’herişînin
Baçoqêd şîran b’şidînin
Hecetêd lawan birînin”

Qursêd zêran helandin
Şîr kavlan ve tê alandin
Ber bejnê ve hejandin

Yek Qere ye yek Kanîn e
Herdû birayêd axretî ne
Wê nik ciqsî rûniştine

“Min şîrek ji te divête
Di deste min da neşkête
Da ez pê nebim fihête

Min divêt şîrek pîlayî
Tasek mifriqî lê dayî
Da pê b’gehim xîveta Şayî”

Ciqsî wê şîrek çêkirî
Tasek mifriqî lê kirî
Da deste Qeroyê Bêdkarî

Qere şîr girt û hejandî
Çirkeçirk şîrî înandî
Di baçoxî ra firandî

“Ne’let babê te ciqsiye
Şola te bi hileyî ye
Heke şîrê min di şerî şkestibû
Da ji Xanî bim şermezariye”

Ciqsî du şîr nav êk nayî
Ser şeqa wî ji pîlayî
Yek çekûç tine lê dayî
Bo Qero Bêdkarî înayî

Ciqsî wê şîrek çêkirî
Du şîr nav êk da birî
Tasek mifriqî lê kirî
Deste Qeroyê Bêdkarî ra kirî

Şîrî d’girît û d’hejînî
Çirkeçirkê j’şîrî tînî
Çi ‘eyban şîrî nabînî
Dil û yeqîn dihebînî

Xanê Sor çû nav feqa ne
Feqiyan kitêb deynane
Dest avêtine şîrane
“Ser gorî Xanê Kurdane
Nê evro roja mêran e”

Xanê Sor çû nav feqiyan
Feqiyan dest dane şîran
“Serê me gorî Xanê mîran”

Xan çû kel û kelemendan
Diket nesîhetêd merdan
“Kes ber min neket govendan”

Xan çû kel û keledêran
Wê diket nesîhetêd xêran
“Kes ber min neket çi gêran”

---

“Şolêd me hemî b’kitêb in
Tiştêd me hemî b’hisêb in
Paş me sitî dê bo kê bin

Ez Xan im, Xanê Kurdan im
Durnasê binê behran im
‘Eybekê vê şolê d’zanim

Xan im, Xanê Lepzêrîn im
Baziyê li ser hêlîn im
‘Eybekê vê şolê d’bînim

Dê pisyarên me bê ‘êb in
Gotinêd me jî bê lêb in
Piştî me sitî bo kê bin”

Xan dibêjît van zeryane
“Xemilin rengê horyane
Min, hun hemî destûrdane
Hun herin bo kafirane”

Zerya Xanî got:
“Kep û lêvêd me dê birîbin
Serkokêd me dê tiraşî bin
Şûkokêd me dê xazî bin

Kepê sitiyan birî bît
Serkokê wan tiraşî bît
Paş xanan maldarî nabît”

Çê dibîtin Zerya Xanî
Zerya Xanî dil û canî
Wê govendek bire banî

Sityêd Xanan pir hinêr in
Pisyaran êkûdu d’gêrin
Piştî Xanan dê bo kê bin

Sitiyêd zer û zirav e
Li rûyan nekeftî tave
Mixabin Ecem bêt nave

Ev zerî çendî delal in
Ser doşekan nalenal in
Çi nexweşêd di bê hal in

Sitî wê diken zêmar e
Destî girtin du tirar e
Yek av tê da, ya dî jahr e

“Em sitî ne çil pitir în
Tasêd jahrê jêk wergirîn
Yek vexweyn çar pê bimirîn”

Sityêd Xanan wê çi d’kirin
Fîncanêd jahrê tê d’kirin
Yek rad’ket çar pê dimirin

Ew fîncenêd tijî jahr e
Yek ved’xwet, pê d'mirin çare
Nevexwar Perya Nazdare

Zerya Xan Ebdal terlan e
Hemlê wê hemlê kuran e
Wernagirît fîncanane
Ser dibet malêd babane
Kur ved’ken tolêd babane

Sitiyan bû nalenal e
Nîvek jê daykêd mendale
Heçî vexwar mir derhale

Wan mendal xwe ve şidandin
Xwe hewalan da firandin
Cergê van xanan kirandin

Xan zivirî j’nav zeryane
Wê dad’rêjîtin rondkane
Heyfim mendalêd kurane

Min heft kur kirine zava

Gurî rad’bît ji hinava

Heyfa min mendala sava

Xan têt û diketin girî

Ji hinavan d’çîtin gurî

Heyfa min mendala kurî

---

“Xan im Xanê Kurdan im

Ev xîvet û çadir têra min nînin

Heyfekê vê şolê d’bînin”

Xanan wê girtî dîwane

“Rih şirîn e, ofek giran e

Heçî mal û jin divête

Bila biçît min destur dane”

Xanê Mukrî têt lezînît

Jinê w kurî d’gel xwe tînît

Nava Dimdimey da tînît

Xanê Kurdan wê dibête

“Heke şerm, heke kirêt e

Heçî mal û jin divête

Bila ji Dimdimî nehête

Da ji Xudê nebîn fihête

Heçî divêt mal û jine
Bila nehêt digel mine
Bo min jî Xudê mezin e”

Xanê Kurdan gote Xanê Mukrî:
“Tu ew nînî yê li devî
Heçî gava şer helkevî
Yeqîn eve tu dê revî”

Mukrî got: “te ji ber min e
Min heram bin mal û jine
Xwe d’gel te bidem kuştine”

Xanê Mukrî d’zivirîte
Jinê d’gel kurî d’ kujîte
Gurî ji hinavan rad’bîte

Mukrî, şîrê xwe li ba kir
Ruh ji qalibî cûda kir
Cerg û dilan agir rakir

---

Dê hilon babo da biçinê
Dê hilon cano da biçînê
Misriyan ter keyn ji xwînê
Mirin xweştir e ji vê jînê
Ev halê ho em ketînê

Dê hilon babo mical e
Dê hilon cano mical e
Şor bikeyn bendêd mertale
Me ji Xudê fersed êxbale

De hilon babo me wext e
Dê hilon cano me wext e
Xwe girêden çek û rexte
Me ji Xudê talih û bext e

Dê hilon babo hewar e
Dê hilon cano hewar e
Pif biden dahl û niqare
Temam bûne yek hizare
Xanê Lepzêrîn serdar e

"Ez Xan im, Xanemîr e
Serê min sindanê tîr e
Sîngê min mertalê şîr e

Ez xan im, Xanê mîran
Serê min sindanê tîran
Sîngê min mertalê şîran"

Hay rabûn rabûn û rabûn
Bejnêd şilkoke hejya bûn
Komêd lawiyan wê rabûn

Sîlah li milan du ta bûn
Rextê zêrîn girêdabûn
Kumzurî ser da kêşabûn
Pişt dergehan rawestabûn
Hîvya emrê xanan mabûn

Heta kengî dikeyn girî
Behs û halan jêk d’helgirîn
……. ber pêkan dadbirîn

Girêdan rextêd bi morî
Bi quweta rebbê jorî
Derkeftin j’mezela jorî

Xan sê caran yê we d’bêtin:
“Heçyê mal û jin divêtin
Bila ji kelatê nehêtin”

Koma şêran daberistin
Qevdêd misriyan beristin
Gotin: “Xano em golkêd babê te ne
Heft sal e te em kelê vebestin”

“Bêjin Ebdal Begê cane
Biçît terefê gundane
Bînîtin çend mitirbane
Bo xwe bikeyn seyrane”

Ew Ebdal Begê can e
Çû bo terefê gundane
Çend mitirb wê înane
Bo xwe kirin seyran e

“Pê me şil bûn ji govenda
Milêd me şil bûn kerbenda
Em dê qut bîn ji birsan da
Nagehîne çi mirada”

---

Sibe ye demê siharê
Mitirban pif kir niqarê
Xanê Sor meşya hîsarê
Şêr ji kelan hatin xwarê

Sibe ye demê sehrayê
Bû pîkepîka zirnayê
Xan derkeftin bo xezayê

Xan veresin dereca
Bû teqeteqa debanca
Xan e serdarê Kurmanca

Hatin derecêd berîne
Herdû Xan vê da meşîne
Wan hîviya serê xwe nîn e

Hatin derecêd kulayî

Herdû Xan vê da meşyayî

Hîviya serê xwe nemayî

Hatin derecêd xweristî

Xan ji kelê verestî

Govenda şîran vebestî

Hatin derecêd kelêo

Herdû Xanan pê danêo

…………… birin jêo

Hatin derecêd nûbirî

Ji hinavan rad'bît gurî

Min heyfa mendala kurî

Hatin derecêd nûava

Gurî rad'bît ji hinava

Min heyfa mendala sava

Spêde ye tîvê hetavê

Manekan pengava bavê

Bes top û tifengan bavê

Wexte Xan de çine ravê

Hatin derecêd jêrîne
Revda şêran ber xuşîne
Hîvya serê xwe qet nîne

Xan ji kelê xericîne
Pêşya eskerî girtîne
Eskerê xwe şîret kirine

“Dê ser xîvetan belav bin
Spêdê d’gel denge min rabin
Bi xezayê can fîda bin”

Xan dibête lawyan e
“Ez bim qurbana destane
Wekî mêvanî belav bin ser xîvetane
Ji xwe neveken çekane
Baweryê neden van sane”

Xan dibêt Ebdal Begê
“Rextê zêrî wê kêlekê
Gazindê bike j’felekê”

Xan dibêt her heft kurêd xwe
“Ez dê deme we perê xwe
Meydanê biken şerê xwe
Gazindê biken j’rebbê xwe”

"Em koma xanan hisêb in
Dê pisyarêd me bê 'êb in
Şolêd me bê fend û lêb in
Ka em dê mêvanêd kê bin

Koma Dimdimî reqas in
Xudan şîrêd bi elmas in
Em mêvanêd Şah Ebas in

Xanim Xanê Lepzêrîn im
Melevanê behrêd şîn im
Mêvanê Şahê emîn im

Xanim Xanê begler im
Reqasayê bi xencer im
Mêvanê Şahê Qeçer im

Xanim Xanê kalome me
Reqaseyê galome me
Mêvanê Şahî bi xwe me"

"Ez Xan im Xanê Mukrî me
Reqasayê bi misrî me
Mêvanê Xelîfeyî me"

Eceman got:

“Çi sibe ye tîvê tavê

Bes top û tifengan bavê

Nê Xan hatine silavê

Sibe ye hêşta direnge

Bes bavên top û tifenge

Xan hatin silavî Firenge”

---

Xan ji kelê hate dere

Cewşenek zêrîn li ber e

Hezar û hezar selawat

Li Muhemmed pêximbere

Xan ji kelê hate xware

Bir kir zirna w niqare

Eskerê wî yek hizare

Dema kelê derkeftî ne

Sêsed xîvet ber xişîne

Kes hîvya serê xwe nîne

Derkeft koma Dimdimiye

Sêsed xîvet ber liviye

Sibexêrek lê kiriye

Xan hate derecêd jêrî

Wê d’nirîtin wekî şêrî

Xelîfe tancî d’hinêrî

“Herê Xano tu Kurmanc î

Tu qebûl bike vî tancî

Heke ber topan armanc î”

“Xelîfe çend bê usûl e

Xweş nahêt Xudê w resûle

Ez tancî nakem qebûle

Ez tancê te qebûl nakem

Xwe j’Xudê û Resûl nakem

Kurmanciyê bê nav nakem

Eskerê min hemî belav in

Hemî di bê nan û av in

Hemî gaziya min rad’bin”

---

Xanê Mukrî wê xwarkefte

Qesta Xelîfey wê d’kete

Xelîfe wê l'bin xîvete

Xan ser pê silavê d'kete

Xelîfe d'girît heybete

Xanê Mukrî çûbû der da
Sibe xêrek kire ser da
Xelîfe digel xeber da

“Ser ser û herdu çavan e
Were pal de balîfane
Da vexweyn cotek Fincene
Ew rêza me maqûlan e”

“Herê siwarê Xohêo
Sed ne’let day û babêo
Na vxwem fincana jahr têo
Dê bim qatilê ruhêo”

Xelife d’bêtê: “Hey Xane
Tu ji xwe veke çekane
Kerem ke ser mehfûrane
Pal bide balgêd perane
Da li gel te bikem du qesane
Te keme êxsîre Şahê Îsfehanê”

“Hey Xano serê hîviyê
Kerem ke ser mezxuliyê
Te keme êxsîrê Şahê Ûrmiyê

Hey Xano serê dewletê
Kerem ke ser mesilhetê
Tancê Şahî l'sere te tê”

Xanê Mukrî d’bêt: “Ey Xelîfe
Tancê Şahî l’serê te bît
Mineta te l’babê te bît
Min minet ji vî navî nabît

Narûnim ser mehfûrane
Pal nadem belgêd perane
Nanê we li min giran e

Min sond xwarî bi enware
Çokêd xwe nadanim xware
Qehwa hewe bo min jahr e

Min zaniye li bircane
Te şîrek kirî debane
Pênsed mesqel qesap dane
Ka bîne kanê çawan e
Paşî dê keyn behsê şerane”

“Min Kela Mîran zaniye
Te şîrek kirî misriye
Com û celal û kanî ye”

Şîrek stûnka xîvetê vekirî
Xwe li kavlanî nagirî
De'wa wî xeza kafîrî

“Xano min şîrek kirî baş e
Biha pê dabûn heft aş e
Nik dilê min hêj belaş e

Min şîrek kirî debane
Sê sed kelbî devî dane
Biha heft gundêd felane
Heft aş mizgînî lê dane

Her bo serê we xanane
Min lê nedabû kavlane
Min durîbû li taqane
Min got bila hazir bît
Bo serê hewe xanane”

“Xwezî min dîtiba ka çawan e
Min girtiba van destane
Min dê zanîba qîmeta çekane
Da dile min da nebît kovane
Mirin her rêka mêran e”

Xelîfe xulaman d’xurîtin
Şîrî j’xîvetê b’kêşîtin
Destê Xanê Mukrî b’nîtin

Xelîfe dibêt xulamî
“Dilê mino hanûman e
Rabe şîrî bide deste xanane
Da dilî nebît kovane”

Xelîfe got xulamane
“Bo bîne şîrê debane
Bide destê van xanane
Axir her bo serê wan e”

Xulam dibêt: “ez we nakem
Şîrî destê Xani ra nakem
Vê belayê bo xwe çênakem”

Xelîfeyê kerr û kor e
Hêdî hêdî çûye jûre
Tînît misriyê dev more
Da destê Xanê simbêlsore

Xelîfe rabû beziye
Helkêşa şîrê misriye
Da destê Xanê Mukriye

Xelîfe rabû yê mest e
Ereq vexwar herdû deste
Şîr stûnê vekir îna da deste
Paşî jî leva xwe gezte

Xan ma li şîrî fukurî
Şîr sortir e ji agirî
Desk û kavlan zêr kirî
Xwe d'avêt destê Mukirî
Dixwazît qetla kafirî

Şîr nîne ba birûsi ye
Dest Xan Avdelê Mukriye
Dil da dibêt: "meferê te kî ye"

Xanê Mukrî d'bêt "Xelîfe
Şîrê te debanê sor e
Lê nîne cewher û more
Nabirît tîvilê gundore"

"Xelîfe şîrê te Hindî ye
Yê bê com û bê kanî ye
Nabirît benekî mûye
D'zanim qîmata wê çi ye"

"Xanê Mukrî tu nezanî
Qîmeta çekan d'key erzanî
Şîrî bikêşe ji kavlanî
Da bihayê çekan bizanî"

"Şîrê min yê misrî ye
Com û celal û kanî ye
Heft tonêd zêran kiriye
Cotek aş xwestna wî ye
Cotek gund bertîla wî ye
Cotek hêstir mizgînya wî ye
Ez yê we me heko min dîtî çolî ye"

"Şîrê te heke misrî bît
Com û celal û kanî bît
Heft tonêd zêran kirîbît
Cotek aş xwestna wî bît
Cotek gund bertîla wî bît
Cotek hêstir mizgînya wî bît
Tu we bî heko bo xwe çolê dîtî bî
Û dest Xan Ebdalê Mukrî bît
Meferê mam û birazan dê kî bît"

"Nê şîrê min yê 'eslî ye
Eslê xwe da Kermanî ye
Asinê wî birûsî ye
Ser şeqa wî polayî ye
Çil çerxe devî dayiye"

"Heke şîrê te 'eslî bît
Eslê xwe da Kermanî bît
Asinê wî birûsî bît
Ser şeqa wî polayî bît
Çil çerxe devî dayî bît
Û destê Xanê Mukrî bît
Meferê mam û birazan dê kî bît"

"Şîrê te bêjim Hindî ye
Hindiyê pîla derzî ye
Gehişt Xan Avdelê Mukriye
Hewara te êdî kî ye

Şîrê te bêjim Lahor e
Lahorekî pîla mor e
Gehişte lawê pispore"

"Xanê Mukrî tu we neke
Deste xwe ji şire min veke
Berevaniya sere xwe bike"

Xanê Mukrî got “we nakem
Destan çekêd te venakem
Ez kela mîran hatime
Dê xîvetê l’te wêran kem”
“Herê baziyo mi j’kevrî girtî
Heft sale hîsar ser girtî
Ma çêd’bîtin hêj tu xurtî”

Binêrin Xelîfe û xeberan
Simbêl wekî kurya keran
Kero keftî ji makeran
Dê te deme ber xenceran

Binêrin Xelîfe û van fêlan
Simbêl wekî kurya dêlan
Seo keftiye dû dêlan
Dê rabim te deme ber pênan

Xanê Mukrî d’bêt “Ey Xelîfe
Xelîfe tu bes bibêje
Serê min sewda û gêj e
Ez doma te nakem dîrêje

Hey pîreseo mirar e
Min li kele sondek xware
Bête sere te Zulfeqare”

Şîr hejand stûna xîvetê
Berî destê Xanî b'gehtê
Kafir kefte rezaletê

"Were rûnin ser mehfûrane
Were vexweyn du fîncanane
Dê b'kêşîn du qelûnane
Ew terzê me maqûlan e"

"Xelîfe sed car Xelîfe
Tu sed car bikey teklîfe
Pal nadeyn balgêd qedîfe"

"Xelîfe lez ke lezîne
Tu tilya şahdê helîne
Heke serê te firîne"

Mukrî şîr kêşa ji quwetê
Xelîfe got "tu bide min muhletê
Da b'gehme binê xîvetê
Bo bînim zêr û zînetê"

"Xelîfeo qet we nîne
Tu şehde îmanê bîne
Gehişte te şîrê şîne

Xelîfeo ne’let lêo

Tilyê bikêşe şehdêo

Heke şîr gehişt ruhêo”

“Tu bide sebr û muhletê

Da b’gehme binê xîvetê

Bo bînim zêr û zînetê”

Xanê Mukrî rawêstayî

Şîrê kose wê deynayî

Serê Xelîfe û mam û birazan

Digel stûnka xîvetê firdayî

Xanê Mukrî şîr kêşande

Hêdî hêdî daweşande

Serê Xelîfe û mam û birazan

Digel stûna xîvetê firande

Xanî şîr kêşa j’kavlane

Ya Allah quweta rehman e

Ne ji quweta milan e

Serê Xelîfe, mam û biraza digel stûna xîvetê

Bi hewekê wê firdane

___________________________

Ordiyan bû gazegaz e
Kuştin Xelîfe, mam û biraze
Wê bûne term û cinaze
Xanê Sor tu şerî b'xwaze

Ordiyan bûye girrêne
Misriyan bûye sîrêne
Wan lawan keft qirîpêne
Wan hespan bûye hîrêne
Her sed ji wan bi yekê ne

Cab gehişte Xanê Sore
Xanê Sor gehişte şerî
Nêrne serî nêrne perî
Wekî gurg tête nav merî

Xanê Sor d’bêt Xanê Mukrî
“Wêy Xano tu li min bela yî
Jî kurto ‘emir nemayî
Te nekir sebra dinyayî
Te ho zû zû kir xewxayî
Sê xîvet mabûn ya çarê
Da gehme xîveta Şahî”

“Mukriyo bo hinde gur î
Nav şeran da xwe nagirî
Sê xîvet mabûn ya çarê
Da gehme xîveta kafirî”

Xanê Mukrî dibêt Xanê Sor
“Xanê Kurdan tu yî xurtî
Wey baziyê ji refê gîrtî
Ma kar û golk im ez vegirtî
Min hind xwe kerbê da girtî”

“Herê Xano tu zêrîntir î
Tu xeberêd xwe nagirî
Ma nêryê babê te me
Eve heft sal e te tawil kirî

Herê Xano tu zêrîndest î
Tu xeberêd xwe nawestî
Ma golkê babê te me
Eve heft sal e te Dimdimî vebestî”

Vê da vê da vê da vê da
Xan siwar e bazê kimêda
Meşya dergehê xîvetê da

Xîveta Şahî kûrê da
Pênsed rim qesabî tê da
Xanê Sor sîngê xwe lêda
Şêrê Sor sîngê xwe lêda

Bû şer û vêkra vêkra
Serêd riman çûne têkra
Kurd û Ecem ber bûn yek ra

Ordiyan bû nirkenirke
Bû şerê Kurmanc û Tirke
Ser firîn ji evan kurke

Ordiyan bû golegole
Xweşmêran şîr dane şole
Bû şerê Kurd û Moxole

Ordiyan bû lemeleme
Meydanê bû toz û teme
Bû şerê Kurd û Eceme

Bû şer û herb û lêkdan e
Qiren e axir zeman e
Hewhewa batiniyan e
Ser firîn qalib cih mane

Şerê van herdû xanan e
Çirpeçirpa misriyan e
Goranan yeman yeman e

Şer çû kolkêd Xanemîr tê
Pênsed mêrêd dest bi şîr tê
Ber birînan xwîna tîr tê

Şer çû kolkêd Şêx Heyder tê
Pênsed lawêd dest xencer tê
Ber birînan xwîna terr tê

Şer çû kolkêd Şêx Ebdal tê
Pênsed lawêd dest rewal tê
Ber birînan xwîna tal tê

Şer çû kolkêd Xan Ebas tê
Pênsed lawêd dest elmas tê
Ber birînan xwîn qeyas tê

“Ebdal Begê babê rabe
Xudanê şîrê kulab e
Nê me kuştin bê hisabe”

Ebdal Begê babê mest e
Wî şîr û mertal helbeste
Şîr bi kavlan ve çû deste

Ebdal Begê got:

“Sed ne’let babê hosta yî

Şîrê min xirab seqa dayî

Nabirîtin şîv pîlayî

Xudan birî hesp hêlayî

Hay ne’let babê hosta ne

Şîr xirab mesqel dane

Nabirît zirî û xudane

D’hêlît bin zikê hespane

Ne ji quweta milan e

Ne ji şewketêd mîran e

Nabirît ev vêxudane”

Çavê Xanî, Ebdal Begê d’kevîtin

Heyfê vê şolê d’bînîtin

Dilê wî pê ve d’mînîtin

“Kurê mino tu nezan î

Şîrê te hêştê kavlanî

Hişyaryekê bide giyanî

Dê birît zîn û hesp û xudanî”

Şîr ji kavlanî kêşande

Hêdî hêdî daweşande

Xudan birî hesp dirande

“Rehmet babê hoşta yî
Şîrê min baş seqa dayî
Xudan birî hesp nemayî”

Dê bab gorî Ebdal Begê
Qet nizanît heke w mekê
Sed seran d’birît hewekê

Şer kefte erdê coxînê
Manek hatin gerweşînê
Dinya bûye behra xwînê

Şer kefte erdê bênderê
Manek hatin gerwezerê
Xwîn diçît wekî lêserê

Şer kefte ber zeviyan
Bû ringeringa misriyan
Kes nabihît çi gaziyan

Şer kefte ber bênderan
Bû ringeringa teberan
Kes nabihît çi xeberan
Xwîn dibetin term û seran

“Hey şivane hey şivane
Ez bim qurbana destane
Nizanim carek dî ez nebim xane
Dê te Ûrmiyê keme sultane
Deme te dewr û meaşane”

Enferim Melayê Torê
Gamêş e yê keftî kûrê
Kes newêrît biçît dorê

Çê d’bîtin kure Melayî
Dest da bivirê pîlayî
Çav dabû xîveta Şayî
Pê wî l'kenefê alyayî
Eceman ser kir tebayî

Hewhewa kure Gewhere
Ji bin terman hate dere
Hejdeh dirandin bi xencere

Hewhewa lawê Şerefe
Destî xencera sedefe
Nav şeran da gur û gefe

Hewhewa lawê Harisî
Mezin bûy nanê garisî
Xîvet ber xîvet reqisî

Kanîn û Qere bira ne
Wan cotek teber lêkdane
Gurî jê d'çît esmanane
Serhingêd Xanê Kurdan e

Qere û Kanîn bira ne
Herdu ber êk rawesta ne
Kes kesê nabet çi çarane

Qere dibêjît Kanîne
“Hey ya Kafirê melûne
Ji min bînî çipka xwîne
Dê kî ve revî ber birayê min Kanîne”

“Qerewo tu yê qereyî
Şîrhingêvo j’mêran zêdeyî
Emanet koçka dergeyî

Qerewo tu qerawil î
Şîrhingêvo tu rewal î
Te emanet koçka yalî”
Şer çû birca bin çiyayî
Birek Ecem lê cemyayî
Xetîre ji bin kêşayî

Şer çû bin birca kevirî
Birek Ecem lê ewirî
Xetîre wê ji bin birî

Çê d'bîtin lawê Hekarî
Hey mêro j'mêran bijarî
Xilas kir ordya serdarî

Çê d'bîtin lawê Mehende
Benda şîrî avêt zende
Nava şerî kir govende

Çê d'bîtin lawê Zêbarî
Destî şîrê cewher tarî
Xilas kir ordya nizarî

Çê d'bîtin lawê Muzurî
Dest avête qevda şîrî
Xilas kir ordya wezîrî

Çê d'bîtin lawê Silehî
Heçî koma nav dikevî
Ket û cot jiber direvî
Çê d'bîtin lawê Bêdkarî
Helal bît nanê te xwarî
Roja geş lê kire tarî

Xan dibêjîte kurê xwe
“Ez dê deme te perê xwe
Meydanê bike şerê xwe
Namîsê bike bo babê xwe”

“Babê te me babê te me
Pîreboxekî kone me
Têra du sê gêre dî heme”

Hewhewa Ebdal Begê
Ew nizanît heke û mekê
Sed seran d’birît gavekê

Serim gorî Ebdal Begê
Malim gorî nûzavawo
Nav şirîno yê tu dawo
Sê caran xwe l'komê dawo
Sed ser bo babê İnawo

Hay êvar e roj zirav e
Eceman hewek xwee dave
Tîrek li Ebdal Beg dave
Mişewiş bû qet nemave
Wê l'Xanî kuşt û nûzava
Wê sotin cerg û hinava

Cotekê tîran lêdayî
Bejna zirav têk hejyayî
Korahî bi babê mayî

Xan ser mile xwe zivirî
Çav ma Ebdal Begê kurî
Rondik ji çavan da firî

Qender halê bênderê
Xwîn tavêt wekî lêserê
Ebdal Begê babê ma l'seferê

Nêrin Xanî nêr cegerê
Çend radwestît vê seferê
Kafir xelan hatne derê

Qere û Kanîn bira ne
Herdûkan teber lêkdane
Deng çû esmanê heftane
Bab li dengê wan heyran e

"Babê te ye babê te ye
Pîreboxekî kone ye
Têra heweke dî heye"
Nêrin Xanî nêr cegerê
Şîr avêt dest da xencerê
Kafir j'xelan kirne derê

Xanê Mukrî d’bêt “Hey Xane
Bes bikuje xir û xîzane
Tu ber min veke kolane
Gehme cindî û êkanane
Da vekem heyfêd zavane
Hêdî hêdî kur kovan e”

Herdû Xanêd Sor bûne cot
Herdû şêrêd Sor bûne cot
Xan şêr e, Mukrî melkemot
Ji Eceman d’kujin ket û cot
Ebdal Begê cergê me sot

Şerek kir koçka beroje
Şebeqa şîran kir roje
Xan wê d’ken şerê dilsoje

Şerek kir koçka nizarî
Şebeqa şîran kir tarî
Xan wê d’ken şerê kufarî

Şer dakeft herdû nihalan
Bû teqeteqa mertalan
Xwîn diçît com û celalan

Şer dakefte herdû tiyan
Bû teqeteqa misriyan
Xwîn diçît wekî kaniyan

Şer dakefte herdû giran
Bû teqeteqa biviran
Xwîn diçît wekî lêseran

Şer çû kolkêd van feqiyan
Feqiyan dest da misriyan
Dê dayne canê şi’iyan

Şer çû kolkêd van melane
Melan şaş wê erdî dane
Serê me oxira xanan e

Qere ye, Qere w Kanîn in
Yêd hewalan lêk d’şidînin
Ketkete kafran d’birînin

Nihala zemînê kûr e
Herdû Xanan lûrelûr e
Herdû şêran lûrelûr e
Gurg in keftin kar û kwîre

Nihala zemînê teng e
Herdû Xanan dengedeng e
Herdû şêran veda denge
Gurg in keftin pezê şenge
Wan qiran îna Firenge

Nihala zemînê pan e
Herdû Xanan deng vedane
Herdû şêran deng vedane
Gurg in keftin nav berxane

Nihala zemînê kerx e
Herdû Xanan lêda çerxe
Herdû şêran lêda çerxe
Gurg in keftin kerî w berxe

Nihala zemînê herî
Herdû Xan lê diken şerî
Wekî gurg tête nav merî

Şêrêd xanan dû êk rêz in
Mil bi mil xwe ved'qelêzin
Xîvet xîvet ved'guhêzin

Şêrêd Xanan jor da têne
Mil bi mil xwe d'helavêne
Xîvetan ser êk dad'dene

Xîveta Şahî mezin e
Sed rim qesabî di bine
Herdû xanan kêşa bine

Binêrin koma xanane
Dengê selawatan esmance
Şerê xazî batinyan e
Ser d'firin qalib cih mane

Ev 'Ecem ecêbê d'girin
Çi nabînin serêd firin
Batinî dê me birînin

Şahî da binê evrazî
Xanê Sor lê kire gazî
"Nereve têşkê berazî"

Xanê Sor wê rawêstayî
Misriyê zêrîn dahêlayî
Birînan d'dete ber bayî
Goştê çûy hestî wê mayî

Xanê Sor wê rawesta ve
Misriyê zêrîn dahêla ve
Goştê çûy û hestî ma ve

Şah herdû piyan reviye

Hozanê wê serkeftiye

Birek topçî lê derkeftiye

“Hun lez biken bilezînin

Barîtê deştê reşînin

Agirî pê da barînin

Batinî dê nifşê me qelînin

Hemberêd wan nav me nînin”

Wan lez kir û lezande

Barît li deştê reşande

Agir wê pê da barande

Batinyan xwe nav helande

Terr û hişk têkda qelande

---

“Hey Dimdimo we be we be

Ber ser berî kerker bibe

Piştî Xanan bo kes nebe

Hey Dimdimo berê zer bî

Heft salan hîsar li ser bî

Piştî Xanan xwelyê werbî

Hey Dimdimo ker be ker be

Bi toz û xebarê werbe

Piştî Xanan bo kes nebe”

Ji wî sahibê qudretê
Wan bircan qirênek keftê
Deng çûye esmanê heftê

“Hey Dimdimo kavl û wêran
Meskenê piling û şêran
Rovî lê d’ken geşt û gêran
Rehmet day û babêd guhdêran”

# 5. ENCAM

Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn yek ji girîntirîn destana netewî ya Kurdî ye. Jêdera mijara vê destanê bûyereke dîrokî ye ku serûberê rewşa Kurdan ya siyasî di nava xwe da kom kiriye. Vê destanê karîgeriyeke gelek mezin li ser civaka Kurd hiştiye. Jiber vê egerê hêj piştî bûyerê wekî destan hatiye honandin û di nava civakê da belav bûye. Ji aliyê civakê ve ev destan gelek hatiye hezkirin. Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk da jî ji aliyê çend edîbên mezin ve serejinû wekî berhemeke menzûm hatiye nivîsîn. Herwesa ji aliyê lêkolîner û pisporên biyanî û xuyanî ve gelek xebat li ser hatine kirin.

Ev destan mijara xwe ji bûyereke dîrokî standiye. Ev bûyer di salên 1608 û 1609ê qewimiye. Devera ev bûyer lê qewimî Kela Dimdim e ku dikeve başûrê rojavayê bajarê Ûrmiyê. Mijara vê destanê şerê di navbera Kurdên Biradostî û Dewleta Sefewiyan e. Sefewiyan di bin rêveberiya Şah Ebbas da xwestiye desthelatdariya Mîrgeha Biradostiyan ji nav biben. Hemberî vê çendê Kurdên Biradostî di rêberiya Emîrxan Biradostî an jî Xanê Lepzêrîn da li hemberî Sefewiyan berxwedaneke mezin kirine. Lêbelê di encama şer û dorpêçeke giran û domdireêj Kela Dimdim keftiye destê Sefewiyan. Kurdên Biradostî bi mêrxasî û qehremanî şer kirine heta ku hemî yek bi yek hatine kuştin.

Li ser vê bûyera dîrokî ya gelek karîger û dilsoj civaka Kurd gelek li ber xwe keftiye. Vê bûyerê te’sîreke mezin li ser Kurdan kiriye. Lewra ev bûyer wekî destanekê li ser devê dengbêj û beytbêjan serejinû hatiye vegotin. Ev vegotina devkî ji aliyê Kurdan ve gelek hatiye bergermkirin û qebûlkirin. Lewra li hemî aliyên Kurdnişîn ev destane hatiye vegotin. Di vê vegotina destankî da ev bûyera dîrokî bi hizr û bîr û xeyalên beytbêj û dengbêjan ve hatiye xemilandin, rengînkirin û dewlemendkirin. Bi awayekî rêkûpêk rista bûyeran li dû hev hatiye girêdan û bi

şêweyekî rewanbêj û herikbar hatiye diristkirin. Lewra guhdariya vê destanê tameke xweş daye guhdaran.

Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn ji aliyê temayan ve gelek dewlemend e. Jiber ku destan behsê mêrxasî û qehremaniyê dike temayên netewî serdest in. Di destanê da mirov rastî xîret û hemaseteke mezin têt. Herwesa temayên Kurdînî û welatparêzî, dilsozî û xiyanet, jin, dîn û bawerî û ray û tedbîrê gelek bi hostayî hatine honandin. Destan xîtabî hestên netewî dike û kel û coşekê dide guhdaran.

Metnê destanê yê li vê xebatê da li ser hatiye rawestan di devera Hekariyan ji devê deh dengbêj û beytbêjên cûda hatiye tomarkirin. Jiber ku ev waryant hemî yên deverekê ne û ferq û cudahiyên wan gelek kêm bûn; ev waryante wekî yek destan hatiye nirxandin. Ev destan nêzîkî heftsed bendên piraniya wan sêrêzî pêk têt.

Em vê xebatê da li ser çend xalên destanê rawestiyane. Lêbelê ev destane ji gelek aliyan ve pêdiviyê lêkolînên cûda cûda ye.

# JÊDER

BAZÎDÎ, Mela Mahmudê, *Camî'eya Rîsaleyan û Hîkayetan bi Zimanê Kurmancî,* (Brh. :  Ziya Avcı), Weş. Lis, Stenbol, 2010.

BIDLÎSÎ, Şerefxan, *Şerefname Dîroka Kurdistanê*, (Wer: Ziya Avci), Weşanên Avesta, Stenbol, 2007.

ÇALIŞTIRAN, Rûken, "Lîteratûrek Li Ser Destanên Kurdî", *Edebiyata Kurdî Ya Gelêrî, Dîrok- Teorî- Rêbaz- Lîteratur- Berawirdî- 1,* Weş. Avesta, Stenbol 2015.

ÎSKENDER BEY Türkmen, *Târih-i Alem Arayi Abbasi,* I, Brh. İrec Afşar, Müessese-i İntişârât-ı Emîr Kebîr, Tahran, 1387.

PERTEV, Ramazan, "Danasîn û Rewşa Giştî ya Xebatên li ser Folklor û Edebiyata Kurdî ya Gelêrî", *Edebiyata Kurdî ya Gelerî, Dîrok- Teori- Rêbaz- Lîteratur- Berawirdî- 1,* Weş. Avesta, Stenbol 2015.

SADÎNÎ, M. Xalid, *Feqiyê Teyran, Jiyan, Berhem û Helbestên Wî,* Weş. Nûbihar, Stenbol 2010.

SERWER, Ebdurehman Omer, *Karesatî Qelay Dimdim (1608- 1609),* Enstîtûya Kelepûrê Kurdî, Silêmanî 2008.

YETİŞ, Kazım, "Destan", *Tûrkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi,* C. IX, Weş. DİB, İstanbul 1994.

ZÎLAN, Reşo, "Lêkolînek Li Ser Destana Kela Dimdimê", *Edebiyata Kurdî Ya Gelêrî, Dîrok- Teorî- Rêbaz- Lîteratur- Berawirdî- 1,* Weş. Avesta, Stenbol 2015.

# ÖZET

Dımdım Kalesi ve Altın Kollu Han Destanı

Dımdım Kalesi Destanı, Kürt Edebiyatının en önemli destanlarından birisidir. Konusunu tarihi bir olaydan almıştır. Bu tarihi olay Bıradostî Kürtleri ile Safevî Devleti arasında 1608 ve 1609 yılları arasında gerçekleşmiştir. Şah Abbas önderliğindeki Safevi Devleti, Bıradosti Kürtlerinin yönetimini ortadan kaldırmak istemiş, buna karşın Bıradosti Kürtleri Altın Kollu han öncülüğünde buna karşı çıkmış ve Dımdım Kalesi'nde büyük bir direniş sergilemişlerdir. Çetin ve uzun süreli bir savaştan sonra kale Safeviler tarafından alınmıştır. Kaledeki Kürtler sonuna kadar kahramanca savaşmışlardır. Hepsi tek tek öldürülünceye kadar teslim olmamış ve büyük bir kahramanlık ve yiğitlik göstermişlerdir.

Bu acı olay Kürt toplumunu derinden etkilemiştir. Bundan dolayı halk ozanları tarafından bu tarihi olay üzerine onur, hamaset ve yiğitlik dolu ulusal bir destan yaratılmıştır. Bu destan edebi olarak akıcı bir uslup ile örüldüğü için halk tarafından oldukça beğenilmiş ve kabul görmüştür. Destan, dinleyicilerde güzel bir tat bırakmış ve onların ulusal duygularını canlandırmıştır.

Bu destan Hakkâri bölgesinde on ayrı halk ozanından derlenmiştir. Bu on ayrı halk oazanına ait varyantlar birbirlerine çok yakın olduğu için tek bir destan olarak düzenlenmiştir. Hazırlamış olduğumuz bu destan, çoğunluğu üç dizeden meydana gelen yedi yüz civarında kıtadan oluşmaktadır. Her kıtada kafiye olup her dize sekiz heceden oluşmaktadır. Fakat bazı yerlerde dizelere ait hece sayısında azalma veya artma görülmektedir.

# PÛXTE

Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn

Destana Kela Dimdim yek ji girîntirîn destana Edebiyata Kurdî ye. Mijara xwe ji bûyereke dîrokî standiye. Ev bûyer di navbera Kurdên Biradostî û Dewleta Sefewiyan da di salên 1608 û 1609ê da qewimiye. Dewleta Sefewî di rêveberiya Şah Ebbas da xwestiye rêveberiya Kurdên Biradostî ji nav bibe. Kurdên Biradostî di bin rêveberiya Xanê Lepzêrîn li hemberî vê çendê derkeftine û li Kela Dimdim da berxwedanek mezin kirine. Piştî şerekî dijwar û domdirêj kele ji aliyê Sefewiyan ve hatiye standin. Kurdên kelê heta dawiyê bi mêranî şer kirine. Di dawiyê da heta ku hemî hatine kuştin teslîm nebûne û mêrxasî û qehremaniyeke mezin nîşan dane.

Ev bûyera dilsoj gelek kartêkirinin di civaka Kurdî da kiriye. Lewra dengbêj û beytbêjan li ser vê bûyera dîrokî destaneke netewî ya ji xîret, hemaset û mêrxasiyê ve tijî çêkirine. Jiber ku ev destan wekî edebî bi şêweyeke rewanbêj û herikbar hatiye honandin ji aliyê gel ve hatiye bergermkirin û qebûlkirin. Guhdariya destanê tameke xweş daye guhdaran û hîs û hestên wan yên netewî bilind kiriye.

Ev destan li devera Hekariyan ji devê deh dengbêj û beytbêjên cûda hatiye tomarkirin. Jiber kû waryantên van beytbêjan gelek dişibîn hevdu wekî yek waryant hate diriskirin. Ev destana me amadekirî nêzîkî heftsed bendên piraniya wan sêrêzî pêk hatiye. Di her bendekê da serwa (qafiye) heye û her ristek ji heşt kîteyan pêk hatiye. Lêbelê hejmara kîteyên ristan hinek erdan an kurt an jî dirêjtir lê hatine.

# ABSTRACT


Dimdim Castle and the Golden Armed Han Epic

Dimdim Castle Epic is one of the most important epics of Kurdish literature. The subject of the epic comes from a historical event. This historic event took place between Bıradostî Kurds and the Safavid Empire between 1608 and 1609. Safavid Empire, led by Shah Abbas, wanted to eliminate the governance of Bıradostî Kurds, but however, Bıradostî Kurds under the leadership of Golden Armed Han opposed to it and demonstrated a great resistance in Dimdim Castle. The castle was taken by Safavids after a harsh and long war. Kurds in the castle fought heroically to the end. They did not surrender until all were sacrificed one after another and showed great heroism and bravery.

This painful event affected the Kurdish society deeply. Therefore, a national epic full of honor, heroism and bravery was created on this historic event. As this epic has been intertwined with a literarily flowing style, it was praised and accepted highly by the public. Epic has left a good taste in the listeners and stimulated their national feelings.

This epic has been collected from ten different minstrels in Hakkari region. As the variants from this ten different minstrels were very close, the epic has been organized as a single epic. This epic consists of about seven hundred stanzas, the majority of which consisting of three lines. There is rhyme in every stanza and each line consists of eight syllables. However, the number of syllables increase or decrease in some of the stanzas.

T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

# DIMDIM KALESİ VE ALTIN KOLLU HAN DESTANI
# (EDEBİ VE TARİHİ BİR İNCELEME)

YÜKSEK LİSANS TEZİ

**Danışman**
Yrd. Doç. Dr. Mehmet Metin BARLIK

Yaşar KAPLAN

VAN - 2015